

NÛDEM

No 9 1994



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

XELATA NÛDEM YA ÇÎROKAN

Çîrokên ku beşdarî xelata NÛDEM'ê bibin, divê berê li tu cihan nehatîbin weşandin, bi kurmanciya alfaba latînî bin, bi celebekî ku xweş bêne xwendin (daktîlo, computur, an jî bi destnivîseke zelal) hatîbin nivîsandin.

Ji bo beşdarên li derveyî welêt û yên li Ewrûpayê şeş kopyayên çîrokê, ji bo yên li welêt jî, ger îmkân tune be, kopyayeke çîrokê têr dike. Her beşdar ger mumkun be resimekî xwe û bi kurtî jiyana xwe, di zerfeke piçûk de, di hundurê zerfa xwe ya mezin de bişîne.

Xelata yekemîn 4 000 000 Lîrayên Tirkiyeyê.

Xelata duwemîn 2 000 000 L.T.

Xelata sêyemîn jî salek abonetiya NÛDEM'ê û şeş pirtûkên Weşanên NÛDEM e.

Çîrokên ku xelatê bigirin, ew ê an di eynî hejmara NÛDEM'ê de, an jî di hejmarên cihê cihê de bêne weşandin. Yên ku xelatê negirin, lê hêjayî çapê bin, wê bi hîlbijartina jûriyê û bi hersê xelatgiran re mîna pirtûkekê bêne çapkirin.

Xelata NÛDEM ya çîrokan ji salê carekê, di demsala payizê de tê belavkirin.

Ji bo demsala 1994'an, divê çîrok derengtirîn heta dawiya tîrmeha 1994'an bigihîjine me.

Ji bo agahdariyê hûn dikarin ji NÛDEM'ê re binivîsînin.

Navnîşan:

Termov. 52

175 77 Järfälla/SWEDEN Tel û Fax: 8-583 564 68

NÛDEM

N. 9/1994



© 1994 Tûnê R. P. L. N. - G. P.

Xwedî û Bepirsîyarê Giştî:
Chief Editor
Firat CEWERÎ

Hejmar: 9
Bihar: 1994

Şertên abonetiye (salek)
Swêd: 190 Skr.
Welatên din 39 \$
Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: Ali Kareem Amin
Pergala rûpelan: Nûdem

Hevkarên Nûdemê (Swêd):
Mehmed Uzun, Rohat, Zeynelabidîn Zinar, Xelîl Duhokî, Mehîfûz Mayî, Dila-
wer Mêqerî. (Almanyay):
Husên Düzen. (Norvec):
Sebrî Botanî. (Austurya):
Havîz Qazî.(Australia):
Şahîne B. Soreklî.(Holan-
da): Bedirxan Epözdemir.
(Türkiye): Cemşîd Bender.

Navnîşan

Termo. 52

175 77

Järfälla/ SWEDEN

Tel û Fax:

08-583 564 68

NAVEROK

CUMHÛRIYETA KURDÎ YA MEHABADÊ / F.CEWERÎ,3
DEWLETA CUMHÛRÎ YA KURDISTAN /

Hesenê Qazî, 7

CUMHÛRIYETA KURDISTANÊ/ Kerîm HUSAMÎ, 9

CUMHÛRIYETA KURDISTANÊ / M.Mola Ezat, 11

JI BO YILMAZ GÜNEY / Rojen BARNAS, 13

KELA DIMDIMÊ / Havîz QAZÎ, 15

DU HELBEST JI / Xelîl BATTÎ, 27

DU HELBEST JI / ŞÎRÎN BOZARSLAN, 28

KEÇA KURD ZENGÊ / Cemşîd BENDER, 29

SÊ HELBEST JI / Orhan VELÎ, 34

RESAMÊN KURD / Xelîl DUHOKÎ, 36

HILKIŞÎNA BAJAREKÎ / Dîlawer MÊQERÎ, 39

XALID AXAYÊ ZÊBARÎ / Zeynelabidîn ZINAR, 40

ÇIRÛSKIN / Dêrsim-MEMO, 45

KEÇIKA PIÇÛK / M. Alî K., 48

DU ŞEHÎD, DU JIYAN / Nûrî ALDÛR, 51

EVÎNDARA JI HELEPÇEYÊ HATÎ / Suzan SAMANCI,53

JI BO YEZDAN / Medenî FERHO, 57

JANA GEL / Sebrî BOTANÎ, 62

EM XERÎB IN / C. Alî BEDIR-XAN, 67

HELBESTÊN AMERÎKA LATÎNÎ / B. EPÖZDEMÎR, 68

MUHACIRTÎ Û REWŞA KEÇAN / Ş. B. SOREKLÎ, 70

DÎWAR / SARTRE, 77

EVÎN / MAYAKOVSKÎ, 92

SÊ HELBEST JI / J. ESPAR, 94

LI SER SÊ PIRTÛKÊN BEŞÎKÇÎ / Gabar ÇIYAN, 98

KOVARÊN KURDÎ / Lokman POLAT, 100

AGORA / Mustafa AYDOĞAN, 106



Tabloyeke resamê Kurd **Remzî**

48 SALIYA CUMHÛRIYETA KURDÎ YA MEHABADÊ

Firat CEWERÎ



Cihêkî bajarê Mehabadê yê taybetî di dilê me de heye. Ew di nava kurdên her çar perçeyên welêt de tê naskirin û hezkirin û ji bo ku ew di nava nivşê nûhatî û nûgihîştî de neyê jibîrkirin, navê wê li zarokan tê kirin.

Berî ku ewrekî reş yê şînê bi ser vî bajarî de bigire, di 22'ê çileyê paşîn 1948'an de, Xwedê li vî bajarî tê rehmê, ji pişt çîyan rojê bêhawe xweş bilind dibe, bi germî û tîrêjên xwe zivistana sar û dijwar bi dûr dixe, di şûna wê de bihareke geş tîne. Gava xelkê Mehabadê, ji bo xwe-amadekirina pîrozkirina wê roja dîrokî sibehê zû radibin ser xwe û çav li wê roja xweş dikevin, dilê wan geş dibe, kêf û

şahiya wan difûre û ji bo wê roja xweş ya pîroz ji Xwedayê xwe duan dikin. Her ku roj bilind dibe Mehabadî dikevin tevgerê, keçên Mehabadiyan, yên ku bi spehîbûna xwe navdar in, cil û bergên bi reng, bi ser bejnên xwe yên zirav û bilind de berdidin, çavên xwe kil dikin, mîna ku ew ê herin dîlanekê û li wê dîlanê pêrgî hezkiriyên di xeyalên xwe de werin, xwe li ba dikin û bi geşî dadikevin meydana Çarçirayê. Pîr û jin jî cil û bergên xwe yên kevin davêjin, derd û kul û êş û elemên malbat û eşîrê ji bîr dikin, xwe mîna bûkên nûzewicî dixe-milînin û bi zar û zêçên xwe ve, di kuçeyên Mehabadê yên zivironekî de tevî pêla keçên



Serokcumhûr Qazî Mehemed

ciwan dibin û xwe berdidin Meydana Çarçirayê. Xort û peyayên Mehabadî yên bejinbilind, şal û şapikên xwe bi ser bejnên xwe de berdidin; piştên kesk, sor û zer li piştên xwe girêdidin, bi coş û heycan xwe di kuçe û kolanan re berdidin Meydana Çarçirayê. Wê rojê, li Mehabadê tu kes di hunduran de namînin. Meydana Çarçirayê dibe mîna deryayeke bi reng, tevgera mirovan mîna pêlên deryayê dibin. Wê roja xweş, ya ku biharê ji zivistanê dizîbû, bajarê Mehabadê dike mîna seyrangehekê. Li wê meydana ku gelê

kurd hem xweşî hem jî dilêşiyê jiyaye, mirov ax biavêta li erdê nediket. Ew qerebalixa geş, bi kincên bi reng, bi rûyên bi ken û bi heyecan li benda peyayekî bûn. Peyayek dê bihata, ji wan re bipeyiviya, mizgîna azadiya wan bigihanda wan. Wî ê ji wan re behsa girîngiya wê roja pîroz bikira. Û ew peyayê ku ew li bende bûn, di nava çend peyayên din de, bi bejna xwe ya bilind û bi cubeyê xwe yê fireh bi jor dikeve, diçe ber maseyeke dirêj û li pişt masê li ser lingan radiweste. Ew peya Qazî Mehemed bû. Qazî Mehemed demekê bi dilekî geş çavên xwe li ser wê qerebalixa mirovan digêrîne, hîsên wî yên neteweyî bilind dibin, kêf û heycana wî difûre û bi dengêkî nizim û giran dest bi peyva xwe dike: "*Gelê kurd, gelekî serbixwe ye, divê li ser axa xwe, bi azadî bijî, qedera xwe bi xwe tayin bike, loma îro ez di huzûra we de Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê îlan dikim*".

Pêla mirovan diheje, keç û jin dilîfînin, mêr tivingan ber bi hewa ve berdidin, coş û geşiyek dikeve nava wan mirovan; bang dikin, diqîrin, destmalên bi reng li ba dikin...

Di îlankirina Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê de piraniya axa û serokeşîrên kurdan, mîna; *Mahabad, Mameş, Mingûr, Kevork, Zerza, Herkî, Beyzade, Barzan* û hwd...

Qazî Mehemed zêde napeyive. Ew di wê kurtepeyva xwe de ji bilî îlankirina Cumhûriyetê, ji wan re behsa yekîtî,

hevkarî û miletbûna kurdan dike. Hêviya wan ya çilmisî geş dike. Paşê dadikeve jêr, cubeyê xwe yê fireh ji xwe dike, bi tena unîformayekî Sovyetî û şaşika xwe ya spî dimîne.

Lê xelkê Mehabadê wê roja han mîna karnevalekê pîroz dikin, dehol û zurnevanên bajêr lêdixin, Mehabadî bi destên hev digirin û bi awayekî jixweçûyin dîlanan digirin.

Hema piştî îlankirina Cûmhûriyetê, di bin serokatiya Qazî Mehemed de serokeşîr û pêşevanên kurd li hev dicivin û hukûmetekê ava dikin. Qazî Mehemed dibe serokcumhûrê vê hukûmetê û wezîrî û serokwezîrtî jî di navbera pêşevanên kurd yê din de tê parvekirin.

Cumhûriyeta Mehabadê di dîroka Kurdistanê ya nêzîk de yek ji bûyerên herî girîng e. Civateke feodalî, ku hê nenasê kapîtalîzm û îndustriyê bû, ji jiyana întelektuelî dûr bû, hêdî hêdî ber bi bajarvaniyê ve gavan davêje, Cumhûriyeteke nûdem ava dike, ji bo liserlinganmayîna Cumhûriyetê ordiyek tê avakirin, lê belê li gorî ordiyên welatên dorhêlê ordiyeke qels û bi sîlehî sivik... Serok û birêvebîrên Cumhûriyetê bi enerjî û bawerîyeke xurt ji bo Cumhûriyeta xwe dixebitin, dixwazin ji civaka eşîrtî bi dîr bikevin, elemanên xwe hînî ajotina otomobîlan, hînî şer û xweparastinên modern dikin; ji bo pêşdexistina civaka xwe, ji bo xwendina dibistanên bilind xortên kurd dişînin Sovyetê. Herweha bi

çapxaneyê ku Sovyetî dide wan, pê rojnameya xwe ya rojane *Kurdistan*, kovarên mîna *Hawar*, *Agir*, *Hilale* û hwd. derdixin, dibistanên kurdî vedikin û pirtûkên dersan yê bi kurdî çap dikin. Bi weşandina kovar û rojnameyên bi kurdî bal û meyleke baş ji ziman û edebiyata kurdî re çêdibe, cih bi cih navên hin şair û nivîskaran tê bihîstin. Yek ji şairên wê demê Hejar e. Hingî mamosta Hejar ji bo marşa Cumhûriyetê bi zaravayê soranî helbestekê dinivîsîne û ew helbest bi alet û awazên nûjen tê gotin. Çarîna dawî ji helbestê wilo ye:

Neftim awê zîyan e

Le Serd û Kermanşane

Baba Gurgur dizane

Le Mûsil da hemane

Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê ji bo hemû kurdan dibe hêviyek, loma Barzanî digel hêzeke xurt ya çekdar berê xwe dide Mehabadê, li wir û der û dora wir bi cih dibe, dixwaze ji avakirina Cuhûriyetê re bibe piştgir û alîkar.

Digel ku temenê Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê gelekî kurt bû jî, dîsan em dibînin ku kurdên me yê ku qet tradisyonê neke wan ya dewletbûn an dîplomasiyê tune bû, dîsan zû adapte dibin, di wê kurtedemê de gelek danûstandinên dîplomafîk datînin. Lê mixabin, danûstandinên wan yê dîplomafîk jî tenê di hundurê sînorên Îranê de dimînin. Ji xwe ger danûstandinek wan bi cîhana derve re hebûya û cîhana

derve, an ji yekîtiya neteweyan Cumhûriyeta wan bipejirandina, ew dê ji bo hilweşandina Cumhûriyetê nebûna alîkar.

Kurdên Îranê saleke bi hêvî buhurandin û ji bo ku ew jî êdî sermiyanê xwe bûn, wan xwe gelekî serbilind û bi rûmet hîs dikirin. Lê belê hêdî hêdî hêviya wan diqurmîçî, kêf û şahiya wan di qirika wan de dima, her ku diçû cih li wan teng dibû. Li gorî peymana Îngilîz û Sovyetîyan û li gorî biryara yekîtiya neteweyan, diviyabû Sovyet di demeke kurt de ji Îranê derket. Ji Îranê derketina Sovyetê dibe dawîhatina Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê. Piştî bîpaşdeveşandina Sovyetê ya ji Îranê bi demeke kurt, Cumhûriyeta Azerbeycanê hildiweşe û paşê jî Faris berê xwe didine Kurdistanê.

Qazî Mehemed, birayê wî Sadrî Qazî û pismamê wî Seyfî Qazî, 31'ê adara 1946'an, saet sisê sibehê ji mal têne derxistin û berê wan didine Meydana Çarçirayê. Bajar kerr e, xelkê bajêr di xew de ne, Qazî Mehemed, bira û pismamê xwe li Meydana Çarçirayê, di bêdengî û kerrîtiya şevê de, bi sêpiyên cihê cihê ve têne daliqandin. Laşên wan yên pak, ji hemû xerabî û kirêtiyan dûr, di hênkahiya sibeha adarê de li ba dibin. Çîroka Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê bi trajedî dawî tê.

Vêca em ji xwe dipirsin; gelo îmkanên jiyandina Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê hebû an na? Cumhûriyet ji bo çi ava

bû û ji bo çi wilo dawî hat? Ger Cumhûriyet temendirêj bûya, dê tesîra wê li ser perçeyên Kurdistanê yên din çi bûya? Bi kurtî Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê digel hêlên xwe yên erînî û neyînî hêjayî lêkolînên dirêj e. Ez hêvîdar im wê lêkolînerên kurd dest bavêjin pênûsên xwe û li ser vê bûyera mezin ya di dîroka me de, serê xwe biêşînin, dîroka xwe bi xwe binivîsin.

Bi hinceta bîranîna 48 saliya Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê, me ev herdu pirsên jêr ji ronakbîrên kurd Mîrza Hesên Qazî, Kerîm Husamû Mahmod Mala Ezat kirin. Bi hêviya ku wê bersivên wan resimekî Cumhûriyetê yê rastîn raxe ber çavan...

1 - Tu dikarî bi kurtî behsa avakirin û sedemên hilweşandina Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê bikî?

2 - Di dema Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê de tevgera kulturî û edebî çawan bû?

Çavkaniya vê kurtegotarê pirtûka William Aegle-ton ya bi navê Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê ye. Aegle-ton ev berhema xwe di sala 1962'an de nivîsandîye. Di sala 1972'an de pirtûk ji aliyê Cercîs Fethullah ve werdigerê erebî û di 75'an de jî Mehmed Emîn Bozarslan wê werdigerîne tirkî.

DEWLETA CUMHÛRÎ YA KURDISTAN



Hesênê QAZÎ

1 - Berî ku ez bersivên pirsyarên we bidim, ez dixwazim spasî we bikim, ku hûn bi munasebeta 48 saliya vê bûyera mezin ya di dîroka me de, di kovara xwe de bîranîna wê dîkin.

Yekem tiştê ez bibêjim ev e, ku navlêkirina " Dewleta Cumhûrî ya Kurdistan" bi "Cumhûriyeta Mehabad" ne rast e, çunkû avabûn û tesîra vê Cumhûriyetê tenê li bajarê Mehabadê û dor û berê wê nebûye, belkû beşeke berbiçav li rohelata Kurdistanê, di jêr nifûsa vê Cumhûriyetê de bûye.

Rast e, Cumhûriyet di 22'ê çileyê paşin 1946'an de hat îlankirin, lê di rastî de, piştî hilweşandina hukmê Reza Şah Pehlewî, di tebaxa 1942'an de û belavkirina artêşa Şahenşahî li pîrr cihên rohelata Kurdistanê û demokratîzebûna prosesa siyasî, gelê me bi lez karîn girte destê xwe û ji birêvebirina kar û barên xwe bi destên xwe difikirî û lê xwedî derket.

Ew xebatên ku bi awayekî nihênî û veşartî ji aliyê "Komela J-K" dest pêkiribû, bi riya geşkirina bîr û hestên netewî, bi weşandina kovara "Nîştîman" û her wisa rêxistina tiyatroya " Dayika Nîştîman" êdî hêdî hêdî gerek berfirehtir bibûya, loma bangewaza wîstên milî gereke konkretir bibûya, ew proses bi avakirina " Hizbî Demokrî Kurdîstan" bêtir aliyê gelemperî da xwe. Pêşevan Qazî Mihemed ku bi salan berê xwe dabû doza kurdan, bi taybetî bi pêkanîna tebayî û aştî di komelegeha eşîretiyên kurd de, dewrek berbiçav di bilezkirina damezrandina karîna kurdî de leyst.

Piştî şerê cihanê yê duhemîn, qezencên siyasî û aboriya Sovyetê îcab dikir ku piştigiriya hêzên demokrat li Îranê û rojhelata Kurdistanê bike, lê wexta ku hukûmeta merkeziya Îranê karbidestên Sovyetê xapand, îcar wan qezencên xwe li aliyê din dîtin û ew ji piştî kurd û azeriyan vekşîyan.

Hizba Qazî Mehemed bawerî bi hêzên Sovyetê anî û bi heq derfet bi wext dît ku Cumhûriyeta kurdan damezrîne.

Ew karên wan însîkasek tebiû bû. Yanî lew furstê dîrokî îstîfade kirin û hakimiyê-

ta kurdan îlan kirin.

Heke mirov berê xwe bide ser dokument û belgeyên zemanê (Serdema Cumhûrî) dibîne ku serokên me prosesa damezrandina hakimiyetên kurdan bi awayekî tespîtkirî nedîtine, wana zanîne ku ew tişt, gerek faktorên cîhê cîhê bide ber çavan.

Em bi kurtî dikarin bibêjin ku piştî Sovyetî ji qewl û sozên xwe vekşîyan, faktora eslî di hilweşandin û nemana Cumhûriyetê de bûne.

Qazî Mehemed û hevalên wî bi çiyayên xwe şerefa serbixweyiya biryara kurdan parastin, loma nereviyan. Ew ji nîfşên kurdan yên îro re jî derseke mezin e.

2 - Bê ku mirov bekwe dawên îhsasî, bi dilqaymî dikare bêje ku, ew tevgera kulturî ku berî îlankirina Cumhûriyetê û her wisa di mudeta 11 heyv temenê Cumhûriyetê de hat kirin, ta nuha jî ji kurdan re nimûneyeke geş û cîhê serfiraziye ye.

Min qala tiatroya " *Dayika Niştiman*" kir. Her di wê wextê de li çend şûnan hatibû nîşandan. Di komelegeha *Babmezinî* (Patriarchal) ya kurdî de, Cumhûriyetê mafên jinên kurd bi damezrandina " *Hizbî Yayan*" - Partiya Jinanpêş xist, ji aliyê irsgirtinê, maf û parên wekhev da jin û mêran.

Ew karekî mezin yê kulturî bû. Di çaxê berî damezrandina Cumhûriyetê de, yanî di havîna 1943'ê kovara " *Niştiman*" dihat weşandin, di çaxê Cumhûriyetê de li Mehabadê rojnama " *Kurdistan*" mîna

organa partiyê derdiket, kirêkarên çapxana Kurdistanê rojnama " *Girr û Galî Mîndalanî Kurd*" bi taybetî ji bo zarokan derdixistin. Partiyê kovara " *Kurdistan*" jî derdixist ku babetên wê bêtir edebî û tarîxî bûn, Komela *Lawên Demokrat* organa xwe bi navê " *Hawarî Niştiman*" diweşandin.

Li Bokanê ronakbîrê hêja Hesenê Qizilcî kovara " *Helale*" wek organa liqa hizbê derdixist. Di rojnama *Kurdistanê*, di dema Cumhûriyetê de behsa derxistina kovarek bi navê " *Zanist*" ji aliyê wezareta Ferheng tê kirin, ku ez nizanim derketiye an na.

Yek ji karên herî efektîv yê Cumhûriyetê, di aliyê kulturî de, vekirina xwendegêhên kurdî bûye.

Pêşevanan zarokên xwe şandine mektebê bo ku xelkên din jî berê xwe bidine girîngiya xwendewariyê di nav kur û keçên kurd de.

Di serdema Cumhûriyetê de du şaîr û edîbên mezin ên kurd Hêmin û Hejar dest bi geşbûna xwe dikin û naznawên şaîrên milî distînin.

Nuxtek herî muhîm jî, di dema Cumhûriyetê de topkirin û lêxwedîderketina zarokên bê dê û bav bûye.

Kêmayetî cihû li Mehabadê medreseyên taybetî ji wan re hebû da ku bikaribin bi zîmanê xwe yê zikmakî bixwînin.

Ew bûn bi kurtî tevgera kulturî û edebî di dema Cumhûriyeta Kurdistanê de.

CUMHÛRIYETA KURDISTANÊ



Kerîm HUSAMÎ

1 - Avakirina Cumhûriyeta Kurdistanê li Mehabadê di dîroka neteweya kurd de ewçend girîng e, ku bi kurtî behskirina wê diyar e.

Avakirina Cumhûriyeta Kurdistanê berî her tiştî berhema xebat û têkoşîna gelê kurd bû, ku bi dirêjahiya dîrokê di bin destan de bû.

Di şerê cihanê yê duwemîn de têkçûna hukûmeta Pehlewî û hatina rûs û îngilîzan bo Îranê, ji bo avakirina Cumhûriyeta Kurdistanê wek hokarekî têtê hejmartin.

Piştî rûxanî hukûmeta Pehlewî, gelê kurd li rojhelatî Kurdistanê bi xurtî û zû ji bo xebata siyasî hate ser xwe û di 16'ê tebaxa 1943'an de rêxistina xwe ya bi navê *Komel J. K.* avakirin.

Komela J.K. zû di nava xelkê de belav bû, li hemû bajarên Kurdistanê liqê xwe damezirand. Kovara *Niştiman* wek organa komelê hate weşandin.

Komela J.K. ligel şoreşa Barzanî bi serok Mustefa Barzanî re peywendî çêkir.

Piştî seredana hinek serokeşîr û rewşenbîrên kurd bo Baku, di 16'ê çiriya pêşin 1945'an de Partiya Demokrat ya Kurdistanê bi serokatîya Qazî Mehemed hate avakirin û navê J.K nema. Partiya Demokrat, di programa xwe de daxwaza otonomî dikir.

Partiya Demokrat li Kurdistanê karîn girte dest û di 17'ê çileyê pêşin 1945'an de li şûna alaya Îranê, alaya Kurdistanê hate danîn.

Roja 22'ê çileyê paşin li Mehabadê bi beşdariya 20 hezar kesan Cumhûriyeta Kurdistanê hate avakirin û pêşevan Qazî Mehamed bû serokê Cumhûriyetê.

Piştî avakirina Cumhûriyetê, hukûmeta millî ya Kurdistanê ji 14 wezîran pêkdihat:

Serokwezîr: Hacı baba Şêx

Wezîrê bergîrî: Mohamed Husenxanî,
Sefî Qazî

Wezîrê Navxo: Mohamed Aminî Moînî

Wezîrê Aborî: Ahmadi Îlahî

Wezîrê Kar: Xalîfî Xosrevî

Wezîrê Ferheng: Menafî Kerîmî

Wezîrê Post û Telegraf: Kerîmî Ehme-

dein

Wezîrê Tebîqat: Sidîk Haydarî

Wezîrê Ticaretê: Hacı Musteyai Dawidî

Wezîrê Keşawerzî: Mehmûdî Welîzade

Wezîrê Mişawir: Abidrehmanî
Elxanîzade

Wezîrê Rêga û Ban: Îsmâîlî Elxanîzade

Wezîrê Behdarî: Seyid Mohamed Eyu-
biyan

Wezîrê Adliye: Mela Huseynî Mecdî

Cumhûriyeta Kurdistanê tenê 11 mehan
dewam kir. Di vê navê de ji bo
pêşdexistina Kurdistanê gelek gavên
mezin hatin avêtin, wek;

- Pêkanîna leşkeriya millî ya Kurdistanê
- Avakirina weşanxaneyê kurdî
- Avakirina medreseya kurdî
- Danîna qanûnên pêşketî
- Girêdana peymanê ligel Azerbeycanê
- Beşdarkirina jinan di karê çandî de û

hwd...

Hilweşandina Cumhûriyeta Kurdistanê
berî her tiştî gerek le paşkêû komelî avsay
kurdewarî bête bijartin. Bêî biryara rêberê
Cumhûriyeta Kurdistanê, xiyaneta hinde
axa û serokeşîrên kurd, xebata gelê Kur-
distanê firotin.

Çûyina leşkerên Sovyet ji Îranê, bizava
kurdan kiz kir û li hemberî leşkerên Îranê
teslîm bûn.

Avakirin û hilweşandina Cumhûriyeta
Kurdistanê azmûnî pir baexiyan ji bo gelê
kurd bi cî hişt.

2- Bizava rizgarîxwaziyê li rojhelatî
Kurdistanê li melbendî mukriyan, bo bu-
janewey ziman û kultura kurdî gaveke

giring avêtine.

Di dema hukûmeta Pehlewî de ziman û
kultura kurdî qedexê bû. Heta kesî
nikarîbû kincên kurdî li xwe bikira.

Piştî rîmanî hukûmeta Pehlewî, gelek
ji mela û xwendayên kurd, bi nivîsîn û be-
lavkirina şûrnivîsa kurdî zulm û zordariya
hukûmeta Pehlewîyan dianîn ziman.

Komeleya J. K. kovara *Nîştîman* da
weşandin û wê di hişyarkirina xelkê û be-
lavkirina zimanê kurdî de roleke berbiçav
leyist.

Bo yekem car xortên kurdan şanoya
Dayika Nîştîman anîne ser şano.

Piştî avakirina Cumhûriyeta Kurdis-
tanê, bujaneve û pere pê danî, ziman û
kultura kurdî cihekî girîng ya siyaseta
hukûmeta millî ya Kurdistanê bû. Di wê
navbera kurt de, hukûmeta Kurdistanê di
aliyê kulturî de gavên mezin avêtin. Wek:

- Avakirina Weşanxaneyê Kurdistan
- Derxistina Rojnameya *Kurdistan*,
kovara *Kurdistan*, *Hawarî Nîştîman*,
Hawarî Kurd, *Kovara Helale*, *Girûgalî*
Mindalan.

- Avakirina Stasyona radio
- Avakirina Kitêbxaneyê Millî
- Avakirina Sînemaya Kurdistanê

Bujanewe û perezêdanî ziman û kultura
kurdî beşekî girîng ji têkoşîna
Cumhûriyeta Kurdistanê bû.

CUMHÛRIYETA KURDISTANÊ



Mahmod MOLA EZAT

1 - Di dema şerê cîhanê yê yekemîn, di krîza aborî, siyasî û civakî de û di dema destpêkirina şerê sar û bidestxistina çekên atomî de û her wisa reqabet û berberiya vekirî û veşartî ya zirhêzan, fersendek dîrokî ji kurdan re çêbû û Cumhûriyeta Kurdistanê, di beşekî Kurdistanê Rohelat de, di 22'ê çileyê paşin 1946'an de hate damezrandin û li Paytext -Mehabad- hat îlankirin. Ew bar û hal û mercên ku hebûn, rûdaw û fenomenên wilo çêkirin ku di tekmîlkirina wê prosesê de pir rol

leyistin, wekî: Dagirkirina pir navçên Îranê ji aliyê hêzên Bîrîtanya û Yekîtiya Sovyet, - ku ew Kurdistan jî dida ber xwe- ew dagirkirin bû sebebê hilweşandina hemû dezgehên îdarî û ordiya Îranê li hinek bajar û bajarok û gundên wê beşa Kurdistanê û çêbûna serdemek azad, avabûna Komela J.K ku piştî Partiya Demokrat ya Kurdistanê cihê wê girt. Mêj de bû ku cemawerên (selemper) kurd xewna rojek azad û serbixwebûna Kurdistanê didîtin. Piraniya xelkê kurd amade bûn ku bi serokatîya pêşevan Qazî Mehemed xebatê bikin û xizmeta Cumhûriyetê bikin...

Çend faktor û ji hemîyan girîngtir û rasterastir Yekîtiya Sovyetê bû. Armanca wê ya sereke ew bû ku zext bixe ser rejîma Tehranê, da ku naçar bibe îmtiyaza neftê bide.

Gava ew xwestekên Sovyet hatin cî û kompaniyek hevbeş li ser petrolê tewafûq hat kirin û peyman jê re hat îmzekirin (1946-04-04), Sovyet leşkerên sor ji Îranê derxist û ew çekên ku dabûn Azerbeycanê - lê Cumhûriyeta Kurdistanê ji wan hatibû bêparkirin- vekişandin. Ew bûyer yek sebebên bingehîn yê hilweşandina Cumhûriyetê bû. Helbet sebebên din jî hebûn, mîna: Pregezperistbûna rejîma Îranê, alîkariyên zirhêzên xorawa û dagîrkerên din ên Kurdistan bi wê re, nebûna mercên bi hêz ji bo parastina Cumhûriyetê û ew asteng û êrîşên ku tim û tim li ser rîya Cumhûriyetê bûn, mîna : ew peymanên ku di navbera dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Bîrîtanya û Yekîtiya Sovyetê de hat morkirin, ku li gor wê diviyabû hemû hêz di mudeta şeş mehên piştî şer de ji Îranê derketana û her

wisa destebərbûna wan ji bo parastina yekîtîya ax û xelkê Îranê, bi taybetî li gor van peymanên li jêr:

- Peymana sêlî ku bi peymana "Hevgirtin" tê naskirin.

Di 29'ê çileyê paşin 1945'an de.

- Kongra Tehran di 27-29 çileyê pêşin 1945'an de.

- Peymana îmtiyaza neftê li hember Tehran û Moskovayê di 4'ê nîsana 1946'an.

- Ji vê jî seyrîr ew bû ku rêberên kurd hêviyeke mezin dabûne rageyandina peymana Atlantîk (Nêwerastî Oti 41) ku di navbera Roosevelt û Churchill de hatibû îmzekirin, lê ya rastî her bi qezenca rejîma Tehranê bû.

Sebebên din mirov dikare bêje nizimbûna sewiya şiyarî û aqilê dîplomasî li cem pirr ji serkirdan, qelsbûna dahat û aboriya Cumhûriyetê, nebûna çekên giran û alavên pêwîst ên şer. Nizim û qelsbûna hestên netewayetî ta cihên wisa ku ji aliyê netewa kurd karekî mezin nehat kirin da ji rûxan û hilweşandinê bê parastin.

Kêmasî û nakokiyên hundurî, hilweşandina bi lez a Cumhûriyeta Azerbeycanê, mewqîfên hinek serokeşîr û karbidestên ta ew astî ku giyana teslîmbûnê belav bikin û tesîra li ser mewqîfa pêşevan û hevalên wî, ligel çend zahîreyên din bûne sebebên çekirina trajedîya rûxana Cumhûriyetê û şehîdkirina Qazî Mehemmed, Seyfî Qazî, Sedrî Qazî û bi dehan heval û têkoşerên din ên netewa kurd.

2 - Herçend jî ku Cumhûriyeta Kurdistanê di nav girêh û astengên mezin de dijiya û ji serî ve hatibû mecbûrkirin ku di haletekî leşkerî de be da ku bikaribe muda-

fea xwe bike û li ser asteng û boşayiya hundur û herêmî û nav dewletan jî, Cumhûriyet çirayeke bi pirsinga nav cîhana tariya Kurdistan û hêviya mezin a netewa kurd bû. Pir aliyên jiyanê edebî, ziman, huner û kultura netewayetî di dema Cumhûriyetê de pêş diket. Dab û nerîtên pozîtîv ên kurdî dîsan diket jiyanê. Bo cara yekem bîranîna cejna Newrozê li ser zemîneke azad bi govend, dîlan û civînan dihatê pîrozkirin. Gelek rojname û kovarên mîna: *Rojnama Kurdistan, Kovara Kurdistan, Helale, Gir û Galî Mindalanî Kurd, Hawarî Kurd* dihatin çapkirin. Şaîr û nivîskarên mîna *Hejar, Hêmin, Qanî, Heqîqî, Xalemûn* û hwd... di wan kovar û rojnameyan de berhemên xwe diweşandin.

Zimanê kurdî bûbû zimanê xwendinê. Xwendina bi zorê ji zarokan re û şer li dij nexwendewarî li cem salmezanan destpêkir. Damezrandina çapxane û stasyona radio, hebûna teatr, şanazîkirin bi cilûberg û dab û rewîştên netewayetî bi pêş diketin. Nivîsîn û berhevkirina jiyan û serpêhatiyên gewre û mezinên kurd, damezrandina kitêbxane û qîmetdayina bi jiyanê xwendewarî, çekirina neşîda netewayetî, hildan û hurmet dan (rûmetgirtin) ji ala sê reng ya Cumhûriyetê ku bûbû sembol û alaya hemî Kurdistanê, çekirina gard, muzîk û selama Cumhûriyetê, şanazî bi niştiman û netewe, bi ziman û edeb û kultura xwe şûnên fenomenên anormal bi darê zorê bi ser kurd de tehmîlkirî girtin û pir qanûn û rê û têkûzên jiyanê civakî, ronakbîrî û siyasî hatin çekirin.

NIHA NE WEXTÊ

MIRINÊ YE

- Ji Yılmaz Güney re -

Niha ne wextê mirinê ye,
Çavê milyonan li te.
Niha ne wextê şînkirinê ye,
Dengê milyonan bibe xwe
Rabe,
Bi kerem
Çavê xwe veke.

Niha ne wextê mirinê ye
Destê me li kar sar meke!
Bar meke ewrên di çavên me li taviyê
Keserê li dilê me siwar meke!

Niha ne wextê mirinê ye.
Niha wextê kar
Wextê dîkik
Li ser qapsûnê barkirinê ye.
Û niha çaxê
Bi keftelestê, xewnan
Li dîjminan far,
Mora li ser bextê me y'bi reş
Tarûmar kirinê ye.

Nexweş derman,
Dergistî dîlan,
Zarûk li ber diwaran
Nan dipên,
Payina wan divê bighê menzîlê
Gihîştina menzîlê tu zanî

Karê pê bi pê
Û yê
Hîn
bi hinê
ye.

Divê em bibîşkêfîn hişkegirêka
Li ser qedera me ya reş a ji tewakulê
Divê em der bikin vê kulê
Vê birîna kêmgirtî û genî
Ya ezîtiyê.
Me destana emîti û pêkveyiyê
Li dara xistibû
Lê ew niha
Li hêviya
li xwe
destbirinê ye.

Nabe ku nîvcû bimîne destana me,
Ji gulên curbicur baxçên dîtîne
Bêpar bimîne
Û fikr û raman
Stewr bimînin ji rengên dinê.

Niha ne wextê mirinê ye
Çavên milyonan li te
Ji te ronahî divên
Niha wextê
hêviya wan
geşkirinê ye.

Rojen BARNAS

Di hejmara Nûdemê ya 8'an de , di dawiya rêza pêşî ya helbesta Rojen BARNAS ya bi navê "Xewna Diya Şehîdekî" de, ji berdêla "ew şev" "ev şev" hatiye nivîsandin. Em rast dikin û ji Rojen BARNAS û xwendevanên xwe lêborînê dixwazin

KELA DIMDIMÊ



Haviz QAZÎ

Dema Muzefferê Qaçarî Şehînsahê Îranê bû, zanayê Elmanî Oskar Man di navbera salên 1901-1903'an de, li Îranê gerrek li nava tîr û eşîrên Kurdan kiriye û qefteyek bend, beyt û çîrokên kurdî kom kirine. Piştî wî ew di 1905'an de li Berlînê, di kitêbeke bi navê "Tuhfe Muzefferiye" de çap kirine. Di 1975'an de jî Korê Zanyariya Kurdî ew kitêb li Bexdayê bi du bergan belav kiriye. Seydayê hozanvanan Hêminê Mikriyanî, jê re pêşekî nivîsiye û aniye ser rênivîsa kurdî ya bi tîpên erebî.

Me rind zanî ku em wan beyt, bend û

çîrokên li ser şerê *Kela Dimdimê* yên ku di wê kitêbê de hatine çapkirin, bikin çavkaniyeke sereke û bi vî awayî li jêrê behsa *Kela Dimdimê* pêşkêşî xwendevanan bikin.

Pêwîstî gotinê ye ku ez bêjim, ew şer di 1018-ên K(ocê-nm) de, yanî çarsed sal berî niha, di dema *Şah Ebbasê Sefawî* de qewimiye. Herwekî xuyaye dijmînên Kurdan yê kevn, herweku dijmînên vê serdemê, wî bo serkutkirina bizava kurdî ya azadîxwaz, Kurdên xwefîroş û xayin kirine dardest. Lê piştî *Sefewiyan* û *Osmaniyan* ku Kurdistan di navbera xwe de dabeş kirin, demek hatiye ku derebegên Kurd dest bi stemiya netewetî kirine û bi riya serbexoyî ji zîldariya padîşahên *Sefewî* û ya *Sultanên Osmanî* mejiyê wan liviyaye.

Diyar e *Mîr Xanê Biradost* xwedanê *Dimdim* ê yekemîn alahilgirê vê bîr û hestê bûye û li ber zulim û xwînrejîya *Şah Ebbasê Sefewî* nedanaye û ser neçemandiye, gotiye "Ger ew *Şah e*, ez jî *Xan im*". *Şah Ebbasî* leşker birîye ser *Mîr Xanê Biradostî*, ew kuştîye û jin û kulfetê mala wî dîl kirine û mal û samanê wî tev talan kiriye.

Herçend dijmînatîya *Sultanên Osmanî* û ya *Şahên Sefewî* pir xurt û berdewam bûye jî, lê *Siltanê Stenbolê* komek nedaye *Mîr Xanî*. Çimkî dîtiye ku serbixoya Kurdan textê hukumdariya *Osmaniyan* dihejîne û desthelatdariya wan têxe metirsiyê de, loma *Sultanî* dijmînatîya xwe ligel *Sefewiyan* piştguh xistiye, ta ku *Sefewî* karibin wî dijmînê taze yê ku serî

hildaye serkut bikin, lê ferman rakın û qut bikin.

Çaktırîn jêder û çavkaniyên nivîsî bo rohnîkirina dîroka *Kela Dimdimê* û serpêhatiya *Mîr Xanê Lepzêrîn* (Çengzêrîn-nm), nivîsîna *Îskender Begê* Turkmenan e. Çinkî wî bi xwe di gemardana *Kela Dimdimê* de beşdarî kiriye, hemû rûdanên wê dîtine û di kitêba "*Alem Aray Ebbasî*" de nivîsîne. *Îskender Beg* katibê taybetî yê *Şah Ebbasî* bû. Xuyaye ew bi xwe jî dijminê *Mîr Xanî* bûye. Lewra heçî tiştê ku qezenca *Şahî* tê de hebû, wî ew nivîsîye û bi awayekî xerab behsa *Mîr Xanî* kiriye. Lê her çawan be, wê nivîsê kujiyek tarî li dîroka netewê Kurd rohnî kiriye.

Îskender Beg bi vê maneyê gotiye:

Piştî Romiyên Azerbeycanê dagir kirine, êl û eşîrên Kurd ên li wê deverê, ser li *Sefewîyan* badane û gihîştine Romîyan. Xundkarê Romî, mîrzadeyekî kurdê *Biradostî* yê bi navê *Şah Mihemed* kiriye mezinê *Biradostan*. Lê *Mîr Xanî* serê xwe bo mezinê taze ê *Biradostî* neçemandiye û stûyê xwe bo wî xwar nekiriye. Herdem *Mîr Xan* bi du yek ji mîrê mezinên Kurd dike, dostanî û hevbendî ligel bestîye. Serdemek li cem *Omer Beg ê* hakimê *Sihran*, rabuwardiye û di şerekî *Omer Begî* ligel dijminên xwe kiriye çingilê (mil-nm) *Mîr Xanî* ji enîşkê hatiye birrîn. Piştî wê rûdanê nav û dengê wî bi *Mîr Xanê Colağ* (destqop) belav bûye.

Di sala alaya berzê de *şahî* li Azerbeycanê bilind bûye û *Şah* bi qedeme pîroz xwe berewî dagîrkirina Nexçewan û

Êrewanê kiriye. *Mîr Xan* hatiye ber deriyê melbendê *Şahî* û xwe mîna *Şahperest* û xizmetkar nîşan daye. *Şah* bi çavên rehmê lê nêraye, mezinatî û desthelatdariya *Ter-gewre* û *Mergewerê* jê re bexşandiye û naznavê "*Xan*" lê danaye, serê wî pê bilind kiriye û li ser fermana *Şahî* westayên zêringir destek ji zêrê sor jê re durust kirin, bi cewher û mirwariyên buhagiran ew xemilandine û li baskên wî bestine.

Azayî û merdatiya wî hêla *Xudanê Heybetê* (Şah-H) zor rû bidetê û gelek çakiyan ligel bike. *Mîr Xanî* jî destê xizmetkariya *Şahî* li singê xwe da. Ji saya dilsojî û çavdêriya *Xudanê Heybetê*, roj bi rojê mezinatiya wî cihgîr dibû heta ser ji tevayiya hogirên xwe têperandî. Çend navçên mîrên Kurdan ji hevkarên Romîyan stendin û berdane ser devera xwe. Bi van kiryanan navê wî li navbera mîrên Kurd bi payeberzî û leşkerzorfî derçû. Gelek ji xêl û tîr û mîrzadeyan li dor cemyane û bi xizmetê rawestiyabûn.

Lê pir pê neçû, xurorê xwe li serî da û bayê mezinatiyê ji rê derxist, heta bi hindê, eku *Cixal Oxlî* leşkerên Rom bo Azerbeycanê anî û li dor û berên Tewrêzê şer dest pê kir. Ew şer ji devera wî nêzîk, xwe bi ser ve nebîr û nehate meydanê û negihîşte xizmeta *Xudanê Haybetê*. Piştî şikandina *Cixal Oxlî* û pirtikandina leşkerê wî, ji nû hat xizmetê, lê nehatina wî bo meydanê û xwedûrkirina ji şerî lê nehate dan, da dil lê neşîkê, belevajî hat dilxweşandin û çake ligel kirin, hate îzindan vegere cihê xwe. *Mîr Xanî* bi ser ve xwe li rêza xizmetkaran dadina, lê ji

bin ve ji ber hişikbîriya mezhebî û pîsiya dil û derûnî, li dijî *Qizilbaşên* dewrûberên xwe bi şêwekî dijminane herikî.

Hewayê serbixotiyê li serî dabû, gihîşt hindê hizra avakirina keleyek mezin a asê çêbike. *Mîr Xanî* dîwana dewletê agehdar kir, ku *Kela Ormê* ya kevin ku veherifte bûye û xwe ranagire û nabe pişt pê bêt germkirmê. Ger îznê bidin min, ez ê binaxê çar dîwaran li cihêkî din yê çak darêjim. *Xudanê Heybatê* ageh ji derûn û înyetê nebû û nedizani ku çi pîsî di dilî daye, îna îzin da ku wê *Kelê* ava bike. *Mîr Xanî* ji bajarê *Ormê* dûr û li ser çiyayekî bilind binaxê keleyeke qayim darişt.

Li nava Kurdan dibêjin: Berî Îslamê û di dema *Sasaniyan-Ekasîra* de, her li wî cihî keleyek bi navê *Dimdim* hebû. Lê kartêkirin û destrêjiya rojger, sal û deman ew keleh xapûr û wêran kiribû.

Pîrbodaqxan mezinê *Mîrên Tewrêz*, mirovekî bi ezmûn, serbûr, hişyar û zana bû. Dît serkêşî û serpêçî ji kirayrên *Mîr Xanî* xuya dikin, bi melbend û dîwana pîroz ragehand: *Ku Mîr Xan ji rîya rast wa luday û bayê serpêçiyê û asêbûnê ketiye serî, lewma binaxê wê Kelê li wî cihê berz û asê dariştiye bo roja pêwîstiyê, ez nabînim çu qezenc di durustkirina wê Kelê de bo dewletê heye...*

Bersiva dîwana pîroz jê re: "*Tu mîrê mîran ê wî sînori yî. Ger qezenca dewletê di avakirina wê Kelê de nebe, rê nede ku bête avakirin*".

Pîrbodaqxanî li ser fermana *Şahî*, mirovekî bawerpêkirî şande cem *Mîr Xanî* û pê ragehand, ku ew perwerdê destê *Xudanê*

Heybetê ye û li rêza *Mîrê* mezinên *Şahî* têtê hesibandin. Herçendî *Şahê* zana xwe mitkiriye û deng nekir, lê bi durustkirina wê *Kelê* zimanê pîsan dê bête vekirin, ger wê *Kelê* ji tîrsa pelemerdanên Romiyan durust dike, ew tîrs pêwîst nake, çinkî heke Rom bête welêt, kelên mezin û qayim hene, wek *Kela Tewrêz* û ya *Êrewan*. Ew dê ruken wan *Kelan* û naçin bo çi *Kelên* din. Lê eger ji tîrsa *Mîrên* Kurd be, em xizmetkarên *Şahî* ku parastina sînoran di stûyê me de ye, çawan dê bêdeng rawestin. Ya baş ew e ku destan ji *Kelê* berdî û zimanê xirabe yê mirovan li xwe veneke û xwe neke nîşana buxtaniyên ku bêhna duberekiyê jê diçe.

Mîr Xanî neher guh neda wan qise û amojgariyan, lê êlçiyê *Pîrbodaxan* bi destê *Kurdên Biradost* hate kuştin û berdewamî bû li ser avakirina keleka yekcar mezin a qayim. Paşan azûqe û xorak û çekkêşanê, ji *Ormê* mala xwe bar kir çû di *Kelê* da. Roj bo rojê ew Kele qeyimtîr kir û emraz û berkarên Keledariyê berdaxtir kirin.

Hoyên rastiye û sedemên çarenûsa xwe ya reş, zêdetir pêk dianîn û karên welî dikirin ku bi liç bar û rengan rêk nedikeftin ligel pakî û yekrengiyê.

Bo nimûne, *Xan Ebdalê Mukrî*, birayê *Heyderê Xudanê Heybetê* asê û yaxî bû, ji tîrsan da cihê hecimîn û hewardina wî li çu cihên welaî nemabû. Ew mirov û bîst kesên pê re, bo *Mîr Xanî* pena birin. Wî jî ew li cem xwe hewandin û *Ebdalê Mukrî* kire hevdem û hevrûniştiyê xwe. Lê di eynî demê de bi fêl, hîle û rûvîbazî, êlçiyên xwe şandine derê Alimpenayî (

Şah-H) û xwe wek fîdayî û dilsoj nîşan dida. Û eku dewletê, *Celalî* şandine Kurdistanê, yek ji betalyonên wan xistine jêrê serkirdatiya *Pîrbodaxan*. *Mîr Xanî* eku ew xeber bihîstî bi dewletê ragehand; Navbera min û *Pîrbodaxaniya* ne xweş e û ew qisên xerab derbarî min digehînin payebilindan û mana min li nav leşkerek ew serkirdê wî bit, karekî zor giran e û bo min esteme ye...

Bo dilragirtina *Mîr Xanî*, ev fermana hate dan: Bo xatirê *Mîr Xan* karê serkirdatiyê ji *Pîrbodaqxanî* hate wergirtin û li cihê wî *Hesen Xan* ji Mîrên Iraqê wê serkirdatiyê bike. *Hesen Xan* jî mirovekî çak û rûgeş e û heke dîsan nekarî ligel wî kar bike, bila yek ji kurên xwe û rûspiyeke karzan ligel dused-sêsed kesan ji mirovên xwe bide gel, da dilsojî û dîlpakiya wî bo mîr û hakimên Kurd diyar bibe û bête çespendinê...

Pişti hewqas dilsojî û rêzlêgirtina *Xudanê Heybetê* bo kirî, *Mîr Xan* her li ser serpêçiya xwe ma. Eku (*Hesen Xanê Estaclu*) û mezinên *Qizilbaşan* ji Meraxeyê gehîştin *Mehemed Padîşay* û *Celaliyan* û hemî pêk ve berew bi xizmeta pê hatin teklîf kirin ketine rê û bo *Mîr Xanî* ragehandin: Li ser fermana pîroz a *Xudanê Heybetê* ger ew nekare bigehite leşkerî, bila çend mirovekên bawerpêkirî yên xudanên ezmûnên çakî û xerabîya Kurdistanê jêk cuda dikin û şarezayên rê û rêbarên Kurdistanê, bila wan mirovan bişîne cem wan da pirs û rawêje pê bêne kirin...

Lê *Mîr Xanî* dîsan behane û biyano

girtin. Kurtiya wan behanan jî ew bû: Ku tîra *Celaliyan* ne cihê bawera wî ne û ew nikare nav leşkerekî heft-heşt hezar kesê *Celalî* tê de binkar bike, an jî bimîne. Lewma wan çî riya divêt, bila bigrin û pê ve biçin, paşî dê ew jî hinde kesan dû wan ra şînit...

Ev serkêşiya han di sereta seferê de bi dilê mîrê mezinên dewletê nebû, lê dîtîn çaktir e bi çî rengê heyî *Mîr Xanî* dîlgiran nekin. Çinkî yê vê serkêşiyê ligel mirovên nêzik ji textê *Şahî* bike, pa ligel mîrên din dê çiket.

Bi zimanekî nerm û bi dîlxweşkirin xwest çavên wan bi yek bikevin û tiştê ku qezenca *Mîr Xanî* tê da heye biken. Lê *Mîr Xanî* her bersiva nama wan jî neda û li ser hişkeserî û kellreqiya xwe berdewam bû.

Berî leşker bigehên devera hin hukmê wî, destek ji Kurdên *Biradost* berhingarî leşkerî bûn û ligel *Celaliyan* li pêşiyê çûn, ketin şer û lêdanê. Du kes ji *Celaliyan* kuştin û hejmarek din jî birîndar kirin. Eku *Hesen Xan* û mîrên din bi vê rûdanê hatin agehdarkirin, hêzên xwe yên leşkerî bi paş vegerandin û niv fersexî ji Kelê dûr kirin.

Hesen Xanî dîsan hinde karzan şandine cem *Mîr Xanî* û bi qisên xwe û dostane ligel peyivîn û sedemê wê reftara nelibar jê pirsîn, lê wî her behanên seyr û bê serûbin anîne gorre û hindî jê hat derê dostaniyê û têkelîyan dixistin.

Roj bo roj kar aloztir lê dihat, eku *Qizilbaş* û *Celalî* ji ordiyê derdiketin bo cêbecêkirna kar û barên pêwîst, Kurdan dikuştin û rût dikirin. Dubarekirin û

dewambûna van destdirêjiyan bûne egerê bihêzkirina dijaminatiya li navbera herdu layan.

Mehemd Paşa jî, bo tolvekirinê birrên zilam dişandin nêzî Kelê. Kurdên Kelê jî dihatinê û hercar çend kuştî û birîndar ji herdu layan diketin qada şerî û şer û kêşa xurt gerimtir lê dihat.

Hinek kes ji *Celaliyan* ji *Mehemed Paşa* dilkurmî bûbûn û bi taybetî *Mehemed Beg* birayê Tewîl, li wan serî bada û bi nêzîkî sêsed-çarsed kesên ve gehîştin *Mîr Xanî*. Vê rûdanê *Mehemed Paşa* gelekî nerhet û şepirze kir.

Agirê dijaminatiyê hindî wêvetir bû geş û xoştir lê dihat. Fermana dagirkirina Kelê û bindestkirina milk û deverên Kurdên serkêş hate danê. *Hesen Xan* bi naçarî li wê derê nişteci bû û rewşa alozî ya deverê gihande pêpkê textê *Şahî*.

Alî Cenab (Îtimad Eldewle) berî hingê bo Erdewîl hatibû şandin, taku bi çavekî jîrane û kerame temaşê bike, alozên wan sînôr û deveran û eger dilê *Mîr Xanî* ji tiştêkî mabe, dilî lê xoş bike û bi kerema şahane hîwadar biket û *Celaliyan* jî ji dora Kelê veguhêze, mîna salên berê cihê he-waryanê bo nîşanket û pênc hezar tumenên zêr ji xizna şahane bide *Celaliyan*. Eger *Mîr Xan* li ser rewşa xwe a xirab ma û serhişkî û serkêşî her kirin, reh û rîşalan lê biqetîne û milkên wî li ser *Celaliyan* lêgve bike ta ku *Celalî* li wê derê nişteci dibin.

Eku *Alî Cenab Îtimad Eldewle* ji Erdewîlê hatî Tewrêzê, ligel hakimê wê *Pîrbodaqxa*n û *Berxordar Begê Enîsê* û

Topçîbaşî û *tivengçiyên* *Esfehanê*, yên *Xuresanê*, *Tewrêzê* û *Bafîqê* bi rê ketin. Du hezar *Celalî* jî gehîştinê.

Li *Selmasê*, *Xanweled Xazî Beg* hakimê deverê û *Ewliya Begê* kurê *Seyfedînî* hakimê *Enzîlê* û *Soma*, ew jî bi du leşkerî ketin. Eku ew hemî leşker gehîştî *Ordîya Ormê*. *Hesen Xan* û *Mehemed Paşa* û mezinên navçe hatin pêşwaziyê û gehîştin xizmetê. Wan jî li cihekî baş leşkerbazî kir.

Roja duwê *Cenabê Îtimad Eldewle*, mirovekî bawerpêkirî ligel *Melik Axa Mehemedê Tisucî* kevnetêkel û dostê *Mîr Xan* şandine cem. Piştî nesîhet û amojgarên dostane û xêrxwazane, ji *Mîrî* xwastin ku rukmaniyê hind neket û sistiyê pêşan bidet û li dorên Kelê amade be bo dîdariya *Cenabê Wezîrî*, da bo nehêlana nakokiyê riyek bê dîtin. *Mîr Xan* ew pêşniyar qebûl kir û ji Kelê hate xwarê, *Cenabê Wezîrî* jî ligel çend kesên çû, çavên wan bi hev ketin û behsê hemû tiştan hate kirinê.

Mîr Xanî bi fir, fêl û derewan xwe wek xizmetkar nîşan da û got: "Ji tirsê *Celaliyan* û ya *Hesen Xanî*, min bo van çar dîwaran pena aniyê. Timê *Mehemed Paşa* jî di milk û malê min daye û li xizmeta *Xudanê Heybetê* ez bednav kirime. Ez nuha tikayê ji *cenabê Wezîrî* dikim, li xizmeta *Xudanê Heybetê* uzra min bixwaze û bihêlin vê zivistanê ez li vir bimînim. Yek ji kerrên xwe li jêrî xizmeta we dê bişînim *Dîwana Pîroz* û eku *Xudanê Heybetê* vê biharê têt havîngehê, ez bi xwe dê çim binê rêsimî maç bikim".

Cenabê Îtimad Eldewle dilniha kir ku

hemî daxwazên wî qebûl kirine bi merc, belên û sozên xwe bînite cihanîn û çinkî Keladariya wî deng daye û da xelk jî bizane ku ew ne serkêş e û ne jî asê ye, bila kes û kar û dest û peywendarê xwe bîne nav *Qizilbaşan* û ligel mezinê mezinên wan êkdu bibînin û rojekê ew bibit mêvanê *Îtimad Eldewle* û rojekê jî *Îtimad Eldewle* bibe mêvanê wî, ta ku deng û behsa xweşiya neybera wan li wan sînor û deveran belav bibe. *Mîr Xanî* ewçend qebûl kir û razî bû ku roja dawî ji Kelê bête xwarê.

Cenabê Wezîrî civîneke baş û ciwan rêkxist û bo xatîrê dilê *Mîr Xan*, kesekî ji tîra *Celaliyan* gazî nekir wê civînê. Rojê hemî, li benda *Mîr Xanî* man. Lê çu jê diyar nebû. Dîsan *Axa Mehemed Tisucî* şandine cem, da bizane bo çi paş ket û diyar nebû. Paş danûstandinên dirêj, *Mîr Xanî* gote *Axa Mehemed*: " *Qisa rast ew e, rûspiye Biradostan, ne yê emîn in, ji fir û fêlên Qizilbaş û Celaliyan hizir dîkin ku cenabê Îtimad Eldewle pê çênabe pêşiya wan bigire û me ji wan biparêze. Bi kurtî ez rihê xwe nadime destên wan. Ger bi qezence xwe bizanim ez ê kurekî xwe bi diyarî dê pêşkêş bikim û dê nêrme xizmeta Xudanê Heybetê. Ger xeyaleke din di serê wan de heye, ew ez li vê hewşê rûniştî me û ji vê Kelê bêtir min çu çareyên din jî nînin...*"

Nepakî û nesafîtiya niyeta wî di vê dîdarê de bi carekê eşkere û diyar bû ku ew hemû danûstandinên berê kirine tev fir û fêl bûn. Îcar wî xwe di Kela qayim de asê kir û riya rukmanî û serkêşiyê girtin.

Alî Cenab Îtimad Eldewle ligel Mîran hatin ser hindê, ku ev nermkêşiya ligel *Mîr Xanî* bi çu rengan rêk nakeve ligel meslehetê dewletê û hatina wezîrê mezin û bawerpêkirê dewletê hate binê Kelê û vergerana wî bi destên vala, tiştê şorewî ye û nayê qebûlkin. Hemîyan biryar da ku dora Kelê bigirin û cab jî gehandin pêpkê textê Şahî.

Kela Dimdimê li ser kopê çiyayekî yekcar bilind durustkiriye, mîna parçekevirkî teng û dirêj, tûj weke piştayekî ye. Ji layê bakur û başûr ve newalên gelek kûr in û ji ber bilindahiya wan herdu layan pêwîstî bi kêşana çu şurhan bo nebûye. Layê rojava şurhanek yekcar asê heye û deriyek jî bo çêkirine. Ji derwazê wî derî û heta binê çiyê riyek di nav kevrî de heye û hinde teng e, gelek zehmet e siwarek tê re derbas bibe. Şurhek asê li layê rojhelatê ava kirî ye, ligel burcên bilind û deriyek lê heye. Ji wî derî heta tîrhavêjekê parçekevirkî rast, req û sext e. Li wê derê jî burceke qayim mîna kelekê heye, heta ew burc bindest nebe, çûyina nava kelê bêimkan e. Ava Kelê, ji hawizekî mezin tê dabîkirin, ku ew jî bi ava baranê tîjî dibe. Ji layê bakur û li nava geliyê nêzî kelê, kaniyeke kêrmaş heye û coyek jê kişandine gehandine hêwiz. Ava wê kaniyê ji êvarî û hetanî roja duwê hawiz tije dikir û tîra rojekê bo xelkê Kelê dikir. Riya wê coyê di binê erdê re kişandinbûn ku ji ber çavan berze dima.

Bo parastina ava hêwiz, burcek di rex Kelê de hebû û lê nobedarî her berdewam bû.

Ji layê basor ve kunbefrek saz kirine, da zivistanan befir lê kom bibe. Li rex wê çalê hawizekî din çêkirine da ew befir eku havînê bihele, ava wê biçe hêwiz û dema kombûna avê bête bikaranîn. Bircek li ser wî hawizî jî hatiye durustkirin, pasevan û tivengçî li ber hene, nav lê danaye *Bûzliq*, ew jî wek *Sûliq* binerdkiriye.

Bi kurtî, *Kela Dîmdîmê* ne her yek kele ye, lê pênc in. Yek kela eslî ye, yek jî kela xarê ye, yek *Sûliq* û yek jî *Bûzliq* e, ya pêncan burcê mezin ê derveyî derokê rojhelatê ye. Her pênc kele wisan berz, asê û qayim in, ku bi xeyalê jî mirov hizra bi-destveberdana wan nake.

Cenabê Wezîrî bi zanîn û bîrtijî, hişyariya xwe li kongreya mezinên leşkerî gelek rê û tîgbîr bo dagirkirina Kelê danan û emraz û berkarên pêwîst saz kirin.

Li wê demê pêncsed tivengçî ji leşkerê taybetî yên *Xudanê Heybetê* bi serokatiya *Sefer Qulî Beg* yê *Yuzbaşî* û *Qurçiyên Çingî* komek gehiştin. *Genc Elî Xan* jî ji *Tewrêzê* bi leşkerê berdax ve hat. *Hesen Xan* û *Mîrên* hevbend û tivengçiyên *Esfahanê* û *Mîr Fettahê* serkirdê wan li layê rojhelatê ve sengerên xwe danan. Layê rojava bi *Pîrbodaqxa*nî hate spartin. *Muradxanê Sultanê Çînî* û *Xelîl Sultan* û *Mehemed Teqî Beg* beramberî burca *Bûzliqê* hatin şandin. Parastina derwazê wî layî bi *Genc Elî Xan* spêrdira. Tivengçiyên *Mazenderanê* ligel *Sefer Qulî Beg* û *Qurçiyên çingî* li layê bakur hatin danan. *Berxordar Begê Enîs* ligel du topên mezin û yeka *Balîmz* cihê xwe girtin û *Quban Sultan Bêgdilî* kirin *Serkirdê* topxanan; topeke

biçûk jî ji *Derya Reş* gehiştê wir û danane nava sengerê *Hesen Xanî*. Lê *Mehemed Paşa* tuşî nexweşîya dilî bû, çu xizmet pê nehatin spardin. *Celalî* jî hatin dabeşkirin li ser leşkerî û pênc hezar tumenê zêr bo hate şandin û li wan dabeş kirin. Bo her hozekê cihek tîrxan kirin. Leşkerî xîvet (kon-çadir-N) hildan û her desteyek çû ser karê xwe.

Mîr Xanî gelek caran mirov şandin, da belkî bi derew û delesan wê kêşê ji xwe dûr bike. Lê fir û fêlên wî aşkere bûbûn û kesî guh neda qesên wî. Ew naçar bû ku ji bergirî û keledariya xwe bike.

Çend kesên mîrzade yên *Biradostî* ji kelê revîyan û çûne rêza *Şahperestan*. Her çî kesê ji wêrê dihat, digot: "Ji ber kêmiya avê rewşa xelkê Kelê perîşan e, çinkî saleke hişk û kêmbaran di ser wan re boriye, ava hêwiz kêmbû û bêhîna genî ketibûyê, heywan pê avdidan, ava *Sûliq* bi tenê bi kêrî vexwarinê dihat, ew jî hind bû, bade bade bo vexwarinê didine maqûl û rêzdaran". Herweha digotin: "Heke li jêrî erdê neqebekê bikolin û bigehinine ava *Sûliq* û *Solinê*, çu caran xelkê Kelê bêav namîne".

Ew gotin, kete ber aqil. Hostayên şareza hatin û xerîkî kunkirina erdê bûn. *Hesen Xan* jî layê rojhelatê hate pêş, *Pîrbodaqxa*n jî ji layê rojava ve, bizava xwe bo wî karî tîrxan kirin.

Parêzerên Kelê ji berebeyanê ve dirijiyane nava çeperên xwe, şerên çak digêrlan, guleyên tivingan mîna terk û terezê bi ser azadan ve dibarandin. Du-sê caran di roja ronak de Kurd ji sengeran dihatin der û

hêrîşên giran îrane ser leşkerî, lê leşkerî xwe gelekî baş li ber wan hêrîşan radigirt û bergiriya hêrîşkeran bi tundî dikirin. Hercar ji herdu layan gelek kuştî û birîndar diketin. Carekê çeperên *Nîmetullayê Sultanê Sofiyan* ketin ber hêrîşeke wan. Sofiyan azayetî û merdayetiyek seyr nîşan da; pênc kes li derê çeperekê, yek li dû yekî ketin û nehêlan Kurd bigehine nava wan. Her çi kesê dihate kuştin, giyanbaze-kî dî cihê wî digirt. Wê rojê hemiyan mêranî û azayî nîşan dan. Dî wî şerî de heft-heşt kuştî û panzdeh birîndar leşkerî dan û Kurdan jî heta bîst kesan kuştî dan û sih-çil ji birîndar bûn.

Ew topa beramberî burcê ku hatibû danan, di nava sermerê *Hesen Xan* de, paş bîst rojên topbaranê diwarên burcê deriz kirin, lê weh lê nehatibû ku leşker bikarit pê da biserkevite burcî.

Rojekê *Hesen Xan* bê ku pirsê ji *Îtimad Eldewle* biket, hêrîşek bire ser burcê. Digel diwanzdeh lawên berketî yên mêrçak, xwe gehandin ser burcê û çendek jê hatin kuştin. Du sed kes ji leşkerên wî gihîştibûn ber diwarên burcê. Heta nivê şevê şerî domand û eynî dema bizav dihate kirin ku burcê kun bikin, lê bixafletê Kurd ji pişt ve hatinê û palemarî leşkerî dan û bo şerreşîr, ji ser burcê guleyên tivingan barîn û ji Kelê jî destrêj dihate kirin, komek jî bo leşkerî neçû, neçar bo dest ji şerî berde û vejeriya cihên xwe. Hin lawên aza û berketî di wî şerî de hatin kuştin û birîndar bûn. *Hesen Xan* ji azatiya xwe a dîname poşman û şermezar bû, lê *Cenabê Wêzîr* li dû tiştê borî neçû û

dilxweşî dayê; di şeran de zor karesatên diltezîn diqewimin û girtina Kelan bê karesatên weha nabin.

Maweke dirêj hosta berdewam bûn li ser karê xwe, lê serên rîya li ber wan berze bûn û nikarîn bi ser çavikên avê bikevin; nedizanîn berê neqebê bidine çi layekê û neçar man, herçendî pêngava nîşanekê biçe qînin da diyar bit ka neqeb bo çi layekê diçe. Wan nîşana Kurdên Kelê bi merema leşkerî hesandin, ew bi xwe jî ji bêavî weke masiyên ketibin torê, ji tîhna qiqîçî bûn. Hêrîşên xwe yên şevê li ser karkerên neqebê tund û tûj kirin û digel nobedarên tîvengçî ji Mazenderanê, *Sefer Qulî Begê* û *Qorçî Çignî* diketin şer û lêgdanên giran û derfetî yên karkirinê nedidane hostayan. Hersê mehên Remezanê û Şeşekan û navcêjnaw ew şer û kêş lê berdewam bûn.

Du-sê caran nêzî hezar kesî ji şernekiran û jin û zarok ji Kelê hatin der û xwe teslîm kirin. Kurdan bi şilejawî û zehmetî xwe gehandine ser avê. Di wê gemardanê de ew kanî bi ava jiyanê dizanîn û bi fedekarî bo parastina Sûliqê dikoşîn.

Ekû leşkerî dîtî ew hemî hewlidanên ku hatine kirin, bo dîtina serçavkaniyê bêsûd û encam bûn, biryar dan ji ser erdî jî bo kaniyê biçin da banê hewza Sûliqê kun bikin û berê topan dane wî cihî, da tîrs bikeve dilê Kurdên gemarday û da newêribin xwe ji wê derê nêzîk bikin û di eynî demê de jî karê neqebê her berdewam bû.

Biryar hate dayîn ku *Mîr Sofî*, *Mîr Bazokî* û *Mîr Muqeddem* sengerên xwe

vegubêzne nêzîk Sûliqî. *Hesen Xan* ji mirovên karzan li şûna xwe danan û serpiştiya wan Mîran xiste stûyê xwe. *Pîrbodaqxan* sengerê xwe berewê Sûliqî dana. Girtina Kelê hind li cem Cenabê *Îtimad Eldewle* girîng bû, ew bi xwe hat ser topxanê û bist û yek rojan li wê derê ma; ji beyanî heta êvarî havêtina topan û parastina çeperan li jêr çavdêriya wî bû. Şer berdewam bû, kuştî û birîndar ji herdu layan diketine qada cengê.

Bi rex çiyayî ve şikeftê hebû, Kurdan ji binê wê neqebek kolan, da bigehine nava şikeftê û ji layê serî ve, rê li leşkerî bibirrin, da negehite Sûliqê, eku leşkerî ewçend zanî, dît çaktir e berî Kurd bigehin şikeftê û karî li wan têgden, ew xwe bigehînê. Nêzîkî sih lawan ew kar xiste stûyê xwe. Sibê zû ji sengeran derketin û bi xar û bez xwe di şikeftê qutan. Destrêj ji Kelê ve lê hate kirin û yek kes bi tenê ji wan hat kuştin.

Heta nîvê şevê Mîrên gewre li sengerên xwe rawestiyan û zêrevanî kirin. Piştî nîvê şevê du milên Kurdan ji Kelê derketin, milekî rûkiriye di nav şikeftê de û ligel leşkerê li wê derê sîng lêgdan. Herçend deh kes ji leşkerî hatin kuştin, lê şer berew germî ve diçû, heta guleyên leşkerî xilas bûn û yên mayî dest dane şûrê xwe, ji şikeftê derketin. Heşt kesên birîndar bi tenê ji wan sih lawan gebiştin sengeran û yên din riya nemanê girtin. Kurdan du birîndar ji wê destekê girtin, yek ji wan tivengçiyekî Esfehanî bû û yê duwê Pazokî bû. Herdu birîndar birine Kelê, ji ber mêrçakî û azayetiya wan

birîndaran, *Mîr Xanî* nehêla ku bikujin, ew derman kirin heta ku birînen wan sarrej û çak bûn, paşê berdan û vegeriyane malên xwe. Şerê wê şevê heta berebeyanê kêşa, termên kuştîyan li ber derê şikeftê diyar bûn. Dest û dilên leşkerî piçekî sar bûn, herweha *Cenabê Îtimad Eldewle* dilteng û nerehet bû. Lê di şeran de ev reng rûdane tişteki edet e.

Ji bo ku dijmin bi wê serketinê dilxweş nebe, leşkerî lê bizava xwe tundtir kirin û xerîkî kar û barê şerî bûn. Her di wê rojê de çil kesên *Istaclu* ligel *Hesen Xan* gerim bûn û xîretê xwe li serî da û xwe ji bo girtina şikeftê amade kirin. Piştî rûdana şeva berê *Îtimad Eldewle* dudil bû ku îznê bide wan, bi wî karî rabin an ne. *Hesen Xanî* zor hewl da Cenabê Wezîrî, piştrast ket ku dê ew bi xwe aghdarê wî karî be û bi hêzeke sêsed kesî bergiriya hêrişa Kurdan bike. Ji layekî ve xweş û ji layekî ve ne xweş, Cenabê Wezîrî ew kar pesind kir û izin dayê ku bikin. *Quban Sultanê Bêgidlî* û *Îmam Qulî* teklîf kirin bi hemû hêz û şîyanên xwe da wê şevê piştevaniya *Hesen Xanî* bikin.

Bi tidarek çak û çek, leşker baş berwe şikeftê çû û Kurdan bersîng lê girtin, şerên yekcar tund û giran hatin kirinê. Kurd sam û mendehoş man ji zayetî û xwebextkirina hêrîşgera. Hera *Hesen Xanî* û mîrên ligel li derê û gurre gurra şerî li nav şikeftê heta berebeyanê dok kêşa. Kurd neçar bûn paş vegerin û şikeftê bo leşkerî bihêlin. Kurdên avkêş yê hemî şevê av bo Kelê dikêşan ji kar ketin û hatin kuştin, birîndar bûn bi agirê top û tivengan.

Pêngav pêngav leşkerî sengerên xwe pêşve birin heta gehîştin ser banê hawizê Sûliqê. Nobedarên hêwiz nikarîbûn xwe li ber agirê şerî bigirtana, reviyên çûn nava Kelê. Leşkerî banê hêwiz kun kir û ji wêrê riya avê dît û zanî serçavkanî ji ku ve tê, riya avê bi ber û teqne girtin û ji Kelê av birî. Li binê Kelê jî lêgdanek mezin dest pê kiribû, Kurd zor têkoşîn leşkerî ji Sûliqê dûr bêxin, lê nikarîn wê armancê bi dest xwe ve bînin. Pasevaniya Sûliqê bi tivengçiyên Mazenderanê dihate spardin, her Mîrek vegere sengerê xwe yê berê, Cenabê *Îtimad Eldewle* jî ji cihê topxanê vegera baregeha xwe. Ji serê zivistanê heta biharê bizava leşkerî kêşa heta karî ava Sûliqê dagîr bike.

Mîr Xan û mezinên Kelê heta deh-pazdeh rojan bi ava kêma Bûzliq diqetand, xelkê Kelê ew mawe bi ava bêhingenî ya hawiz derbas kir û berdewam bûn li ser berrevaniyê û keledariya xwe. Bext û êxbala wan baş bû, ewrên reş li esmanî ketin gurmênê û baranên çak û bêrawestan bardin, jiyan carek di vegera Kelê û xelkê pakî bi avê nema û ew hemî hewildan û têkoşînên leşkerî di wan sê mehan de kirin bo dagîrkirina Sûliqê hemî bi avê da çûn. Xelkê Kelê sûr û rijdûr lê hatin li ser berevaniyê û xwe ragirtinê.

Pişî wan baranên zor, çu sudeke weh bo Sûliqê nehêla, biryar hat dan ku *Mîr* û Serleşker sengerên xwe berew pêş bibin û bi hêzaaskan Kelê bigirin. Cenabê *Wezîrî* jî baregehê xwe guhast û çu bo layê sengerê *Hesen Xanî*, *Sengerekê Sefer Qulî Begê* û zîlamê teybet ên *Şahî* kire

sengerê xwe û lê damezira.

Şev û roj hemî têdikoşîn, berkar û kerestê şerî dikêşan û xirvedikirin. Kirêkarên neqebkirinê, asin li ser textekî stûr kêşan û mîna starekê çêkin, da li piştê karê xwe bikin û ji guleyên tivengan bêne parastin, wan jî di wê rewşê de bi şev û roj kar dikirin û gez gez pêşve diçûn, ligel hindê jî şev ne diborî heke du sê kes neyêne hengaftin û ji navê neçin.

Hesen Xan û *Elyas Xelîfê Qeredaxlu* û *Mîr Fetahê Bînbaşî* û tivengçiyên Esfehanê sengerên xwe gehandin teniştê diwarê binê burca mezin li derveyî Kelê. *Qera Beg* wekîlê *Mîr Xanî* serokê pasevanên wê burcê bû.

Karîtên dirêj kirî di nîva rêzên diwaran de bo qayimkirina avahiya burcê, agir berdanê û hatin sotin. Diwar xilole bû û tîl da. Nîvroyekê karkeran firavîn dixwarin, layekê diwarê burcê herifi û desteyeke pasevan li gel ax û bergên burcê di nav çalên newalê de binax bûn. Piştî wê rûdanê, hewceyî pişodanê nebû û dema rawestanan nema, *Cenabê Wezîrî Hesen Xan* destûr da ku hêrişê bibet ser burcê.

Yekemîn kesê pê xwe daney di nav burcê de û tiveng beradaye *Qera Beg* paşî serî lê birî û anî, yek ji tivengçiyên Esfehanî bi navê *Mehemed* bû. Paşê diwanzdeh kesên di bi ser burcê ketin û heft heşt pasevan serjêkirin. Xwarziyê *Mîr Xanî* lawekî ciwan û şeng û şox bû, li binê burcê ew û yek leşkerî heftuşi hev bûn, leşkerî ser lê birî û bo *Cenabê Îtimad Eldewle* anî, *Cenabê Wezîrî* ew kar zor pê nexweş hat, gelek xwe ji leşkerî ture kir û

ew xelatê leşker li hêviyê bidetê neda. Gelek pasevanên burcê hatin kuştin û çend kesek jî di binê dar û berên avahiyê de fetisîn.

Ûw burca kospê serekî bo di rê de, lê eku hatî dagirkirin, karê leşkerî asan bû. Di maweyê du rojan de sengerên leşkerî gehiştin dor û berên Kelê û top lê hatin danan.

Topeke mezin beramber Kela serî di beramber Kela Xarê li sengerê *Pîrbodaqxanî* de hatin damezirandin û dest bi gulebaranê kirin û teng li cihnişînên Kelê şidandin.

Wan guherînên dumahiyê û çûna berê teraziya şerî bo mesleheta leşkerî, serên riya li ber *Mîr Xanî* berze kirin û Kurdên wî bê hîwa man, piştî gelek ji kes û karên wan hatin kuştin. Cihnişînên Kelê dest pê kirin ku ji Kelê bêne der. Çu ne diborîn heke deh kes û bîst kes ji Kurd û Celaliyan xwe derbas nekin û penayê bo sengerên leşkerî neynin. Li ser fermanê pîrozê Wezîrî, pena wan dihat qebûlkirinê û ew xelat dikirin û dilxweşî didanê. Karê Kelê lawaz bû û gehiştê radayeke ku bête girtinê.

Lê bo demek kurt girtina Kelê giro bû, piştî rudana mergê *Îtimad Eldewle*. Rojekê Wezîr ligel Mîran çûbû sengerê *Genc Elî Xanî* û ji wêrê çûn sera topxanê dan, piştî dinya tarî bû vegerane dîwanxanê û şevê hemiyê wek hercar, Cenabê Wezîrî bi rûgeşî û xweşî ligel hazîrên meclîsê qise dikirin, katê xewa Wezîr rabû, çû cihê nivistinê, paş mawekê kêr hat zanîn ku Cenabê Wezîrî bi xafletê emrê Xwedê bi cih anîye. Leşker bi carekê tuşî sersurman

û xem û bajarî bûn. Caba koçkirina Wezîrî gehandin *Xudanê Heybetê* û her wê şevê termê wî ji binê Kelê anîn xwarê, şuştin û kefen kirin û êvara roja duwê şandin Tewrêz.

Leşker her berdewam ma li ser girtina Kelê heta *Mehemed Begê Şamlu* serdarê nû yê wî leşkerî gehiştê berê şerî. Di mawek kurt de sengerên xwarê gehiştin binê dîwêr û ber burcê bi zebîrê top û kevîthavêje derz û tîk û şeq kirin. Ji layê serî azayên keleşkên hêriş kirin û du burc standin û ji layê sengarê *Pîrdoqaxanî* jî, Turkmenan pelemarî burcên xwarê dan, kurê mezinê *Mîr Xanî* fermandarê wî lay bû. Eku leşker bi ser wan burcan ketî, nobedarên burcan nikarin xwe li ber ragirin, dest jê berdan û revîyan kela serî. Hewş hat vekirinê û leşker xerîkî herifandina dîwarê di nava herdu kelan de bû. Pasevanên Bûzliq mirov şandin û eman û teslîm xwastin û Bûzliq bi dest ve berdan. Sê kelên qayim di wê hêrişê de hatin girtin. Kurdan dest bi revê kirin û heman berê xwe dane rex mala *Mîr Xan* ku ew jî wek kelê cihekî asê bû. Bê dudilî leşkerî xwe di Kelê quta, ji bilî mala *Mîr Xanî* tevaya kujyên kelê hatin dagirkirinê.

Mîr Xanî eku dîtî ji hemî layan ve hat dewirdanê, şerbesî ji Kurdên xwe xwest û mirov şandin cem *Mehemed Begê*, tika jê kir ku ew ligel leşkerê *Şamlu* bêne di nav Kelê de. Çinkî ji *Hesen Xanî* diûrsît ji ber kuşt û kuştara ligel yek û du kirin û tika jî kir, agehdarî wî û kurr, xêzan û dest û peywendiyên wî bît û bi selametî binêrite ber baregayê berz ê Şahî.

Xan Ebdalê Mukrî jî ligel mirovên jê nêzîk hate der û teslîm bû. Ew şandine cem *Elyas Xelîfê Qeredaxlu*, da mêvanê wî bît.

Paşan *Mehemed Begê* birayê *Tewîl* û *Celaliyên Kelê* derketin û wan jî xwe teslîm kirin.

Li dû daxwaza *Mîr Xanî*, *Mehemd Beg* hate nava *Kelê*. *Mîr Xan* û kurê xwe ê mezin û nêzîkî sed kesên di ji xêla *Bira-dost*, hemiyan tiveng bi dest û çekdar bi hemî rengên çekê şerî, ji malê hatin der û *Mehemd Beg* dîtîn, lê du sed *Kurdên Mîr Xanî* di *Kelê* de man.

Mehemd Beg, zîlam û nobedar dane ligel, da kes çu çivêliyan ligel neket. Hemî anîne mala xwe, xîvet û baregayek taybetî mezin bo heldan û şande dû *Hesen Xanî* û mîrên leşkerî, da bên û *Mîr Xanî* bibînin. Bo xweşî û dildana mêvanan, ew û birayên xwe ligel rûniştin û bi kerem mêvandarî lê kirin.

Eku *Hesen Xan* ji xîvetê nêzîk bû, şande dû *Mehemed Beg*, gazî kire derve. Nehatina *Hesen Xanî* bo nava xîvetê û derketina *Mehemed Beg*, dilê rûniştiyan bi şik kir. *Hesen Xanî* gote *Mehemed Beg* "Ez ji karê tu dikî hêbetî mame! çawan tu û birayên xwe di nava van serkêşan de we bi sakarî dirûnin? Van mirovan dest ji xwîna xwe şuştîye û ne cihê bawerê ne û nabe bi çu şiklan baweriyê pê binî, tigbîr ew e ku tu wan jêk belav bikî, bila *Mîr Xan* û kur û çend kes li cem te bimînin û yên di herçend kesan bo mîrekî bişîne, heta ferman digehit me, ka çi li wan bikin". Ew qise ya ber aqil bû, *Mehemed Begê* zi-

lamekî xwe şande cem *Mîr Xanî* û gotê: "Mana van hemî çekdaran li cihekî ne tiştê ber aqil e, lewam tu û kur û xizmên xwe li vir bêhnê vedin û yên di li ser *Mîran dê* belav bikin". *Mîr Xan* bi wê qisê razî bû, lê mirovên ligel pê qayil nebûn û gotinê: "Tu piştrast î ku *Mîr*, xoser newêrin te bikujin, biryara me jî ew bû, di xweşî û nexweşiyan de, em newêrin te bikujin, niha diyar e jiyanê du rojan bo te baştir e. Em jêkve nabin û eger bêne kuştinê jî, bila pêgve bimirin". Ev cabe şandine derê xîvetê.

Li dema wê hatin û çûnê, bi qeza û qeder û rûdanek li mala *Elyas Xalîfey* qewimî û hera û gengeşek peyda bû. Ew jî çima? Eku *Xan Ebdalê Mukrî* şandine cihê *Elyas Xalîfey*, ew li wê derê nebû. Zilamên wî xerîkî mêvandariyê û ergên pêwîst bûn û şerbet bo mêvanan dianîn. Xelîfe jî mirovekî sofî û sakar bû, eku hatî xîveta xwe û mêvan dîtîn, xêrhatineke gerim bi hemiyan kir, lê ji zilamên xwe ture bû û xeyidî, got: "Şewan vê germê we çek û bergê şerî ji ber biraderan nekiriye ve da bêhna xwe vedin?" Xizmetkarek bezî da bergê şerî ji mêvanan wergirt, lê *Xan Ebdalî* û hevalên wî hizrek di kirin, ya ji wan ve wan divêt bi vî karî wan ji çek bikin, yekser rabûn ser xwe, şûrên xwe kêşane der û *Elyas Xelîfe* dan ber şûran, çend kesek ji xizim û zilamên wî bêçek bûn, ew jî li nav xîvetê kuştin û birîndar kirin, encam *Elyas Xelîfe* û du xizmên wî hatin kuştin û çendek birîndar ketin. Leşker bi vê herayê hesa, bi *Xan Ebdalî* werhatin û parçe parçe kirin.

Wê rûdanê qîsa *Hesen Xanî* rast derxist, kesî vêca bawerî bi wan neanî. *Qizilbaşan* şûrên xwe kêşan û heç kesên Kurd an Celalî ketiye sînga wan kuştin. *Mîr Xanî* û zilamên xwe hêrîşa *Qizilbaşan* li derveyî xîvetê dîtîn, ew rabûn ser xwe, kun di xîvetê kirin û *Qizilbaş* dane ber tivingan. Ji derve gulebaran li xîvetê kirin, bîst û sê ji wan hatin kuştin û yên di bi şûrên rût derperîne derê û şer kirin û riya nemanê girtin. Leşkerê xeydî û kerb beboy dest bi kuştin û kuştarê kirin, ter û hişk pêgve sewitandin.

Paş tewawbûna wê karesatê û piştî lêkolîneke dûr û dirêj, diyar bû *Mîr Xanî* û hevalên xwe tegbîr kiribû, ku xelasbûna wan ji dest *Qizilbaşan* îmkan nîne, lewma ew ê kincên şer li xwe bikin, ew ê çek hilgirin û dê ji Kelê biçine der. Eku hemî *Mîr* û serleşker lê dicivîyan, dest dane şûran, heta leşkerê derê aqedar dibe û di hewara wan bê, ew tovê wan dê biqelînin. Eger bikaribin derkevin û xwe rizgar bikin, ew tiştê baş e û eger nikarin, besî wan tolên xwe pêşekî dê vekin û weke mêran dê bêne kuştin.

Diyar e her ew tifaqa bû, ya bûye hoyê - mêrçakiyê- *Xan Ebdalî* ligel *Elyas Xelîfey* kirî û berî hemiyan kuştî.

Piştî vê rûdanê, kurp biçûk û xêzanê *Mîr Xanî* yên meyîn birin ordîgehê û mal û samanê xelkê Kelê li ser leşkerî dabeş kirin.

ZIVISTAN

Xelîl BATTÎ

Berfa pêşî,
cihê xwe
li erda havînê,
li ser pelên payizê raxist.

Berfa spî,
mersîka bin lingê
bêmal, bêkes û pêxwasan.

Dibe ku,
serê xwe jî li ser deynin,
zembelîkê xwîna sor,
laşê giran û vala dagirin.

Ji feleka xwe,
ji êşa canê xwe,
xelas û azad bin.

Bi germa biharê re
bîn û gul bidin.

13. 10. 92

TENÊBÛNÊ KIRIM HEVAL

Kesek,
min haş nake

Heb,
fêde nake

Felekê rê girtiye
jê bernade

Tenêbûnê, ji xwe re kirim heval
çav bîr nabe

Ez têşim, tu têşî
ez dildar im, kî ê bêje?

HELBESTEK

*Pênûs dîl
Kaxiz bindest
Kana zîman
Dî mêjî de sîltan*

*Jî hêlîna derûnê
Daxwazek fîrî
Bû teyr
Li azmanê evînê
Baskên wî
Jî gotinan*

*Venîşt
Li meskenek spî
Qelemê rê negirt li wî
Kaxiz di ber xwe neda
Bask bû helbestek herwa
10. 8. 1993*

ÎNSAN Û MIRIN

*Însan
Dilopek jiyan
Niqutiye ji hebûnê
Li hembêza zeman*

*Mirin
Karbidestê dewran
Berhev dike dilop dilop
Bo vegerîne însan
Li nebûnê disan
27. 7. 1993*

Şîrîn BOZARSLAN

KEÇA KURD ZENGÊ



Cemşîd BENDER

Gava ez ji malê derketim ez mîna barûdê bûm. Kuxuka Zengê ya hetanî sibehê firsend nedabû min ku ez razê. Min bi herdu destan bi kindira di stûyê xwe de girtibû û ez dimeşiyam. Ev kuxuka zirav ku ji kûraniyê dihat, qet ne mumkun bû ku me ew bida rawestandin. Şeva çû ez bi ser diya wê de çûbûm û ji bo ku wê baş li zaroka me neniherîbû, min şîmaqek ji lêxistibû. Belkî ji rebena jînikê biheq bû.

- Karê Xwedê ye. Xweşî û nexweşî di destê wî de ye. Ma çi gunehê min heye?

wê bi girî gotibû.

Ji ber ku min êzing nekirî bû, wê ez sûcdar nekiribûm, ku keçik ji serma nexweş ketiye. Em ji derdên zarokan xelas nedibûn. Ev çend roj bûn ku kuxuka Zengêya biçûk dom dikir. Solên Meryemê jî tunebûn. Wê bi lingên xwe yên xwas pê li keviran dikir û dimeşiya, di nav avên mîna qeşê de digeriya. Ji ber vê yekê ez bi diya wan re xeyidibûm. Lê ma wê jînikê çi bikira? Di hundur de pênc zarok hebûn. Yek jî di zikê wê de bû. Dê li kîjanî ji wan benihêriya? Hemû nêr dixwazin, kincan dixwazin. Kinc tunebin jî, em kincên yên mezin li yên biçûk dikin û bi wî awayî îdare dikin.

Li ser rêzekevîrên li kêleka rê, ji dengê hesinê binê sola min pê ve deng nedihate bihîstûn. Yên ku ji nimêja sibê derketibûn, bi hev re dipeyivîn û diçûn. Dinya pir sar bû. Ez li ber Salepgerekî rawestiyam. Ji qedeha ku wî dagirt keldûman difûriya. Mîna ku wê kezeba min germ bibe, min ew qurt bi qurt vexwar... Simîta germ di nava destên min de herifî. Ev xwarina pêşî ya birçîbûna min a ku wê hetanî êvarî bidomiya bû. Diviyabû min hinek pere kar bikira û ji bo malê çar nan bikiriya. Ev dihat wê maneyê, ku diviyabû min heştêd lîra kar bikira. Lê kar kirin! Min dixwest ku ez li berevajiyê wî jî bifikirim. Ji bilî wê di hesêb de dermanê ku min ê ji Zengê re bikiriya jî hebû. diya wê berî bi du rojan ji nexweşxanê reçeteyek standibû. Perên min tunebûn. Ji ber wê yekê min ew hiştibû roja sisiyan. Yanî min ew hiştibû îro. Ez niha li bendî qismetê xwe yê sibehê bûm. Belkî şansê min vebûya. Wê Zengê ji nexweşiya xwe rehet bibe, em ê jî ji xwe re hetanî sibehê

bi rehtî razên. Doktorê nexweşxana zarokan " Gava ku ew dikuxe, ew mîna dîkan bang dide" gotiye. Gava ku Zengê nikanîbû ji ber kuxuka xwe bi hêsanî bêhna xwe bistenda, wê dengên ecêb derdixist. Wê çaxê doktor gotibû ev bronşît e û derman nivîsandibû. Ji ber ku perên min tunebûn, ez neçûm dermanxanê û min li buhayê dermên jî nepirsî. Gava dermanfiroş destê xwe biavêje dolaba camînî, divê mirov tavilê peran bihejmêre destên wî. Kî dizane bê ew ê çend hezar lîra bixwaze.

Erebeyên texûnî diçûne mazatê. Erebevanan lingên xwe li bin çongên xwe tewandibûn û li ser kîsên kayê rûniştibûn. Hespên jar bi hêsanî ew erebeyên vala li dû xwe dikişandin. Yên ku sibehan zû radibûn em bûn. Di vê saetê de, di van kuçeyên teng de, ji yên ku li dû bidestxistina nanê xwe bûn pê ve kes tune bûn. Yên ku nanê xwe bi hêsanî bi dest dixistin, hê ji wan re du saet mabûn ku ew rabûna ser xwe. Em jî dikarîbûn li malên xwe li bendî germbûna mazatê rawestiyana. Lê nedibû. Hêzeke nexuyayî em davêtin der. Gava em gihîştin mazatê Arif li ber dîwarekî rûniştibû cigare dipêça. "Min do êvarî li qehwê bi kaxezan leyist. Ez miflis bûm" got. Bêhna wî teng bû. "Lê me carekê leyist. Careke din tobe be" digot. Lê belê wî ê dîsan êvarî rîya qehwê bigirta. Ji çirka ku ew ji girtûgehê hatibû berdan ew neçûbû gundê xwe. Di pirseke namûsê de, jina wî gihîştibû birayê yê ku wî ew kuştibû. "Ez ê bi çi rûyî herim wî gundî? Ma ez yekî din jî bikujim? Xwedê neke" gava me nû hevdu nas kiribû wî ji min re gotibû. Ev e, ew jî nikarîbû biçûya gundê xwe. Kî dizane bê hê ew ê çiqasî din li vir şerpeze bibe. Min jê re

gotibû here Almanyayê. "Almanya sûcdaran nagire" wî bersiva min dabû. Miletê Alman yekî ji min çêtir nabîne. Tu vê yekê wekî navê xwe bizanibî." Wî qutîya xwe ya tûtinê dirêjî min kir. "mîna dolmeyekê dagire, venekişe" got.

Me cigarên xwe pêxistin.

-Te qet sûc kiriye? wî ji min pirsî.

-Na, min bersiva wî da.

- Te sûc nekiriye çi ye, piştî ku karê te nakeve rê.

- Lê herkesê ku sûcan dike nakeve girtûgehê, min gotê. Min di xortaniya xwe de mirîşk dizîne, haya kesî negihîştê.

- Dizî ne tiştêkî baş e, Arif got. Ne karê mêran e! Dibe ku bi a wî mêrxasî ew bû, ku min kêrek li mirovekî bixista. Di dema ku min cigara wî dikişand, min nexwest ku ez erza wî bişikînim. Di eslê xwe de Arif peyayekî baş bû.

-Em dîsan ji rewşa xwe şikir bikin. Yên rewşa wan ji rewşa me xerabtir in jî hene, min gotê û min mijara peyvê guhert.

Arif zikê xwe ber bi pêş ve derxistibû, ew mîna generalekî di nava mirovên ku selik û qufikên xwe bi cih dikirin de dimeşiya. Ew bêxem dixuya. Lê ne xuyabû bê wî xema çi nedikişand. Erebevanên ku erebeyên xwe kişandibûn kêleka rê, kîsên êm kişandibûn serê hespên xwe. Em hemû li bendî kar bûn. Hespên li pişt ereban lingên xwe ji hev kiribûn û dimîstin. Arif bi "Ev mirovên ku tu dibînî! dest bi peyvê kir. "Hemû sibehê zû rabûne, em jî. Pêwîst e em peran kar bikin", min bersiva wî da. Nexweşiya Zengê hatibû bîra min. Rebenê mîna dîkan dikir. Rast bû. Doktor rast têgihîştibû, ku nexweşiya wê bronşît bû.

Ew ê vê êvarê nan û derman biçûya malê. Ji sedî sed diviyabû biçûya. Ez mecbûr bûm. Bi celebekî din çenedibû. Piştî ku ez û Arif li mazatê geriyan, em heya bi garajê çûn. Garaj tijî otobus û kamyon bû.

Salepfiroş û simîtfiroş li vê derê ji hebûn. Kamyonên bar berepaş diçûn, muawînan bi qêrîn ji şofêrên xwe re digotin: "Çep here, rast here". Me çavên xwe li xwendevanên ku bi nivînên xwe li ber dîwêr rawestiyayî û bajarvaniyên ku bi baholên xwe yên textûnî û mezin, ku wê biçûna hotêlê, digerlandin. Lê belê dem gelekî zû bû. Û ji bo mînubusa ku ji bajêr bihata jî diviyabû em du saetan rawestiyana.

Arif xweşbîn bû. Ger ku wî heqê xanê û heqê nanê rojê derxista, ew li tiştêkî din nedifikirî. Ger te hemû dinya bidaya wî wî ê bigota ez naxwazim. Lê piştî ku ew bi ser lîska kaxezan vebûbû rewş hatibû guhertin. Wî bi dîqet li der û dora xwe dinihêrî, li yekî ku bangî barkêşan bikira digeriya. Her ku diçû em herdu bê sebir dibûn. Em ber bi mazata karkeran ve meşiyên. Ji bo dîtina kar erebeyên textûnî jî vir de û wê de digeriyan. Erebevanên ku li ser kîsên kayê çarmêrkî vedabûn, rê girtibûn. Kamyonan bi zorê rê ji xwe re vedikirin û ber bi pêş ve diajotin. Dengê çêrên şofêran dihate bihîstin. Bîsîklêtên sêteker li ber dikanan bar datanîn. Barkêşên van bîsîklêtan dijminên me yên sereke bûn. Kara wan ji ya me bêtir bû. Her ku dibû derengê rojê, çih li barkêşên bi weris teng dibû.

Arif "Em nikarin bi van re qayişê bikişînin, ya baş ew e ku em jî peran bidin hev û ji xwe re bîsîkletekê bikin"

got. Lê belê wî bi xwe jî dizanîbû ku kirîna bîsîklêteke wilo bêmkan bû. Di vê navê de yekî ji milê rastê "Barkêş" bang kir. Em herdu bi hev re li wî dengî zîvirîn. Bi holbûnekê re me destê xwe avête sindoqa wî. Ev bi dozîn bûbû. Sindoq mîna keweke ku nuh hatibû girtin di nava destên me de bû. Min û Arif me li çavên hevdu nihêrî. Wî li min û min jî li wî mêze kir. Lê destên me li ser sindoqê bûn. Kê ji me destê xwe ji sindoqê berda, ew ê sindoq bibûya ya yê din. Min carekê kir ku ez destê xwe jê berdim, lê Zengê hate bîra min. Min dîsan xwest ku ez bi sindoqê bigirim. Lê ez dereng mabûm. Arif "Vê biavêje piştê min" got. Min wek wî kir. Arif di bin wî barê ku bi kêmanî sed kîlo bû, bi sorahiya xwîna ku hilperikî mêjiyê xwe dilşa bû. Ew bi mirovê xwediyê sindoqê re meşiya û çûn. Ez bi tenê mabûm. Her kesî baz didan qismet û nesîbên xwe. Piştî ku min kindira di serê xwe de pîva, dîsa ez ketim nava qerebaxê. Erebevanê xwediyê erebeyên vala her li kar digeriyan. Em hemû li navê bûn. Tiştê ku nedibû çi bû? Ez nizanîm bê ez çiqasî geriyam. Zikê min dîsan vîkîvala bû. Ez baş birçî bûbûm. Lê min dikarîbû li ber birçîbûnê debar bikira. Her ku ez li Zengê difikirîm, ez li hemberî birçîbûnê bi hêztir dibûm. Ez niha li ber lampeyeke trafikê ya sor pêketibû sekinîbûm. Min dît ku şofêrê kamyoneke kevin destê xwe di pencerê re ji min re li ba dike. "Xwe biavêje dawiyê" got, "Em ê malê bar bikin, zû, berî ku lampa kesk pêkeve".

Çûkê bêhtengiyê tavilê ji dilê min firiyabû. Min xwe hema bi carekê ve avête erebeya kamyonê. Em di çarşiyê re derbas bûn û çûn. Em ketin nava mehelan. Em li

ber maleke bi tenê, ya li pişt bexçeyekî zarokan sekinîn. Şofêr xwe ji kamyonê avête xwarê. Li ba wî yekî ziwa, jar û bêçakê hebû. Ew jî daket. Demekê li ber derî sekinîn. Paşê em hemû bi hev re derbasî hundir bûn. Her çar aliyên me tijî firax bûn. Pêşî min û wî peyayê jar me xaliçeyên li erdê dane hev. Wî du heb ji van avête kamyonê. "Hevalo, çênabe ku mirov xaliyan deyne binî. Em pêşî mobîlyan biavêjinê. Em ê van bi ser wan da kin" min gotê. "De here lo" wî got. Ez çûm. Tekneya kamyonê di tozê de mabû. Min xalî li quncikekê bi cih kir. Min ê pişt sarincan bispirta van xaliyan. Paşê wî peyayê jar bi a min kir, me pêşî sarinc bi cih kirin. Şofêr dikete hin odeyan û derdiket, wî qet alîkariya me nedikir. Paşê wî ê karê xwe xelas kiribe loma ew hate ba me. Wî bi hemû hêza xwe hewl da ku alîkariya me bike. Min dizanîbû ku ez ê di vî karê malbarkirinê de tîbabeke pere bistînim. Êdî Zengê xelas bûbû. Gava min dolaba bi cam dibir ez li vê difikirîm. Hê ew dolaba camînî li pişt min bû, min got gelo ew rêçeteya ku doktor daye bi min re ye an na. Xwezî min negotaya. Ger ew dolaba camînî ne li pişt min bûya min dizanîbû bê min ê çi bikira. Bi namûs min dizanîbû. Me ewqas sal ji bo welat û gel eskerî kiribû. Ma me çi kiribû? Dolaba camînî li pişt min bû. Min kindir di ser re avêtibû û ew baş girê dabû. Heta wê çaxê sêlikeke gramafonê jî neşikest. Min carekê dît ku ji aliyê bexçeyê zarokan du-sê kes ber bi me ve baz didin. Şofêr û wî peyayê jar hema xwe avêtin kamyonê û pê li gazê kirin. Ez têngihîştim bê çi dibû. "Hela rawestin hê dolab li pişt min e. Ma hûn ê min bihêlin û bi ku de herin?

Deriyê malê vekirî ma." Lê kamyon rabû û ji wir bi dûr ket.

Ji ber ku dawîya kamyonê vekirî bû, dolaba têlînî gindirî erdê. Ew gindirî, lê wan kesên ku ji aliyê bexçeyê zarokan ve baz didan, dora min girtin. Di bin bar de rûyê wan nedihate ber çavên min. Min kulma pêşî di bin dolabê de xwar. Dolab bi milê çepê de şemitî. Ez jî pê re ketim. Dengê şikandina caman hate min. Ez bi ser kêlekê de ketibûm. Pekîneke bi hêz li sînga min ya vekirî ket. Qolinceke bêtarîf hatibû zikê min yê vala. Hê jî min fêhm nekiribû bê ew ji bo çi li min didin. Ji derbeyên ku min dixwarin min firsenda peyvê jî nedidît. Ji der û dorê bi koman mirovan ber bi me ve baz didan.

Dengê qêrîn û qerebalixê zêdetir dibû. Carekê min kir ez rabim ser xwe, lê pehînek li nava pozê min ket. Ji ber ku min dizanîbû ku her ku ez tevbilivim ez ê lêdanê bixwim, ez demekê qet tevnêliyim. Yên ku hatibûn carina di deriyê vekirî re diketin hundir, lê dîsan berepaş vedigeriyan û dihatin ba min. Kindira ku sist bûbû min berda. Dema rabûnê bû. Yekî bi milê min, yekî jî bi stûkura min girt. Min niha der û dora xwe hê çêtir didît. "Dîqet bikin bila ew nereve!". Ez raste rast di nava xerabiyekê de bûm. Du mirovên mêrxas yên ku dixwestin qanûnên civakê yên ku dihatê zanîn biparêzin, stûkura min bernedidan. Hinan ji wan tif dikirin rûyê min. Demekê min xwest ez bipeyivim. Yê ku hêrs bûbû kulmek di nava pişt min de lêxsit. Ez dîsan ketim xwarê. Kaxezeke spî ji bêrîka min ketibû. Ev rêçeteya Zengê bû. Zengê hetanî sibe-han dikuxuya. Doktor gotibû bronşît e. Min xwest ez destê xwe dirêjî kaxezê

bikim. Peyayê ku bi stûkura min girtibû ji min re bû asteng. Wan ez dehf dam û xwestin ku min bibin cihekî nenas. Her ku em dimeşyan, qerebalixa li dora me zêdetir dibû. Komê zarokan xwe di nava qerebalixê re rakir û xwestin bi tirs min bibînin. Em li kuçeyekê zivîrîn. Em di kuçeyeke teng re derbas bûn û ketin ser rîyeke fireh. Ev rê tijî erebeyên textûnî, fayton û kamyon bû. Mirovên ku ji dikanan tişt dikirîn, derdiketin ber devê dikanan û li me dinihêrîn. Her ku em diçûn yên ku dihatin temaşekirina me zêdetir dibûn. Min komê mirov li dû xwe dikişand. Xwîna ku ji pozê min diherikî, di ser sînga min re diherikî jêr. Em dimeşyan. Zarokên biçûk û şêrîn, şagirtên dibistanan bi tirs li rûyê min dinihêrîn. Peyayê ku bi milê min girtibû "Min ew girt" bi qêrîn ji der û dorê re digot û xwe pê qure dikir. Ferqa min ji heywanekî wehşî ku li daristanê hatibû girtin qet tunebû. Min demekê xwest ku ez li ber xwe bidim. "Bimeşe, bimeşe" gotin û li paş stûyê min xistin. Ez êdî di nava destên mirovên dilpak de bûm. Ez êdî ne aydê xwe bûm. Ez ewqasî ji xwe bi dûr ketibûm, ku niha di bêrîka min de pere jî hebûya ez nikaribûm bi çar nanan û bi qutiyek derman vegeriya malê. Wê zarok û diya xwe li bendî min bimana. Min nikanibû bi awayekî haya wan jî bigihandayê. Danûstandinên me dihatin birîn. Ew ê di nava civatê de gêr bibûna û biçûna. Êdî wê kuxuka Zengê ne aydê min bûya. Wê jina min jî êdî ne ya min bûya. Ji aliyekî ve ez xelas bûbûm. Her ku diçû van tiştên han di mêjiyê min de cih digirtin. Berpeyîya vê yekê ken bû. Min pêşî li zarokên biçûk û paşê jî li pîrejinana nihêrî

û ez keniyam. Ez paşê bi şûşên şîr û bi pakêtên cigaran keniyam. Min serê xwe yê bi xwîn zivirand û ez bi peyayê ku bi milê min girtibû keniyam. "Kûçikê bê ar hê jî dikene" gotin û bi gurmistan bi serê min ketin. Ji ber wê lêdana wan ez bêhiş ketim. Gava ez dîsan hatim ser hişê xwe min dît ku çend kesan bi lingên min girtin û min bi dû xwe de dikişkişîne. Serê min bi erdê ve dikişiya. Em hê jî negihîştibûn wî cihê ku wan dixwestin min bibinê. Êdî min ew qerebalixa ku rê dagirtibû nedidît. Çakêtê min jî ji min şeqitî bû û di nava lingan de çûbû. Ya girîng di navê de mirovatiya min hebû. Ew jî di destên nenasan de bû û bi dû xwe de dikişkişandin. Gava serê min li kevîran diket, di dilê min de xwestekeke xewê ya bêsînor hişyar dibû. Min jî wilo kir. Ez bi dû stêrkên ku li ber çavên min difiriyên ketim. Bi lingên xwe yên dirêj kirî, ez ketim xeweke kûr.

Wergera ji tirkî: F. Cewerî

Diyariya NEWROZÊ

hevalekî xwe bike
aboneyê NÛDEM'ê!

Her abonetiyeke
NÛDEM'ê, ji avakirina
edebiyata kurdî re
alîkariyek e.

Tu jî vê alîkariyê bike!

STRANA STENBOLÊ

*Li Stenbolê
li Boğaziçiyê
ez Orhan Veliyekî feqîr,
kurê Welî,
di nav keseran de
li Rumeli Hisarê rûniştîme,
stranekê dibêjim,
Kevirên mermer yên Stenbolê
li serê min datînin
Qeqlebazên delal,
Ji çavên min hêstirên bixem
dirjine xwarê.
Delala min
di ruyê te de ye
ev halê min,
Nawenda Stenbolê sinema,
xêzanî û yeksaniya min
mebêjin dayika min,
xelk kêf dikin, şa dibin
çi ji min re,
evîna min
di stûyê te de ye obalê min,
Li Stenbolê,
li Boğaziçiyê me
ez Orhanê feqîr
kurê Welî me,
di nav kulên bê eman de mame...*

GUHDARIYA STENBOLÊ DIKIM

*Guhdariya Stenbolê dikim
bi çavên girtî
ewil bayekî sivik tê
hêdî hêdî
dihejin pelên daran,
ji dûr*

ji gelek dûr
 dengê zengilên avkêşan tê
 bê rawestan
 guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî,
 Guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî
 çivîk derbas dibin,
 ref bi ref, awaz bi awaz, paşê
 tor tene kêşan
 di tengasiya behrê de
 Piyê jinekê digêje avê,
 guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî.
 Guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî,
 Bayê hênîk li sûka sergirtî,
 Mehmûd Paşa diçilwire,
 hemû eywan
 bi kevok in,
 dengê çakûçan tê ji kêstîxanan,
 bayê biharê
 û bêhna delal ya xwêdanan.
 Guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî,
 di serî de
 li şengên borî
 sermestiyek (nedîtî)
 bi Qayikxanên tarî ve,
 û koçkekî xalî,
 di nav dengê bayê lodosên aram de,
 guhdariya Stenbolê dikim
 bi çavên girtî.

Orhan Velî KANIK

Werger: Latîf Özdemir

XEM Û AZARÊN MIROVÎ DI TABLOYÊN FEHMÎ BALAYÎ DE



Xelîl DUHOKÎ

Pîştî bi sedan salên zilm û stema dij-
minan, Kurdistanê başûr gihîşt azadî û riz-
gariyê. Berî hingê hemû riyên pêşketinê
girtî bûn, lê niha rê vebûne, pîspor,
nivîskar û hunermendên kurd dikarin xiz-
meteke mezin ji bo miletê xwe bikin. Ev
yeka han bûye sedemê vebûna çendîn
yekîtiyên û komeleyên hunerî û edebî. Bi
gihîştî niha hunermendên kurd dikarin
pêşangeha vekiya û tabloyên xwe
bigihînin piraniya xelkê.

Bizava hunerî li Kurdistanê başûr ber bi
pêş de çûye û bi dehan hunermendên jêhatî

peyda bûne.

Min di seredana xwe ya Kurdistanê
başûr de, çendîn hunermendên kurd dîtîn
ku yek ji wan Fehmî Balayî bû. Fehmî
Balayî di sala 1963'an de, li devera
Berwarîbala ji dayik bûye. Li sala 1985'an
Peymangeha hunerên ciwan li Mûsilê bi
dawî aniye. Ew beşdarî çendîn pêşangehên
hunerî bûye.

Tabloyên wî xem û derdên mirovî
hembêz dikin. Di nav wêne û rengên
tabloyên wî de, mirov karesatên mezin
dibîne. Azarên zindaniya dikişîne û
rondikên germ ji bo şehîdan dibarîne. Bi
rastî huner li cem wî, zimanê milet e. Di
riya huner de milet bi pêş dikevin û di ba-
jarvaniyê de digihên pileyên bilind.

Min bi ferz zanî hevpeyvînekê digel
bikim. Werin em bi hev re xwe berdin
nava cîhana tabloyên wî.

Xelî Duhokî: *Kengî û ji bo çi te dest
bi hunerê şewekarî (teşkîlî) kiriye?*

Fehmî Balayî: Min di destpêka
xwendina xwe de dest bi xemilandina
rûpelan kir. Ji ber rindiya siroştê Kurdis-
tanê, şax û daxên bilind, daristan û geliyên
kûr, rûbar û çemên mezin, kanî û bexçên
xweş. Belê; ji ber vê bihiştê şîrîn, min
xwe berda nav cîhana hunerî.

*- Tu bi çi rêbaz û kîjan hunermendî
daxbar bûyî?*

- Her rêbazeke hunerî, bûcûnên xwe yên
taybetî hene. Lê ji ber ku rêbaza realîte
bêtir nêzikî miletê min e, ez li pey wî
rêbazî xebata xwe didomînim û tabloyên
xwe dixemilînim. Hunermend Rênwar ji

layê reng ve, Van Gogh ji layê derbirînê ve, Salvador Dalî ji layê surealî ve û Picasso ji layê hunerê hevçerx û modern ve kar li ser min kirine.

- *Tu hunera kurdî ya îro çawan dibînî?*

- Hunerê Iraqê bi giştî û ya kurdan bi taybetî, dengê wan li cîhana hunerî heye. Cewad Selîm, Fayiq Hesen û Hafîz El dûrî, hunerê iraqî dane naskirin û Mehemmed Arîf, Îsmail Xeyat û Dara Mehemed Seîd jî hunerê kurdî gihandine pileyên bilind.

- *Hunera kurdî niha di çi pileyê de ye?*

- Bi hêza hunermendên genc û xwedan şîyan, çendîn Peymangehên Hunerên Cîwan peyda bûne, hunerê kurdî li Kurdistanê başûr ber bi pêş ve çûye.

- *Di riya hunermendiyê de çi girîftarî hene?*

- Girîftarî bi tenê, mijûlbûna hunermendî bi layên siyasî ve. Îro ew dibe dîl û hîsîrê siyasî. Bi bawerîya min ev kêmasîyeke mezin e. Divê hunermend rastgo be û helwêsta wî beramberî tevayîya rûdana hebe. Ew jî bo cîhanê û mirovatîyê xebatê bike.

- *Baş e, helwêst çi ye li ba te?*

- Helwêst jî bo hunermendiyê pîroztiyê peyv e. Picasso dibêje: "Hunermendê ku jî dorhêla mîletê xwe bi dîr bikeve, ez wî mîna hunermend nabînim." Çinku ciyawazî di navbera hunermendî û mirovekî



Hunermendê kurd Fehmî Balayî

din de heye. Divê bûcûn û rastîgotin, bersîngirtin û berevanî beramber her kiryarekê hebe. Lewra çend kesên wek: Mazlûm Doğan, Wedat Aydın, Zekiya, Musa Anter, Şakir Fetaî û Dilşad Merîwanî, gorî helwêsta xwe bûn. Niha dîrokê rûpelên zêrîn jî bo wan xemilandine û ew di dîlê mîlet de dijîn.

- *Pirsa dawî; tu niha çi karî dikî û tu dixwazî ji xwendevanan re çi bibêjî?*

- Ez niha li Peymangeha Duhokê mamoste me û ez endamê desteka bilind ya hunermendên Yekgirtî yê Kurdistanê me. Hêviya min ew e, hunermendên kurd, bi zîmanê xwe yê hunerî, doza mîletê xwe ber bi pêş ve bibin.

Du tabloyên Fehmî Balayî



Helebçe û gaziya zarokan



Pêşmergeyekî westiyayî

HILKIŞÎNA BAJAREKÎ

*Di şeva termên komerbûyî/ ew bi xwe tarîtir e
stêrkên çavine vemirtî, diçûrisin.*

*Bager mijankên xwe dişkine di
bejnbilindiya qurman de.*

*Û giyanên rencbûyî, yên revyayî
xwe bi tirs davêjin ber sibera zeytûnê.*

*Ji şeva grîkanî de, tu carî kabûsên ji vê babetê
şiyar nebûne:*

*Gava ku hîma Amadana
qîriya li ser deh hezar Roksana
destên serxweş û serkeftî, ew revandine.*

Serkeftî ne... Ey nijada zelal!

*Bi zendên şankirî bi niviştan, dibin
palpişt bo esmanekî ji cama hûrkirî.*

*Di şevê de digere/ji bilî pîrebokên lukumî,
bêdengiye... ji singoyên xwîngirtî*

Bi rewan, li rûyê kuştîyên xwe temaşe dike.

*Ji bo zarokên destjêkirî
qantirine tozîni westyayî, mane.*

*Tenê... qantirine hevalbend
di cîhaneke dijmin de.*

Di goristana gerdûn de

li ser banê wê yê rût,

li hêviya şitlên pîpnokê ye

li hêviya xwedanên mirî ye...

Buhara kulîlkên dadayî.

Germa te belekbûnê,

*çavên bendemanê li stêrka Anahûta
ya vemirî dinihêrin.*

Perçebûyî ne, bendewarên

gemîya Awto/an

Rokek bi bask in

ta ku çemê hêşiran derbas ke.

Giyane sergerdan

her û her

bende

giyanên xwe ne.

1988

Dilower MÊQERÎ /Werger: E. HUSEYÎ

XALID AXAYÊ ZÊBARÎ (1827-1828)



Zeynelabidîn ZINAR

Erê, hin suxreyên nijadî yên di demepaşê de ku hatine kirin, ew herwekî bûbin malê çineke kifş û piraniya xelkî jî her wisan dizane. Niha eger yek bibêje: Zimanê kurdî di warê nivîsê de tenê ji feqî, mele û şêxan dest pê kiriye. Tenê wan nivîsandinê bo xwe kiribû pîşeya sereke û ev berhemên klasîk ên heyî, hemû bi ked û xwîdana wan derketine holê." Bêguman wê piraniya Kurdan jê bawer bikin. Sedem jî ev e; lewra ev heftê sal in ku gelê me bi darê zorê ji ziman, çand û edebiyata xwe hatiye dûrxistin û ew ji dîroka wî bêageh hiştine.

Lê belê hingê mirov bi rastiyan

têdigehe, eger zana û serwestê bi dîroka xwe be, hem jî eger çeknas, jîr û zîrek be, serbest bilive û azad bijî, çewa ku roj hebûnek e ku hîç nayê înkarkirin, herwisan rastî jî têne dîtîn û tiştên heyî wenda nabin.

Ji berê û pêş ve ye, nav û dengê axeyan li Kurdistanê bi nepakî belav bûye; bi xwînxwarî û xwînmijîya li xelkê hatine naskirin. Erê herçiqasî hin axe hebûn ku nepakiya xwe nişan dane û heta hinek ji wan ketine nava xiyaneteke bêbexşîn jî, lê hinek jî pir kêrhatî bûne û bi welat-parêziyeke germ şixulîne; di warê edebiyat û çanda kurdî de jî suxrene payedar kirine û ji gelê xwe re berhem afirandine, pirtûk nivîsîne û berpirsariya xwe ya dîrokî bi cih anîne.

Eger yek bipirse; axa û edebiyat? Bersîv pir hêsan e û li diyarî çavan e. Fermo, bînerin! Ha yek ji wan axeyên wisa ku navûdengê xwe li cîhana rengîn belav kirine, şan û şerefa xwe xistine binê baskên Dîroka Kurdistanê jî, Xalid Axayê menşûr ê bi eşîra xwe Zîbarê ye.

Xalid Axa di 1827'an de li Gundê Şîniyê ji diya xwe re çêbûye û di 1828'an de jî çûye dîlovaniya xwe. Gundê wî li nav eşîra Zîbarê, li Deşt Ziyê cih girtiye û li Rojhelata Amêdiyê dimîne. Xalid, kurê Şêx Hiseyn e. Bapîrê wî Şêx Xalid kurê Şêx Hiseynê Zîbarî ye.

Erê, herçiqasî ez zêde bi serpêhatiya Xêlid ne agahdar im û li serê zêdetir nivîs bi çavên min neketine jî, lê li gorî gotina mamosteyê gorbihîşt Sadiq Behaedînê Amêdî ku di pirtûka xwe ya bi navê "Hozanvanê Kurd", rûpel: 263-271 de aniye zimên; Xalid Axa serê pêşî ji bo xwendinê çûye Paytexta Mîrgeha Botan û li bajarê Cizîra rengîn xwendîye. Herweha wî li hin xwendegehên herêmê yên din jî xwendîye û li gelek şûnewarên şên ên li çiyayên Bota geriyaye. Piştî ew şûnde

vereriyaye geza Amêdiyê û li jiyana xwe domandiye, ta ku çavên xwe ji dinya ruhnik girtine.

Îrê, Xalid Axayê Zîbarî çi kes bû, şexsiyeteke çilo wergirtibû û di nava gelê xwe de giranbihatiya wî gihabû kîjan deverê. Îcar heke destêra xwendevanên Nûdem`ê hebe, em ê guhên xwe bidin mamoste Sadiq Behaeddîn û bila ew ji me re, bi kurdiya xwe ya bahdînkî bipeyîve:

- Di berê da min wesa hizr dikir ku guman tê de nîne, Beyta Sîsebanê ji şwînewarêt hozanvanê klasîkî Xalid Axayê Zêbarî ye. Ji ber ku min bi navê wî, ji hijmareka extiyar û torzanêt cihê Behdînan gu lê bibû. Ji bilî hindê jî gelek kesa ji extiyarêt Behdîna, ji Fîşabwirê bigir heta ku digehiye Mêrgesorê, ji bere û bi awaz di xirvebiwînan da têtê gotin.

Navê Xalid Axayî di dwîmahiyê da ye, wekî rêz û rewîştê berê li ser diçûn. Belê di xirvebiwîna roja 18. 9. 1971 ya Êketiya Nivîsevanêt Kurd bo belavkirina gotarekê li ser torê kurmançî terxankirî û ji min xastî ez baxivim. Gava min navê Xalid Axayî digel hozanvanêt dî yê klasîkî li devera Behdîna înayî û min gotî ji berhemêt wî, çend helbestin û Beyta Sîsebanê ye. Birader Dr. Maruf Xeznedarî, bawerî bi hindê neîna û got: "Hêj ruhnebûye, ka ya kê ye." Eger çî di cih da min bersîva wî da, got: "Bêguman ya wî ye, bi navê wî ye, kes ji xwudanê malê bixwo şelrezatir nîne, Beyt li nik min e."

Belê birastî, gotina wî ne ku guman li nik peyda kir û bes, belê wekî navtêdanê (handanê) bû, bo min ku ez pêtir li dwî biçim, da ku paştir pişrastir bibim, ku Beyta Sîsebanê ya Xalid Axayê Zîbarî ye. Paşî hingê çavê min bi gotarê birader Dr. Ezedîn Mistefayî kevtî, yê ku bi navê "Feqê Teyran, jiyan û berhemî" di Kovara Kulêja Edebiyatî Zanistgayî Bxdad a berperî 14-24, bi zimanê Kurdî belavkirî,

ku li berperê 26`ê, li rêza nehê nivîsiye: Dastanî "Newalî Sîseban"yişî be berhemî Feqî Teyran nasraw e, belam Rûdênko em nasiye be rast nazanê, li vêre dwîmahiyê pê diînit, bê ku piştevaniya çu ji her du bîrûra biket.

Vê çavpêkevtinê ez rîjdtir lê kirim, ku bizava xwo dujwartir lê bikem da ku derhê biçim, bişêm rastiye li ber çavêt xwîndevanêt nûserî Kurd û dilsojê torê kurdî danim (1).

Vê Havîna çûyî (1972)yê Ekaîmîya Kurdî (Kûrî Zanyarî Kurdî) ez hinartime Parêzgeha Dihokê ku, ser perîştîya xirvekirina destnivîs û nivîsîna zaravan û rîkurdkirina folklorî kurdî bikem. Min bi derfet zanî, ez li dwî Beyta Sîsebanê biçem. Nemaze Xalid Axayê Zêbarî xelkê wêre ye, ya ku bi min ve hatî dê li ber çavêt xwîndevanêt berkevtî danim.

Xalid Axayê Zêbarî ji binemala axan e, ku bi navê Axazade di berê da bi nav dikiirin. Ji Gundê Şîniyê li cihê Zêbarê li Rojhelata Amêdiyê li Deştê Ziyê ye. Her wekî têtê gotin li ser çax û demê Mela Mensûrê Gêrgaşî û Bateyî yan paşî wan bi heyamekî, bi çend sala jiye, ku li dwîmahiya Sedê Panzdê ji bûyîna Isayî û Sedê Şanzdê, ku di hinde berperêt nivîştê feqan da wekî Enwarê dikevîne Namexana Mela Yehya Mizwyrî (Minzûrî-nm) li Amêdiyê, li navbera (905-974)ê Mişextê jiye.

Ev Hozana jêrî jî ji destnivîsarekê hatiye veguhaztîn ya ku gazinda ji felekê diket ya wî ye. Ji ber ku bi navê wî yê hozanî ye, her wekî navdar e li devera Behdîna bi navê Xalid Axayê Zêbarî Laxerî * ye. Hozan eve ye:

Felek naket digel min yarê qet
Xilas nabim ji ah û jarê qet

Xemîra min ji muhra muhrê Xan e

Neşê m êdî bikem înkariyê qet

Dilê sûzek ji işqê tê nebitin
Bi kêr nahêt biket serdayê qet

Qewî nabim ji mehrûyan te'ceeb
Neken perwarê bê îqrarê qet

Di işqê lewme nîne û nabit munker
Nehin ageh ji mewta cariyê qet

Tewafa gerdenê carek mi kiribû
Jibîr nakem ewê yekcarê qet

Çi sir bîtin ji werdan ger dinasî
Nebûn aciz ji dama xariyê qet

Bi heft avan bişoyî Laxerî xwo
Meger de'wa xwo tu li Zêbarî qet (2)

Beyta Sîsebanê, ne ku "Newalî Sîsebanî" her wekî Dr. Resûlî, navê wê ji Nihala Sîsebanê kiriye "Newal" her çendî min jê piyar kirî, zêdebar navsal ve çûyî û extiyarêt jiyê wan ji şêst salî pêtir, bê rawestan da bêjît ya Xalid Axayê Zêbarî, Laxerî ye di hemî destnivîs û keşkolana da navê wî li malikê dwîmahiyê da heye.

Pismamê min Mihsin Salihî, Beyta Sîsebanê li ber destnivîsarekê nivîsî, paşî guh li extiyarekî girtî û li roja 5-4-1970`ê bo min hinart. Û bi van malikê jêrî dest pê diket:

Sibhan ji Şahê Kerîm
Me bûdê pirkemal e (3)
Pirfedl û nî' met'ezîm
Munezzehê zewal e

Dê gerîn çerxa qedîm
Du roja sal bi sal e
Navê Xwudayê 'ezîm
Bê şîrk û heval e

Ew wahidê bêweled
Nînin çu day û bab e
Fedla te zatê semed
Ne mexfî û hîcab e

Ji wesfê xwo pir sewab e
Bizanin pir sewab e
Yek le'za Şahê Ebed
Dinê diket xirabe

Yek le'za Şahê Xebîr
Dinê diket wêrane
Yek dem diket dîwane
Tînit diket sultan e

Sultan û şah û emîr
Yek dem diket dîwane
Yek le'za Şahê Xebîr
Dinya çerx û dewran e

Dinya çerx û lewleb e
Ji bo kes nabit dewam e
Ji Meşriq heta Mexrib
Şah û şikuhda xulam e

Sahib teyr û metreb in
Cumle dê çin temame
"Kullu şey`în halîkun"
Bizanin ey ruhê me

Ji sakin û salik in
Ji bo biçwîk û mezin
Ji xeyrî zatê bênezîr
Nînin qewî beqa ye

Qazî û şeyx û feqîr
Digel ehlê wefa ye
Selewat ji dîwê munîr
"Sellû `ela Muhemmed"

Digel ehlê cema'et
"We `ela alî Muhemmed"
Da hwîn bizanin qatê

Resûlî eym û ebed

Bo me diket xebatê
Cundî û xelkê hemed
Pê diken hîkayatê
Rojik Hebîbê wadih

Pala xwo da Mînberê
Nûrha ewî bû laiq
Bi dêmê xwo enwerî
Jê rabûn xelkê salih
Dê ket qesa Kewserê
Wî dît ku bûyef wadih

Tozek ji deşt û berrê
Bilind bû weku xubar
Zahir bû yek siwar e
Yê hatiye nik aşkira
Peya bû bi xeddar e

Pirsîn ji wî çend xeber
Ew Pêxember û yar e
Cab lê veda bi îrham
Zehf bwîn li wê ekabir

Deştê dayê pir 'ezab
Tî, nabû nan û agir:
-Mîn tiştek dît wek xurab
Mîn qest kirê her hadir

Heku ez çûm ku qesrek
Şibhetî dirr û lewleb
Meydana çerx û herbek
Betel û esed dinalin

Min pêr jê kir bo esed
Gote min yek ricayê
Husna xwudana bedrek
Yê tê da çarde salî

Ew kafirê mel'ûn e
Navê ewî Xedrîf e
Munafiq e, zendîq e
Vî ra hene sed ulûf

Pir hebûn kenc, xezîne
Sed xezîn û sed sifûf
Eger tu min bihebînî
Ez im ji bo te hefkûf

Kecê cewab jê veda
Eger tu min bihebînî
Serê Elyo, Ehmed
Eger tu şimza bînî

Ji nav betl û esed
Mehra min ji xwo pelînî
Eger ji ber mehra min da
Serê ewan tu bînî.

Rabû ji cih bişeca'et
Munafiq e, zendîq e
Gotê "Sem'en we ta'et"
Manê ez im vi rê de.

Geriyana hemû beqa'e
Xwudan ziry û hedîqe
Heçî bête mena'e
Dê wî keme qedîde.

Wan eskerê xwo kiribûn
Ez hatim bo cewabê
Pir zor bûn, pir hinar bûn
Mîn qest kir di sewabê

Ji mêt e min ew ji dil bû
Ey şerbetî û şerabê
Ya Seyîdê Qehamê.
Rûnişte ber Mihrabê

Diket qesa Qiyamê.
Cibraîl diket selamê:
Ez hatibûm cewabê
Nik Xaliqê enamê

Ferman da tu rabê
Da tu bizanî ya Şerîf
Ez ê hatime bi îlham

Ji nik Me'ûdê Letîf

Da bibêjime te îlanê
Yê hatiye ne xedîf
Mal û êl û temame
Ya Seyidê 'edlanê

Rabe, bûye delîl e
Xwudê got da ew bizanî
Qasîd bo Cibraîl e:
Tu here Sîsebanê,
Ya Ehmedê Xelîl e

Û dwîmahî bi navê Xalid Axayê Zêbarî
di kerê (pişk-nm) duwê, ji malika sê, berî
dwîmahiyê, tê da ye, bi vî çîsnî îname:

Li bin Alayê Mehmed
Ew Xalidê Zêbarî
Gotî kelmê me'ûz
Hêviya bikey ji Barî
Nefsa Xirap a me'dûr
Aza bikey ji narî

Belê li ser van grovan ra jî, paşî min
dengê Hecî Mehmedê Teyarê berçî yê jiyê
wî pêtir ji (70) heftê sala, li roja 10-8-
1972 yê rîkurdkirî û birader Wartkês
Mûsê nwinêrê min hinartîye Zaxo, dengê
Mela Yûsif Mehmedî yê jiyê wî ji (60)
şêst salê pêtir rîkurdkirî min du cara guhtê
xwo dayê, navê Xalid Axayê Zêbarî di
malika sê ya berî dwîmahiyê da hatiye
gotin, her wekî min pêşkêş kirî, guman tê
da nema ku "Beyta Sîsebanê" ji vehandin
û lêkînan û darêjtina Xalid Axayê Zêbarî
ye. Ji ber ku bîrûrayêt hemî kesêt nêzîkî
danerê wê êk in, destnivîsek çu bîte der ve,
çu nav tê da nebin, çu gumana li nik
şehreza û agehdarêt xelkê cihî beyda
(peyda-nm) naket û kes baweriyê pê
nainî.

Birader Ebdureqîb Yûsîfî di Kovara
"Rojî Kurdistan" gotarek bi zimanê erebî,

bi vê manşetê: "El 'alîmu, wel şa'îr-ul
kurdî el Şeyx Xalid el Zîbarî" belav
kiriye, hinde bîrûbaweriyêt nuyî derbarî
jînenîgara wî, wekî sala ji dayêbuyîniya
wî (1243 H.)- (1827-1828 M.) û navê
babê wî Şêx Hiseyn kurê Şêx Xalid kurê
Şêx Hiseynê Zêbarê, çûye Çizîrê Paytextê
Cizîra Botan û ji wêrê çûye çend gundê li
çiyayêt deverê û xwundegehêt navbirî lê
xwîndî û şwînewarêt wî.

Belê mixabin sed mixabin, ev hemî
layêt bi nîrx û giring ji jînenîgariya wî bê
grovin, ji bilî navê destnivîsekê nebît ya
bê nav û nîşan ku çu nîrx ji bo nîne û cihê
baweriyê ji layê zanistî ve nîne.

Tiştê pêtivî gotin eve ye; Xalid Axayê
Zîbarî yê Beyta Sîsebanê digel hinde
hozana vehandin, xelkê gundê Şîniyê ye,
ji binemala axa ye, bi navê Xalid Axayê
Zîbarî û naznavê (Laxerî)* li qeza
Amêdiyê û (Bi eşîra-nm) Zîbarê navdar e.
Şêx Xalid reng e mirovekê dî bit, ji
Zêbarê çûbîte Cizîrê, ev çende hêj di tariya
nezanî da maye.

Têbînî:

* Bêjeya "Laxer" navê kerê Helîmeya Sa'dîye
bû. Gava Mihemed Pêxember (ssxl) hêj piçûk
bûye, Helîmeyê bo wî bûye dayîn û ew li kerê
siwar kiriye. Ji ber hindê gelek hozanên oldar
hebûne ku nasnavên xwe yên di helbestan de bi
"Laxer"î nivîsandine.

(1) Sadiq Behaeddîn Amêdî, Xalid Axayê Zêbarî
û Beyta Sîsebanê, Kovara Nûserê Kurd, hejmar
(7), Nevroz (1972), berperê (24-26)ê.

(2) Bi heft avan bişoyî Laxerê xwo

Meke de'wa ji vî Zêbarî qet. Di hinde dest-
nivîsan da.

(3) Ev Beyta Sîsebanê (329) sêsed û bist û neh
malik e.

(4) Ebdureqîb Yûsuf, El alîmu weş'şâîr-ul kurdî
el Şeyx Xalid-il Zîbarî, Şemsî Kurdistan el 'eded
(01), Îlon 1978, s. ((8-9).

ÇIRÛSKIN

1

Erd diziwire... Merivol
Û serê te tim bilind e...
Hinan tu kirin devê nîşangehê:
Ku tu mehf bî..
Hinekî din gotin: Na... mila bê çax kirin...
Lê tu serhşk î... tu tişteki nakî!
Dibê tu guldanekê bişkînî..
Yan tu kaxetên xwe yên duwîtkirî biçirînî..
Yan wek adetê bigirî!..

2

Carekê...jê pirsî:
- Ewa roj bi roj pêrgiyê dibû -
Ma tu rûyê xwe beyanîyan bi keseran dişû?
- Na... bersiv da.
Lê ew çemê di hinava me de diherike
tim keservan e...!!

3

Berê pir bîrdar bû... pir xefetbar bû..
Ta bîranîna wî pir bû..
Nema dikare... Rojên jê re
mayî bijmêre...!!

4

Bedeweke dinokî ye û ciwan e
Û bejna keserê min a dara sewliyê ye
û bîhna mîxeka ye...!!
Hejar e û di gufbûnê de..
Ez çawa dixwazim, wîlo distirê m..
Û helbestên xwe ji gişan re dixwînim...!!

5

Xewnên min baskspî û bîhngenî ne...!!
Loma ez pencera xwe sibê zû vedikim, lê...

Bêhûd hewl didim...
Lê bîhn tim dimînin...
Û xewnên min gişt difîrin...!!

6

Serbestiya min helbestine perengî ne...
Li ser geografiya hewdê te yê nerm
Her min hewl da ez wan bi ref bikim...
Ez bi hindava bêziyan de binav dibim û wînda
dibim.!!

7

Carekê - di dîroka govde de -
Û li ser girekî dil...
Û dîr ji çavên westiyayî,
Û veşirtî di nav rehên rîjîndar re...
yek hat alaya şahiyê vena!
Û bîyî bike hawar xwe kişand:!!

8

Dem demina dipirse:
Çawa ro derdikeve. Û eniya min
- ji diho de - vemiriye...?!

9

Pir caran ez bi tenê digavînim û distirê...
- û ez digavînim -
Û ranawestim... ta li dûwarekî dikevîm...
An zaroyek an dostek
min vedigerîne bêdengiya min...!!

10

Ez nizanîm ev keser hemû ji ku ve tîn
Lê - çiqas ku ez çentê te vedikim -
Şadiya min şermokî diyar dibe...!!

11

Dilê min çol û fire ye
Wek meydana helperkê ye...!!
Lema ez te - îşev - vexwendî
dilê xwe dikim...!
Bo helperkiyê - yan te xwest - bo serhildanê...!!

12

Ez ê te binişkuvînim bi - rûtiya - şerma xwe
Ev şeva fire ye û xewnên min pak in!
Were em ji wan re vehecînin - ger te xwest - biaxi-
vin,
Bavê min nema - bejna xwe dirêj dike - berî xwel
Û diya min hin çavrêya jwanga me dike...!!

13

Di her dîtinekê de û berî ez te verê kim
ez di dema neqîşkirî
li ser zendê te yê spî dilîzim...!!
Da ku bêziya te rakim bo jwangeyeke din...!!

14

Aferîn ji jinekê re... ku bi tivingê re dixwe...!
Aferîn ji jinekê re... ku şoreşekê dizayîne...!!!

15

Çiqas tu mezin î diya min...!!
Û çiqas ez wînda me...
û keserdar im...!!


16

Çar mirov - tenê çar -
karin termê min
rakin... bibin goristanê...!!
Lê belê... çiqas mirov gerek dibin
Ku van tiştina hemûyan rakin
Yên dimirin...
Di dema mirina min de...?!

Dêrsim - MEMO

Werger: Husên HEBEŞ

Keçika Piçûk



M. Alî K.

Wê sibê ew zû ji xewê rabûbû; dizanîbû ku diya wê nexweş e û ji nav nivînan nikane derkeve. Ev serê çend rojan bû ku nexweş bû, şevtîra din jî nexweşiyê lê kêr kiribû, eva ji dengê mîna nalînan ku derdixist fam kiribû.

Sibehî, wexta keçika piçûk ji xewê rabûbû xwe ji bo hemû karên malê amade didiît. Û bi rastî jî wisan bû. Ew gelek caran li gel diya xwe û pîrekên din bû dema ku wan kar dikirin. Wêya him alîkariya wan dikir û him jî li wan dinihêrî bê çawan kar dikirin. Ji ber vê jî gelek ji van karan ji nuha de ji ber kiribûn; wek êmkirina heywanan, malaj-tina hundurê malê, pêxistina sobê û çêkirina şorbeya nîskan jî yek ji wan karan bû ku ev çend car bû xwe lê ceribandibû û hema hema ew jî êdî bêqusûr dikir.

Her sê karên pêşîn digel ku ji bo keçikek heşt salî ewçend ne hêsan bûn jî dîsa bêqusûr û di wexta xwe de kiribûn.

Di vê navbêne re diya wê, mîna ku nedixwest keçika wê ya piçûk zêde xwe biwestîne, xwestibû ji nav nivînan derkeve. Lê ew hêj di nav nivînan de rûniştibû û pêre pêre, ber çavên wê tarî bûbû, serê wê gêj bûbû û dîsan bi paş de ketibû.

Keçika Piçûk xwe zû bi diya xwe ve gihandibû: "Dayê! Ranebe ser xwe, tu nexweş î. Ji xwe karekî ez zêde bikim nemaye. Tenê ez ê biçim ser kaniyê avinê bînim û şorbeyekê çêkim." gotibû. Diya wê bi destê keçika xwe ya piçûk girtibû, bi heyranî û

evînî lê nerî bû; "Delala min!... ne ji te ba dê halê min çi ba?" gotibû. Paşê jî destê xwe di ser porê wê, yê ku hinekî bûbû gijik, re biribû û; "Eva sê roj in ku min porê te şeh nekirî ye!" gotibû. Lê Keçika Piçûk mîna ku bibê; "Xem nake!" bi diya xwe re beşîşî bû, paşê jî şerbikê xwe li ser milê xwe kiribû û rast riya kaniyê girtibû.

Destpêka sibatê bû, lê dunya hêj sar bû; ewrekî tarî, ripûrêş xwe bi ser gund de girtibû. Ji hewşan barbara kahr û berxan dihat; li hewşekê ku berxek an jî kahrek bibariya kahr û berxên li hewşên din jî dest pê dikirin dibariyan. Te digot qey bi vî babetî bersiva hevedin didan, li hevedin dipirsîn. Yekcarina borîniya mangeyan û dewarên din jî tevî vî dengî dibû. Dengê hemiyan pevre bi meriv orkestreyek ku awazên cuda cuda jê dertên bi bîr dihanî.

Mala wan li çepê gund, li cihekî kêmxanî bû; ji ber vê jî Keçika Piçûk bi riya kaniyê de pêrgî kesekî nebû. Tenê qijalekê ku xwe li ser sincekê danîbû: "Qij, qij!" qêriya û hat xwe li ser rê, li pêşiya wê danî. Keçika Piçûk rahişt sixurekî û avêtê: "Bifire! Here bi riya xwe de: qijalka pîs!... tu çi dixwazî?" got. Lê qijalk firiya û çû çend gavan jê wir de xwe danî. Wêya dîsan rahişt sixurekî, avêtê; lê dema dît ku fêde nake, êdî hew guh da qijalkê.

Dema Keçika Piçûk ghişte ser kaniyê, dît ku kanî zuwa ye, tu av ji boriyên kaniyê nediherikî. Kêlîkekê wisan mîna ku nizanibe çi bike, şerbikê wê li ser milê wê bû û li hawîrdora xwe nerî. Di wê navbêndê re qijalk hatibû xwe li ser koşeyeke dîwarê kaniyê danîbû û dîsan dikire qije qij. Dema awirên Keçika Piçûk bi qijalkê ve ket, di serê wê de fikrek pêket.

Keçika Piçûk ji ba kaniyê bi dîr ket, lê ne riya malê, riyeye din girt. Wê biryar dabû, dê bi şerbikê ziwa venegerya malê. Wê dil hebû ku serê vê sibê ji diya xwe ya şêrîn re, ku nexweş ketibû û nikanîbû rabe ser xwe, şorbeyekê çêbike.

Carina ku bi diya xwe re dihate ser kaniyê û dema ku didîtin kanî zuwa ye, wê gavê ev rê digirtin. Ji ber ku ev riya diçû ser sarincê li aliyê din yê gund. Li wê sarincê ava baranê kom dibû û dema ku kanî nediherikî, gundiyan ji vê sarincê av dihanîn. Nuha Keçika Piçûk jî riya vê sarincê girtibû.

Bi vê riyê de jî pêrgî kesekî nebû, bi tenê ew û qijalek bûn, ji ber ku qijalekê hêj bela xwe jê venekiribû. Her serê gavê dihat xwe li ser rê li pêşiya wê datanî. Carekê Keçika Piçûk ewqasî nêzîkî qijalekê bû ku, xwest pêhnêkê lê xe, lê wê gavê qijalek firiya bû.

Sarinc ji ava baranê tijî bûbû; Keçika Piçûk dizanîbû ku gelekî jî kwîr e û vêya hinekî xof xiste dilê wê. Lê wê dizanîbû ê çawan bike; mîna diya xwe hêdî çû ser neqebê û paşê jî hêdî şerbikê xwe xist nav avê. Bayê di şerbik de bi buqe-buq jê derdiket

û şûna xwe ji avê re dihişt. Keçika Piçûk bi destekî bi kevîrê neqebê girtibû û bi destê din jî şerbikê xwe yê ku tijî av dibû girtibû. Hêj wisan di vê rewşê de bû û ji nişka ve awirên wê çûn ser tiştêkî û vêya bala wê kişand.

Li aliye wê yê çepê çiçekeke hêşin di ber kevîrê neqebê re serê xwe derxistibû û mizgîniya biharê dida. Lê vêya di serê Keçika Piçûk de bireweriyek vexistibû.

Digel ku wê demê hêj pênc salî bû jî ev birewerî weke îro bi bîr dihanî. Wê çaxê bavê wê hêj jîn bû. Gerçî nuha bavê wê li ezmanan bû; pêşin ew li wir bûbû mêvanê kal û pîra wê û paşê jî dê xaniyek ji xwe re ava bikira û li hêviya diya wê bima. Dema ku wê pîrsa bavê xwe dikir diya wê wisan jê re kat dikir. Lê di vê derbarê de pîrsên wê gelek bûn û bi pîrsên xwe serê diya xwe her dem gêj dikir. Diya wê gelek ji pîrsên wê dibersivandin, lê ji bo hinekan jî tiştê nedigot. Carekê jî dema ku pîrsek kiribû, diya wê hêrs bûbû. Wê pîrsî bû; "Çima bavo paş de venagere, ma qey ji me hes nake?" gotibû. Lê dû re diya wê jê re kat kiribû; ku dema meriv çû ezmanan, ji wir êdî meriv nema dikane paş de vegere. Lê helbet wêya jî dê rojekê bavo li ezmanan bidîta. Lê ne nuha; ji bo wê gelek west diva bû.

Keçika Piçûk hêdî destê xwe yê çepê avêt çiçekê û ew ji ber kevîr jêkir û paşê jî serê xwe bi jor de kir. Li wir, li ezmên, li cihê ku bavê wê xaniyek ava kiribû û li hêviya diya wê dima; xeyaleta bavê wê li ber çavên wê vêket. Weke wê roja biharê, dema ku ji çolê vegeyabû malê, baqek çiçekên rengareng di dest de bûn û dibêşişî. Wêya wê gavê gotibû qey bavo ev çiçekana jê re anîne û gelekî kêfxweş bûbû. Lê bavo çiçek dirêjî diya wê kiribûn; bi vêya pîr kêfa diya wê hatibû û bavê wê maç kiribû. Lê ew hêrs bûbû û ta êvarî jî ji bavo xeyidî bû. Lê êvarî dema ku bavo jê re baqek çiçek anîbûn wê çaxê pêre li hev hatibû.

Lê nuha bavo li ezmanan bû û nikanîbû vegeyîya. Lê îro li şûna bavo ê wêya çiçek bidana diya xwe, da hinekî be jî, wê kêfxweş bike û paşê jî vê bûyera ku nuha bi bîr dihanî jê re kat bike.

Di wê navbêne re jî şerbikê wê tijî av bûbû, buq-buq jê nema dihat û binav bûbû. Keçika Piçûk hewl da ku şerbikê xwe ji nava avê derxîne, lê ji ber ku destê xwe yê çepê jî neqebê berdabû, giraniya şerbikê tijî av wezna wê xera kir û ew bi pêş de kişand nava avê...

Dunya sar bû, baraneke hûrik dest pê kiribû dibariya, ji nav gund barbara kahr û berxan dihat, ji bixêriyên xaniyan dixaneke hêşin derdiket û bi jor de ber bi ezmên ve bilind dibû. Qijalekê xwe li ser kevîrên sarincê danî bû û mîna ku li hinekan hewar bike bi qîje-qîj diqêriya; lê êdî Keçika Piçûk ji mêj ve mêvana bavê xwe bû.

DU ŞEHÎD, DU JIYAN

ADNAN

*Te jî wek me gelean
Derd û kul kişand
Bi rewşeke ne xweş
Te dibistan xwand
Hevalekî jîr û zana
Xortekî çeleng bûyi
Kengî em behsa te bikin
Disa ne dereng e Adnan*

*Rehmet li te be
Hevalê Adnan*

*Te digot dost û yar
Gelê min şêrîn e
Jê pê ve kesek
Ji bo wan nîn e
Gerek em kar bikin
Da ew bijîne
Çiqas em pesnê te bidin
Disa pir nîn e*

*Tu ji bîr nabî
Birayê Adnan*

*Bajarê Zonguldak
Gelekî dîr e
Li ber derya reş
Deryake kûr e
Xerab bibe ew bajar
Adnan jî me stand
Lê va nîşana wî
Li nav goristan*

*Gelê te sax be
Kekê me Adnan*

ZEYNÎ

*Were hey lo lo, hey lo, hey lo lo...
Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo...
Hevalo lo Zeynî
Dosto, birawo, hogiro lo Zeynî
Serê me tewandî,
Namûs li erdê
Em ketin bin barê wî deynî
Ax lo hevalo, lo Zeynî.*

*Te çavên xwe vekirin, li bajarê Nisêbînê
Te digot bila zar û zêçên me fêr bibin,
Da bizanin ku jiyan şêrîn e
Ji bo vê armancê jî.
Te xwe berda beriya Mêrdînê
Te biryar dabû
ku tu bibî mamoste
karmendekî zanînê.*

*Berê mamostê me dane xopana Anadolê
Li ser serê wî
Bû teq û req-gurm û holê
Girtin avêtin girtîxanan
Ku ew sembol in ji bo zilm û zorê
Lê wî zanibû ku rojekê,
Wê vegere welatê bav û kalan - Herêma Torê.*

*Were hey lo lo, hey lo, hey lo lo...
Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo...
Hevalo lo Zeynî
Dosto, birawo, hogiro lo Zeynî
Xîret li erdê
Serê me tewandî
Em ketine bin barê wî deynî
Ax lo hevalo, lo lo, lo Zeynî...*

Nûrî ALDÛR

EVÎNDARA JI HELEPÇEYÊ HATÎ

Suzan SAMANCI

Saniye Xanima ku bi şimikên xwe yên reqreqûnî diçû û dihat, nêzikî keça xwe ya ku balkon dişuşt bû. Wê "de bilezîne, wextî ew werin" got. "Gidî bila tu kêmaniya me nemîne, ev Fatîme Xanim pir hulhulî ye." Keça wî, bi barana xwîdanê û hinarikên sorbûyî, xwe rast kir, "tu halê min dibînî" got. "Ji vê lez û bezê, ez behecîm..." Saniye Xanim, bi xwe bawer, bi dengêkî nizm, "de ne xem e, bila şixulê birayê te here serî, em jî bibe-hicin" got. "Tu dizanî, jinikê cihêzeke bêpayan, ji bo keça xwe, hazir kiriye. Ji bo Xwedê, keça wê jî hem xweşik hem jî jina malan e. Her çi qas Fatîme Xanim hinekî xwe giran dike û ji jor ve difire jî, ez dizanim, gava navê Îhsan derbas dibe, bezên dilê wê dihelin." Paşê jî, gava wê ber bi deriyê ku lê diket lezand, bêyî ku ji bîr bike, wê gotina xwe bi keça xwe gîhand, "de bilezîne, cil û bergên xwe bi-guherîne!"

Lawê wê Îhsan bû ku hatibû. Bîhtengiyeke çend rojan li ser lawê wê

bû û wê nizanibû ka çi bike... Wê, bi hîsên keldayî yên maderiyê, dengê xwe, heta ku jê hat, nerm kir. "Ev çi halê te ye, kurê min? Ev bû çendekê ku kêr devê te venake, eger derdekî te heye, bêje. Ez diya te me..." Îhsan gotinên diya xwe nebihîstin, mîna robotekê, derbasî serşokê bû, serê xwe yê ku gelekî diêşiya, xist bin avê. Wî dengê diya xwe, "kerem kin, kerem kin", bihîst. Gava ew ji serşokê derket, dengê tîz ê ken û gotinên diya wî dihat.

Saniye Xanim ji derengmayina lawê xwe eciz bû, wê şimikên xwe ber bi oda lawê xwe kişandin û çû, li ber deriyê nîvvekirî, çavekî avêt hundir; Îhsan dirêj bûbû, çavên wî sabît û vekirî, li banê odê dinihêrî. Saniye Xanimê bi hêdîka li deriyê odê xist. "Kurê min, Fatîme Xanim wan hatine şîvê, ka... tu zêde dereng nemînî..." Îhsan xwe qet nelivand. Saniye Xanimê li rû û hinarikên lawê xwe yê vekîşiyayî nihêrî.

Îhsan, bîhteng, kete salonê. Li masê, dengê herî biçûk jî, mezin dibû û bal dibirin ser telewîzyonê. Fatîme Xanim, li milekî, ji bin çavan, li Îhsan dinihêrî, li milekî jî, bi kêfxweşî, li keça xwe ku her porê xwe yê qemer ber bi dawî dibir, dinihêrî. Saniye Xanim li hember lakay-tiya lawê xwe sor û mor dibû, nizanibû çi bike û bi nêrînen hawarê, li keça xwe dinihêrî. Îhsan, bê daxwaz, xwarina xwe dixwar, çavên xwe ji neqîşên cawa li ser masê venediqetandin û bi desta kevçiya xwe dileyst. Îhsan nikaribû hîn zêde xwe rabigere, bêdeng, ji cihê xwe rabû û bi dengêkî pir nizm, "li min biborin, karekî min ê pir muhîm heye" got. Gava wî ev got, mîna ku hemû çav li ser wî bûn...

Çaxa wî derî li pey xwe kişand, koroya musika gelêrî, "ben de gîdem paytahta" digot.

Li kolanên ku ew tê re derbas dibû, merivên xemxwir diçûn û dihatin. Mêrên ku li balkonên xwe, bi bedenên xwe yên nîvtazî, li hember germahiyê şer dikirin, jinên ku li pey deriyan, li daldeyan, li pey hûnikahiyê bûn, ereba bûkê ya xemilandî, îtfayekerên ku bi fise fis, av direşandin kolanên, hîç, bala wî nekişandin. Wî ew ferq nekirin. Lê bihna axa avdayî bi difnên wî ket; mîna her carî, wî dest hilda mînbûsê. Li mînbûsê, dengê strana =ivan a li ser Helepçeyê ku zinar û lat dihelandin, bilind dibû; dilê wî guviştî, mîna ku dilê wî bi hesinekî agirqor kizirî...

Gava ew li Daxkapiyê peya bû, wî hema berê xe da Fîskayayê; çaxa ew di ber nexweşxanê re bihurî, wî li şewqa boş a ambulansê û li merivên ku dilezandin, bi çavên vala, nihêrî. Gava ew ji kaş peya dibû, bayekî germ, bi bihna anasonê, rûyê wî mist da. Paşê wî xwe li kêleka rê, li ser êzingê qehîm, da erdê û li bêrîkên xwe geriya: wî cixara xwe ji bîr kiribû.

Di binê geliyê de, çavikên telewîzyonan ku di tariyê de dibiriqîn, zarokên ku di nav çahl û devê cawan de radibûn hevûdu, siyên ku diçûn û dihatin, dengê kûr ê çêlekan ku ji kûrahî dihat... Ronahî û tûrêjen ku li milê din ê Dîclê xwe dilivandin...

Wext, navbera meha Adarê bû. Çekên kîmyewî ku Sadam Husên li ser bajarê Helepçe reşandibûn, bûbûn sebeba mirina pênc hezar kurdan... Bi hezaran merivan jî xwe avêtûbûn ber tixûbên Turkiyê, xwe li tixûban qelibandibûn. Turkiyê, bêçare û jî begaviyê, ji wan re, hembêz vekiribû. Donzdeh hezar pêşmerge, tevî zar û zêçên xwe, li avahiyên afetê ku bi çend kilometran dûr bûn, hatûbûn bi cîhkirin.

Otobosa ku Îhsan lê dixebitî, di xizmeta pêşmergeyan de bû.

Tirs û kesera mêrên bi kincên wekhev ên di rengê qehwêyê vekirî de, jinên bi cil û bergên hewreşmî, dirêj û rengîn, bi bendikên spî û dirêj ku hemû bedena wan radipêçandin, bi rêzikên ku bi eniya xwe ve girêdabûn, pir ber bi çav bû... Rû û bedena zarokan di nav birînên kûr de bûn; her roj, gava Îhsan ew dibirin nexweşxanê, bêrawest, nalenala wan bû...

Rojeke tavîn a biharê bû, Îhsan jî sefera nav bajêr ber bi Fakultê dajot, li ber devê sêrê, pêşmerge, jinên bi cil û bergên rengareng li rêzê bûn. Keça xort a cilmor ku bi gavên westiyayî, berî hemûyan li otobosê siwar bû, li kursiya li pey Îhsan rûnişt. Serpûşa ku wê li rûyê xwe û lêvên xwe pêçabû û rêzika reş a eniyê çavên wê yên stûr hîn jî stûrtir kiribûn. Bêyî ku hay jê hebe, Îhsan neynika biçûk a nêrînê, li gora dîtina keçikê eyar kiribû. Wê serê xwe danîbû ber pencerê, bi tiliyên xwe yên zirav û dirêj, hertûm, çavên xwe yên nîvgirtî paqij dikirin. Gava ew li Fakultê peya bû, Îhsan, bi xwezî, li pey, lê nihêrîbû. Bi gavên nerm, li kêleka pêşmergeyekî kal, bi alîkariya wî, ew diçû, - hingî cil û bergên wê yên dirêj û rengîn navpišta wê hîn bêtir diyar dikir.

Ji wê rojê û bi şûn de, cilên wê yên mor, çavên wê yên stûr ku li bedena wê ya spî dihatin, tiliyên wê yên dirêj û paqijkirina çavan, êdî tu carî jî bîra Îhsan demeketin. Li ber direksiyonê, ew her difikirî. Mîna ku wî, di nav mijahiya mor de, li pencera otobosê, li devê sêriyê, li rawesteka Fakultê, her ew didît. Hezîna kêfxweşiyê hemû bedena wî vedigirt, wî hemû şênî jî ber çavan derbas dikir, bi hêviya dîtina wê, xwe dixwar.

Rojekê, saet li dora dehan bû; gava wî li Fakultê rêwî werdigirtin otobosê, wî ew dît. Wê cilên xwe yên dirêj û mor, bi

destan girtibûn û hêdî hêdî ji nêrdewanan peya dibû. Hingî, ji heyecanan, cixara Îhsan ji devê wî ket, rûyê wî sor bû, dengin di guhên wî de olan dan, bi qasî biskekê, çavên wî tarî bûn. Destên wî yên ku dihezian, dîsan, çûn neynikê; ew îcar li rêza dudiyar rûniştibû, bi jinika ku li dawiyê rûniştibû re dipeyivî û dermanên ku wê bi tiliyên xwe yên dirêj pêgirtibûn, nişanî jinekê dida. Li ser pirê qezayek hatibû pê û trafik rawestabû. Tevî ku hemû rêwî ji otobosê peya bûbûn, ew nebûbû. Wê serê xwe danîbû ber pencerê, li der dinihêrî. Serpûşa wê hinekî ber bi jêr bûbû û porê wê yê zerhingivîn derketibû der. Piştî demekê ew ji cîhê xwe rabûbû, xwe bi kursiya pêşin girtibû û bi kurdiyeke zirav û zelal, ji Îhsan av xwestibû. Îhsan şaş mabû, gava wî ji termosê av dayê, wî nikarîbû hezîna dest û lêvên xwe rabigirta. Wê av ji bo hebên xwe xwestibûn; çaxa wê qedeh li Îhsan vege- rand, spasî wî kir û "navê min Jiyan e" got. Paşê jî wê behsa Helepçê kiribû... Gava wê behsa Helepçê kiribû, hêstirên çavên xwe veşartibûn û gotibû ku ji mal- bata wan bi tenê ew û mamê wê li kampê dijîyan. Ew nikarîbûn hertim ji kampê derketina, di saetên diyar de, bi rêdanê, ew dikarîbûn ji kampê derketina.

Di her destpêka roja nû de, Îhsan termo- sa xwe datanî ser kursiya paş xwe û Jiyanê jî dizanîbû ku gava ew bihata, ew ê li ser wê kursiyê rûništa. Niha keneke qurmiçî li kesera rûyê wê zêde bûbû. Bîbîkên çavên wê yên çikîrêş, mîna piraniya zaro- kan, her sor bûn, qirika wê jî bi sorahiyên kûr tîjî bû.

Êdî wî dizanîbû ka Jiyan ê kengî bihata nexweşxanê. Rojekê wî tizbiya bi rêzikên sor û spî ku li serê tîpa "Î" hebû, danîbû ser termosê... Gava êdî ew dikarîbûn bi hêsanî ji kampê derketina, Jiyan, hema çî bigire, du rojan carekê dihat. Çaxa Îhsan

wê li sūkê peya dikir, ew bêsebir li hêviya vegera wê bû. Bi mehan, ew ji neynikê, bi hev re, keniyabûn, pisepisên germ û xweş jî li van kenan zêde bûbûn. Rojekê, gava wê pakêta destê xwe, bi lez dabû û çûbû, Îhsan bi meraq pakêt vekiribû. Tê de kincên pêşmergan hebûn û li ser kaxizekî ku bi kincan ve bû, weha dinivîsi; "sibê newroz e, van libasan li xwe ke, ez ê li ber derî bim." Wê şevê heta sibê, xew neke- tibû çavên Îhsan.

Di roja bi bîhna biharê de, meydana kampê bûbû mîna meydana cejnê; pêşmergan kincên xwe yên nû li xwe kiribûn, fîstan û cil û bergên sîm û hewrêşimî yên kêçên bejndîrêj di bin tûrêjen tavê de dibiriqîn, jinan li dora agirê gur, bi coş, govend girtibûn, bi stranan hilweşîna Qirala Dehaq, serketin û serfira- ziya Kawayê Hesinker û daxwaza dilên xwe, azadî û serbestiyê, dianîn zimên... Bi dû re, hemû bi hev re, ber bi aliyê dawiya kampê, dehla biçûk, çûbûn; ew li ser giyayên şil rûniştibûn. Serpûşa Jiyanê ketibû ser milên wê, porê wê yê zerhin- givîn li ber bayê Adarê firiya bû, tayên spî beraktir bûbûn; di çirûskên çavên wê yên çikîrêş û di dengê wê de mîna ku tirseke veşartî hebû...

Demekê bû qedexa ku ew ji kampê der- kevin. Nêrînen Jiyanê di şev û rojên Îhsan de her mezintir bûn, dengê wê yê nerm her dilê wî kizirand, ew car bi car li kaşa axîn a kampê çû û hat. Digel tûlên hesinî û tevdirên qehûm ên eskerî, wî her riya xwe bi wî derê dixist. Paşê, ew xebera reş bi bajêr ghişt; hinan jahr xistibûn nanê pêşmergan, gelekên wan bi jahre ketibûn û kargêran ew rakiribûn nexweşxanê.

Êvarê, di koxişke şênîpir de, wî Jiyan li ber serê mamê wê dîtibû. Jiyan îcar gelekî melûl bû, bi nêrînen şermoke, lêvên wê heziyabûn, wê destê mamê xwe ku li ber mirinê bû, ramûsîbû û "çima li

vê dinyayê cih ji me re teng e! Ka însanetî?" gotibû. Pêşmerge û jinên ku ev gotin bihîstibûn, bêdeng, giriyabûn.

Rojekê, ew bi hev re ber bi gund ku li wî aliyê kampê bû, meşiyabûn, çûbûn û li bin darên spîndaran rûniştibûn. Dengê pelên darên spîndaran û dengê cowa ku li ber lingên wan diherikî û diçû, ketibûn nav hev. Wê hêstirên çavên xwe paqij kiribûn û behsa çîrokên şevên zivistanan, gopikên berfîn ên Çiyayên Metîna, kulîlkên ku li deştan dibîşkovîn, kahniya spî kiribû. Wê bi destê xwe xîç berhev kiribûn û bi dengê xwe yê nerm, mîna ku ew xwe suçdar bihesibîne, weha gotibû, *"em li serê we jî bûn bela, lê feqîrên we jî hene."*

Ew mîna çivîkeke birîndar bû ku awazên wê di sandûqekî kilîtîkirî de bû. Îhsan nizanibû çî bike, haya wî baş ji fermana waliyê navçê hebû; zewac, bi misogerî, qedexa bû... Paşê, ew roja dawîn hatibû, herwekî ew hatin, pêşmerge dê biçûna. Roja dawîn, ew li rêza pêşîn a otobosê bû. Wê hiç li neynikê nenihêrîbû, li ser rûyê wê şopên jan û keserê, serê xwe danîbû pencerê. Çaxa ew peya bûbû, wê lêvên xwe gez kiribûn û bi zehmetî gotibû, *"sibê."*

Dotira rojê, gava Îhsan li ber devê sêriyê li pêşmergeyên ku li otobosan siwar dibûn, dinihêrî, çavên wî li Jiyane ket; ew bi cilên xwe yê mor ji kaşê dadiket. Wê destmala sor a destê xwe hildida û xatir dixwest.

Îhsan hêstirên ku ji çenga wî ber bi qirîkê dadiketin, paqij kirin. Heyv li ser çemê Dîclê şewq dida, merivekî hûr û mûr ku ji kaşa Fîskayasiyê peya dibû, bi meraq li Îhsan dinihêrî. Îhsan rabû ser piyan. Destên wî di bîrîkên wî de, wî li bexçên Hevselê ku di şeva heyveronê de xwe dilivandin, li Çemê Dîclê ku bi aramî diherikî û li şewq û ronahiyên ku li milê din dihe-

ziyan, nihêrî û li dengê şevê guhdarî kir. Bi gavên giran, ew ber bi malê vegeiya.

Gava ew kete kuçê, êdî herkes di xewê de bû. Bi tenê dengê berz ê Celal Beg ku wan her dibihîst, ji malê, xwe digihand kuçê. Îhsan bi usûl li derî xist. Çaxa wî dengê şimikan bihîst, çavên sor û werimî yê diya wî hatin ber çavên wî.

Wergera ji tirkî; **Mehmed UZUN**

Suzan Samancı, mixabin, li ser vê nivîskara me, hema çî bigire hîç agahiyên me nîn in. Di destpêka meha 11'an a 1993 an de, gava ez li Stenbolê bûm, şevêkê, di xwarinekê de, min Erdal Öz, nivîskarê tirk û xwediyê weşanxana *Can Yayınları* dît. Wî ji min re beha nivîskara me kir. Kitaba kurteçîrokên a Suzan Samancı, bi tirkî di nav weşanên Canê de nû weşiya bû. Dotira rojê Erdal Öz kitabeke S. Samancı da min. Çaxa min kitab xwend min dît ku S. Samancı ji nivîskara ku min dipa jî çêtir bû. Hemû kurteçîrokên wê li ser kurdan û welatê kurdan bû û di kurteçîrokên wê de ziman, stîl û awayekî edebî hebû. Hingî min dil kir ku kurteçîroke wê wergerînim kurdî. Li gora ku Erdal Öz ji min re gotiye S. Samancı ji Diyarbekirê ye. Ew jî wê nas nake. Wê kurteçîrokên xwe jê re bi postê şandine. Bi tenê bi naman ew hevdu dinasin. Ez hêvîdar im ku nivîskara me dê di nivîskariya xw de bedewam be û hîn gelek kitabên din yê çêtir pêşkêşî xwendevanan bike.

M. U.

Di hejmara 8'an de piyesa Yılmaz Erdoğan "Tu İshak ı, Cemilek ı" jî ji aliyê M. Uzun ve ji tirkî hatibû wergerandin. Lê belê navê wergêr hatibû jibîrkirin. Em rast dikin û ji M. Uzun û xwendevanan lêborînê dixwazin.

JI BO YEZDAN

Medenî FERHO

*Yahol...
Em bêjin merheba, bo jiyana te
birazî...*

*Bidin
Dê û bavê te
Xweş dîlan û dawet
û sed pîrozî...*

*Tu bi xêr hatî,
Nava jiyana pîr zehmetî..
Wer birazî,
Wer,
Rûne ber kaba min
Ji te re bêjim tevgera dinê
Çîrok û çîvanokên
Zor û zehmetî..
Bo salifên rûmetî
Em bikin galgal
Û xweş gazî...*

*bi navê yê ku ez û tu dan;
Yezadanê pak, yê dilovan
û mêhreban!...*

2

*Xweş pîrozî
Li nav û emrê tel...
Jiyana têr gul, sosin û rihan*

Bibe para tel...
 Erê biarzî,
 Pir xweş e
 Jiyana berbang û serfirazî...
 Hêvîdar im,
 Tu nebîne tu carî û qet,
 Wekî bav û kalan, xela û celayî,
 Sirgun û mihacirî...
 Mixabin, jîyan zor e;
 Ax û hesret,
 kul û merez,
 dilo jar e!...
 Disa dibêjim,
 Pir xweş e, jiyana bi xîlmet
 Û bi xizmet...
 Pir xweş e,
 Jiyana bê tirs û hêbet
 Ku tê de bibe xebata bi rûmet
 Ku peyda bibe hevalê bi xîret
 Têr şîret!...
 Hêvîdar im, tu nebîne tu car,
 Mîna apê xwe,
 Heps û zîndan;
 Nebit tu car mala te wêran...
 Nemîne tu car bê mal û mewdan...
 Ew dijminê mîna hovan
 Nekin bi te,
 Ser bizmaran gêran!...
 Destê te nekevin,
 Bazinê zincîr û hesin...
 Xeyalên te bi xwe jî
 Nekevin rekiha kevîr
 Û xerca têr hesin...

3

Yaho!...
 Çiqas xweş e,
 Kirina bi zanayî...
 Rabûna bi guhdarî...
 Karê bi zîrekî...
 Mirina bi navdarî...
 Erê birazî...
 Erê birazî,

-Zarok jiyan el...
 Kulîk û sewt el...
 Kêf û şahî yel...
 Qesr û qonaxa serê axa spî yel...
 Fêkiyê Newala Bûnisra yel...
 War el... Cîh el...
 Dext û qût el...
 Rez û pez el...
 Xweş guhdar be,
 Gotinên min ne bes galgal in...
 Ne ku bê zad û zewal in...
 Serpêhatiyên çil û çar salên
 Pîr xedar û hawar in...
 Birazî,
 Ku tu nebî siwarê hespê cawal,
 Nekî beza pilingê xedar
 Nebî nêçîrvanê karxezal,
 Dê kes nebêje Yezdan,
 Kurê filankes,
 Xweş ciwamêr e,
 Xweş heval û mêr e...

4

Birazî,
 Rehmî li miriyê te
 Sîlav li sîfra te
 Xwezîka min bi emîr
 û navê tel...

Hêvîdar im,
 Bo we zarokan;
 Cîhan, ne pîr sar be,
 Ne jî pîr germ!...
 Tê de tune be,
 Bombe, toz û birîn,
 Seqetî û xwîn...
 Êş û elema mîlkulîn...
 Dayik reş girê nedin,
 Nebêjin, jarê lawoo,
 Nekin hawar û xurîn...
 Jiyan bo we,
 Di demsala bîst û yekê de;
 Têr rewa û bi av bel...

Xemla Tawusê bihiştî bel...
Kulîlk û sosinên ber çeman,
Rihana devê çal û bîran,
Not û neh tîrêja rojê de,
Xemilî bel...
Evîndariya xweş,
Têr baqê gula bel...

5

Yahol...
Hêviya min ew e!...
Ew kesê ku şivan in,
Xwedî hêz û xan in,
Xêrxwaz bin,
Tîfaq û aştiya rast,
Biçînin, bihûnin,
Dî nava hewn û dîla xîn.
Erê rast e,
Bê axîn û nalîn,
Bê kul û hesret,
Bê xerabûn û ziyan,
Ava nabe jiyan!...
Ax birazî,
Xwezîka min ew e,
Kû bo zaroka ne ba ye,
Bîra, heval û xwişkan,
Dayik, jinap û jinxalan!...
ne ba ye,
Ew kesera bê xelat,
Dûrketina cih û welat...
Xopana xeribiyê,
Ew jiyana bê xelat!...

6

Erê,
Galgâl ne bê mecalî ya jiyane ye
birazî..

Hêvî
û
dalayî
bingeha tevgera insanî ye!...

Jiyan,
Bexçê îrem e...
Têrgul û dengê bilbil e.
Belê, ku tê nebûya dirî û sitrî
Û meriwên mîna Beko Ewan,
Lom û xîyaneta pismam û nasan,
Pir xweş û şîrîn bû jiyan.
lê mixabin,
Jiyan tijî newalên kûr in,
Tijî hût û hefrît bê xelat in,
Tev çalik û goncal in,
Xefik û dav in,
Çiyayên bilind serî bi mij û moran in,...

Şîreta dawî birazî,
Zana û şiyar
Xewasê şev û rojê bel...
Mîna Şêrgo rênasê dûrbîn,
Mîna Selahaddîn,
Şurê destmala hevrişim,
Şahgula dilê xelkê bel...
Mîna navê xwe, bi ol û tol bel...
Serdarê rojên teng,
Hoste necarê şewqa rengî,
Neqaşê xemxeyalê hewn û dila,
Qubletgeha dest û çawa bel...

JANA GEL



Sebrî BOTANÎ

Min di hejmara *Welat* ya 89'an de danasînek li ser romana *Îbrahîm Ehmed* ya bi navê "*Jana Gel*" xwend. Danasîn ji aliyê hevvelatîyekî me bi navê *Jêhat Serheng* ve hatiye nivîsandin.

Ez bi mixabinî dibêjim ku ez nû dibihîzim ku *Jana Gel* bûye kurmancî û pîrr mixabin e jî ku heta niha min kurmanciya wê bi çavên xwe nedîtiye. Lê her çawa be, mala *Elî Şêr* ava be ku wî pirtûk ji kurdî wergerandiye kurdî. An jî wek *Hejarê* rehmetî gotiye: Nan bi nanî xwa-

riye.

Bibûrin, bi rastî ez şerm dikim, lê naçar im bibêjim, min soz dabû ez wê *Jana Gel* bi zimanekî nermtir û zelaltir ji zimanê mamosteyê xwe yê hêja *Îbrahîm Ehmed* bixwînim. Lê Xwedê mala dijminên me û ya van êş û janên pîrtûiya min kaviil bike.

Dîsan mala *Elî Şêr* ava be û hêvîdar im jî ku vî *Şêrê* me, çêtir ji wê biryara min an ji wê xewna min pêşkêş kiribe. Nemaze min tiştek ji wê baştir di wî zaravayê kurdî de nexwendiyê, an jî wê bêtir hizra min rakêşa ye û li hewesa min xweş hatiye.

Lê ku *Jêhat Serheng* dibêje: (...di navbera salên 1950-54'an de hatiye nivîsîn, lê mixabin pirtûk heta sala 1970-71 li ba Dr. Kemal Fuat maye, Dr. Kemal pirtûk winda kiriye, di sala 1970-71'ê de hatiye dîtin û hatiye belavkirin...)

Ez nabêjim pirtûk winda nebûye, lê ew kî ye ji bil kesên wek *Sofî Simo* wilo bi hêsanî û bê pirs û guman bawer bike, ku ew pirtûk wek xwe, bê guhertinek çend carî, hatiye çapkirin?

Ez ji nêzîk ve xwediyê pirtûkê dinasim. Ew îro tiştekî dinivîse, sibe hildiweşîne û dike tiştekî din. Vê radike, wê dadike û ji nû ve dîsan dest pê dike. Lewre nakeve serê kesî ku wî ew pirtûk bê guhertinek mezin şandibe çapxanê. Nemaze pirtûk pirtûka wî ye, ne ya kesekî din e û ne jî destnivîseke kevnare ye ku em bibêjin hema wilo bê destêvedan çap kiribe.

Lê wek ji kelekela germiya gotara *Jêhat Serheng* xuya dibe, ew bi hêsanî baweriya xwe bi van gotinên min nahîne. Lewma jî

ez naçar im wî naçar bikim û hizra wî bi vê çîrokê mijûltir bikim.

Ger ne şaş bim sala 1974 yan 75 bû- lê her çawa be, piştî beyana 11'ê adarê bû- birêz *Dr. Mehmed Osman* gotarek raberi min kir û got: "Ev gotar ya mamosta *Îbrahîm Ehmed* e, mirov ji xwendina wê têr nabe. Mamoste *Îbrahîm Ehmed* berî sê rojan ew nivîs ji kovara "*Pêşmerge*" re şandibû, lê dîsan vegeandibû û va ye dîsan şandiye, gerek em vê êvarê bê derengî wê bişînin çapxanê. Lê çunkî gelekî xweş e, tu jî bixwîne û ji bo kovara "*Kadir*" bike erebî û em dê sibe zû bişînin çapxanê. Min di wê şevê de, bi herdu çavên xwe ên kul ve û bi alîkariya dostê xwe *M.X.* ji kurdî wergerande erebî û spêdeya roja din sparte dostê xwe *Dr. Mahmud* û min gotê jî: "*Bi rastî xwendina wê bi min jî pir xweş hat*". *Dr. Mehmed* çavek bi erebiya gotarê ve xişand û got: "*Gerçî erebiya te bi dilê min e, lê eger mamosta Îbrahîm bi xwe erebiya gotara xwe bibîne çêtir e, lê bi herhal gereke vê êvarê bigihê çapxanê*".

Me di wê gavê de, demdes ji mamosta re şand. Wê rojê ta danê êvarê, wî ew gotar li cem xwe hişt û li me kire derengî. Paşê ku li me vegeand û min xwend, çirîsetê ez girtim. Çi bibînim? Tibabek ji gotarê, duh tiştek digot û îro tiştekî din dibêje, hem jî zimanê liba kurdî bi çakî hatiye kezaxtin. Herweha naveroka erebiya wê jî bîst ji sedî hatibû guhertin. Bi vê guherînê jî di hin cihan de kurdiya wê tiştek digot û erebiya wê tiştekî din, bi vî awayî yekbûna naveroka gotarê di her du zima-

nan de nehatibû parastin. Piştî hingê di delîvekê de min ev ji mamosta pirsî, xwe kenand û got: "*Qey çî eka bê qeza bî*" got û lê zêde kir "*Ger em bi kurdî binivîsin em digel xwe diaxivin, lê ku me bi zimanekî biyanî nivîsî em bi milletê wî zimanî re diaxivin*".

(...dema mirov pirtûkê dixwîne dibêje qey *Îbrahîm Ehmed* rewşa îro ya Kurdistanê bakur aniye ziman. Rewşa rewşenbîrên kurdên Tirkiyeyê wek rewşa qehremanên romana *Jana Gel* in...)

Bêguman e ku hemî gelên welat û pênas jê standî wilo ne û heta piştî rizgarbûna xwe jî bi demeke dirêj, an kurt, wilo dimînin jî, paşê bere bere ew rewşa kirêt û çepel namîne. Em bi hêsanî dikarin bizanin ku rewşa Cezayirê ya berî serxwebûnê, wek rewşa Kurdistanê ya îro bû... Rewşa rewşenbîr û ronakbîrên romana *Jana Gel*, rewşa rewşenbîr û ronakbîrên Cezayirê bû, hey kakî xom... Heta piştî serxwebûnê jî bi çend salan ew (*Jana*) dişwar her mabû û niha jî ta radeyekê berdewam e. Eger *Jêhat* rûpelên hin ji rojname û kovarên ereban, ên rojekê tenê jî vekêşe û wan babetên ku li ser rewşa Cezayir û rewşenbîrên wê hatine nivîsîn bibîne, dê bêhemdê xwe û bi dengekî bilind bibêje: Cezayira hingê Kurdistanê îro bû, Kurdistanê îro Cezayira hingê ye. Herweha bêguman jî ku eger *Jêhat*, Kurdistanê (Îranê!!) û Kurdistanê (Îraqê!!) jî wek Kurdistanê (Tirkiyeyê!!) û Kurdistanê (Ewrûpayê!!) dîtibe, wî ev nedigot-dê ev negota-dê bigota an bidîta, ku rewşenbîrên başûr ta sala 1990'î jî di wê rewşê de me-

levanî dikirin... Ew rewşa genîbûyî giştîye û nîşana yekîtiya derdê me ye. Lê kekê me *Jêhat* neşiyaye bibîne, lewre wî bi giştî û hem bi taybetî jî rewşenbîrên bakur tenê daye ber devê dasa xwe ya kuh û şikestî. Derdê bakur ji yê hemû Kurdistanê dişwartir e, ji sala 1925'an ve heta niha, ji bil kuştina kurdan, her tişt qedexe ye. Bes kuştina kurdan û standina gundan ne qedexe ye, zimanê kurdî qedexe ye, navê kurdî qedexe ye. Her tenê qirkirina gelê kurd ne qedexe ye û nahê qedexekirin. Di rewşeke wisa de rewşenbîrên bakur heta eger bivên jî dikarin çi bikin? Yan divêt çawa bin?

Mixabin ne tenê rewşenbîrên bakur, lê piraniya rewşenbîrên Kurdistanê heta îro jî heştê her dîl û dînen kultur û zimanên tirk, faris û erban in. Ew xwe pê qure dikin û ji xwe re dikin şanazî jî.

Lê ya çîrîset ew e ku hin ji rewşenbîrên bakur bivên Atatürk û Celadet Bedir-Xan her duwan jî xwe razî dikin. Bi rastî jî mirov nizane ji vê re çi bibêje û çi biryarê bide, an bistîne, lê her çi be û çawa be jî ev nîşanek ji nîşanên başiyê ye, nemaze çunkî ev nîşana baş bi cengê re afirî. Qet ne zehmet e mirov bizanibe ku vê şoreşa pîroz bi xwîna qehremanên kurd rewşenbîriya kurdî bi tundî bizivand, lê her çiqas rewşenbîrên bakur sûdek baş ji vê bizavê bi dest xwe ve anîne jî, lê mixabin xwendevanên bakur neşên xweşiyê jê bibînin. Sedem jî çepeliya dijminên stemkar e. Dermanê vî derdî û hemû derdên kurd, serkeftina şoreşê ye.

Helbet ne ez tenê vê dibêjim an dizanim.

Ne dûr e jî ku ez di hin gotinên xwe de şaş bim jî, lê her çawa be min tiştê got û rewşa rewşenbîrên bakur anî ziman. Lê pa *Jêhat*, ne rewşa başûr, ne rewşa îro ya rewşenbîrên wê -ew rewşenbîrên ku romana *Jana Gel* ji bo wan hatiye nivîsandin û çapkirin, bi yek peyvê jî di gotara xwe de neaniye ziman- sedem jî ew e çunkî *Jêhat* nizane ku romana *Jana Gel* neynika rewşenbîrên başûr e û bi wê radeya ew, rewşa rewşenbîrên bakur tê de an tê re dibîne, ez jî bi wê radeyê rewşa ên başûr tê de dibînim. Rewşenbîrên başûr ne hema ew 200-300 endamên Yekîtiya Nivîskarên Kurd in, ku cenabê min jî yek ji wan e û êdî hew... Mixabin gerçî rewşenbîriya kurdî li başûr jî wek ya îro li bakur bi xwîna kurdan hatiye hevîrkirin, lê dîsan hejmarek mezin ji wan xwe kiribûn pesindarê bejn û bala *Sedam* û nivîsar û helbestên xwe bi dirav û xelat difirotin, îro jî pir kes ji wan, neynûka *Sedam* bi kurd û Kurdistanê naguherin. Eger li bakur şetînek hebe, me li başûr sed ji wî şetîntir û çepeltir hene. Lê pa me li başûr rewşenbîrên dîlovan û fedekar jî hene, dîlopek ji xwîna şehîdên welatê xwe bi hemû malê dinyayê nadin.

Jêhat dibêje: "M. Uzun pirtûk baş vene-kolaye, lewre ne gotina Cezayir, ne jî şoreşa Cezayirê di pirtûkê de bi yek rêzikê jî nîn e. Bûyer li Kurdistanê dest pê dike û li Kurdistanê kuta dibe..."

Lê di rojnâmeya Kurdistan Pressê hejmar 89'an de, Îbrahîm Ehmed di hev-peyvîneke bi Mehmed Uzun re, di derheqa têkiliyên romanê yên bi Cezayirê re wilo

dibêje: "Min rast û rast nikarîbû behsî gelî kurd û Kurdistanê û raperînên wê bikim. Ji ber ku qedexa bû. Loma min bi mebesta Kurdistanê di romanê de behsî şoreşa Cezayirê kir, mîna ku bûyer û hedîse li Cezayirê dibuhure û min roman pêşkêşî şoreşgerên Cezayirê kir"...

Cezayir milyonek şehîd, heta wek Kurdistanê me bindest û bêmaf û pênas jê standibû, me kurdan jî wek hemî gelên azadîxwaz, jî Xwedê dixwest ku şoreşa wê bi ser bikeve û bi serxwebûna xwe şad û bextewar bibe. Hemû partî û sazîyên mîletê me yê belengaz, li gorî rewşa xwe ya lawaz, nerazîbûna xwe beramber stema dewleta Fransaya dagirker, radigihandin.

Lê mixabin, piştî serxwebûna xwe bi salan carekê jî, hema yek carê jî- vê Cezayira demokrat (!) ne bi êskere û ne jî bi nihênî, li rewşa mîletê me nepirsî. Berevajî, paşê bi vê jî ranewestiya, me hew dît ji nişka ve bi vajîtî hate me û di sala 1975'an de, roleke nemirovati leyist ji bo herifandina şoreşa me ya çardeh salî.

Belê keko, belê, wisan bi vê niyaza qirêj, dewleta Cezayirê bi navê xwe û li welatê xwe rejîma Îranê û dewleteke Iraqê gihandin hev û li hev civandin û bi navê "Peymana Cezayir" li hev jî anîn û paşê bi wan re hat li ser termê şoreşa me reqîsîn.

Wek çawa em di govenda serxwebûna wê de bi dilxweşî reqîsîbûn, ew jî wisan bi kêf û şanazî bi Şah û Sedam re di şîn û şewena me de direqîsî.

Lewra hema sedema nehanîna navê Cezayir û şoreşa Cezayirê, çi be bila ew be. Ev ji danasîna Mehmed Uzun re nabe

kêmasî, kêmasiya mezin û kirêt ew e ku eger, kar û kiryar û kirinên me, me ji weca neteweyî veqetîne... Kêmasî û riswabûna mezin ew e ku eger rewşenbîriya kurdî, me ji doza gelê kurd cuda bike. Helbet ev gotina min giştî ye, ne taybetî ye.

Jêhat dibêje: "... M. Uzun di nivîsa xwe de behsa gelek qusûr û çewtiyên girîng ji aliyên teknîka romanê ve kiriye. Rastiya vê nêrînê encex bi lênêrîna pirtûka M. Uzun ya herî tê zanîn, Siya Evînê derdikeve holê..."

Ez dibêjim, Xwedê neke, kêmasiyek di pirtûka mamosteyê me Îbrahîm de hebe, lê ez bawer im eger hezar û yek çewtiyên çavzîq, xwe tê de li ber çavên Jêhat hilavêtîbin jî, wî yek tenê jî nedîtiye... Lê çima?

Çunkî wî piştî xwendina danasîna Mehmed Uzun û berî xwendina pirtûkê, yekser biryara xwe daye, lewre êdî neşiyaye, an jî her neviyaye bi çavê dîtina çewtiyan bixwîne. An ji serî ve - ji destpêkê ve- armanca wî hingavtina M. Uzun bûye. Heke na, qet ne ber eqle ku di nêv wan hemû pesnên qelew û bijarte de şaşîtiyek biçûk jî tunebe. Herweha - lê bi awayekî din- qatî hema di nêv wan qusûr û çewtiyên teknîkî de, ên ku M. Uzun di nivîsa xwe de behsa wan kirî, gotinek nîvrast heye? Li vir pirsek biçûk serê xwe li Jêhat hildide û dibêje: "Aya eger ew danasîna M. Uzun, ya kesekî din bûya dê ew nivîsa te jî, her dîsan wek xwe bûya, an dê bi xemlek din bûya?"

Ne dûr e hin ji xwendevanên me hizir bikin ku ez li dijî nivîskar Jêhat Serheng

im, an jî alîgirê *Mehmed Uzun* im, lê hergîz na û na. Min *Uzun* bi romana "*Tu*" û pirtûka "*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*" naskirîye, *Serheng* jî bi nivîsa wî "*Jana Gel û Danasîna mehmed Uzun*".

Ez digel rastiye me, hem jî wek her kesekî din ez jî alîgirê nêrîna xwe me... *Rexnegir(!) J. Serheng* rexne daye rexekî û hatiye dilxweşiya xwe bi naskirina *Jana Gel* û xwediyê wê derxistîye û pesnên delal û qelew dabêşa wan kirîye û ji rexekî din ve bi hişkî berhemên *M. Uzun* bi du gotinên şaş û vajî şanî xwendevanan dide, lê di her du rexan de jî ketîye di teqneşêla hemaiya xwe de. Ev kirina wî ne rexne ye. *Rexne* û *nirxandin*, şaşî û kêmasiya nîşanî mirov didin. *Rexne* derman e, çare ye, berhemana xweş û paqij dike. *Rexnegir* hosta ye, dinijilîne, naherifîne. Heta eger xwediyê berhem ne digel bîr û baweriyên wî be jî... Eger *J. Serheng* ne wisa be, ew dê nikaribe berhemana binirxîne... Heke na wî ew çewtîyên ku *M. Uzun* gotîye di *Jana Gel* de hene, pê guncbar nedikir, çûnkî em hemû dizanin ku her berhemek, şaşî û kêmasiyên xwe ên taybet hene... Mixabin jî nivîsa *Jêhat* diyar dibe ke rexne li cem me kurdan hêj nehatiye firşikkirin jî, lê ya rasttir ew e ku em bibêjin rexne li cem me niha di qonaxa "*heyênîne*" de ye. Yanî jî nû peyda dibe. Ez bi xwe ne rexnegir im, ne qeymegir im û ne jî xwe dikim siwarê meydana wê, lê madem min navê romana *TU* anî ziman, pir di cihê xwe de ye ez li vir wek xwendevanekî bi xwende-

vanê *Nûdemê* binasînim. Nemaze çûnkî li gorî *J. Serheng* berhemên *M. Uzun* hemû hîç û kêrnehatîne. Lê li gorî min romana *TU* çîrokek ji çîrokên jana gelê me ye... *Serpêhatiya* hezaran welatparêzên kurd di zîndan û girtîgehên dijminan de, ew zîndan û girtîgehên ku bi sedan têkoşer û qehremanên welatê me di wan de bi hingavtina laşî î azardanaderûnî hatine kuştin...

Romana *TU* *serpêhatiya* wan xweşmêran û hovîtu û çepeliya dijminên bedkar bi zelalî û ne dafîne ber çavên me.

Ji aliyê dîrokî ve jî romana *TU* têra xwe bûyerên girîng û bi derd û xem, wek êrîş û hatinên dagirkeran û zor û stema hukmên wan qonax bi qonax ta digihê vî zimanê me, bi vî zimanê me yê şîrîn bi kurtî şanî me dide.

Lê ji aliyê ziman ve li gorî min herçend zimanê nivîskar û kêza wî xweş û edebî ye jî, lê kezaxtinêk jê re diviya, herweha hejmarek yan tibabek peyvên biyanî di nêv de heye, nivîskar dişiya bi hêsanî xirarê genimê xwe ê sor ji wan libên zîwanê paqij bike.

Li dûmahiya nivîsa xwe ez bi dilekî xweş silav û spasên xwe bo nivîskarê zîrek *Jêhat Serheng* dişînim, baş bû, wî bi wê nivîsa xwe, rêka bersivdanê li ber min xweş kir û ez gihandim civata xwendevanên *Nûdemê*.

EM XERÎB IN

*Em xerîb in, ne ji vir in
Em akincî ne, ne ji dîl in
Roja derba me li dijmin bê
Gurçikên me pola ne,
dîlên me hesin in
Dayê, dayê, hayê, hayê...*

*Dilo tu hêlîna teyrê Nar î
Dikalî, dinalî, birîndar î
Xwezî wekû dem û dewranê
Ez çûbam Cizîra Botan
Li wî cihî,
Li wî warî
Dayê, dayê, hayê, hayê...*

Celadet ALÎ BEDIR-XAN

Ev strana Celadet Alî Bedir-Xan ji aliyê **Beşîr Botanî** ve gihîştîye me. Beşîr Botanî di derheqa dîroka vê srtanê de weha dibêje: Stranek ji warê bab û bapîran, ji kehniya çanda kurdî, ji awaz û gotinên berê û ji gencîneya hunera resen ya bûye behra min... Ev diyarî xweşîya canê min, digel min dijît û hêzeke pir mezin dide min...

Babê min Sebrî Botanî dibêje ku Mîr Celadet Bedir-Xan carna ji gundê Endîwerê (niha bajar e) bi dûrbînê temaşe li bakurê Botan dikir û ji xwe re distira. Mala Resûl Axa, Haco Axa û mala bapîrê min Temer Botanî digel wî bûn.

Ez hingê 12 salî bûm...

ÇEND HELBEST JI EMERÎKA NAVÎN



Bedirxan EPÖZDEMÎR

Helbest di têkoşîn û jiyana gelan de cihekî pir girîng digire. Weke şûr û mertal, weke çekeke bê hempa rola xwe ya taybetî dileyize. Dibe sebr û sebat ji bo gelek kesan. Li dijî zilm û zordariyê, ji bo jiyaneke wekhev û demokrat xwezgîniye helbest.

Li kîjan aliyê cîhanê kedxwarî û kole-darî hebe, li wir mitelq dengê helbestvanên mêrxas bilind dibe. Ev deng çiqas ji terefê şûr û sînoran ve bêne birîn jî, dîsa

digihîjin çar aliyên cîhanê, dost û hogirên xwe dibînin. Rengê wan, zimanê wan çi dibe bila bibe, li ser lêvên belengaz û feqîran dibin stran.

Emerîka Navîn, serkaniya zilm û zordariyê ye. Gelên wê navçê bi salan bi mêrxasî li ber xwe didin. Tirs û xofeke mezin dixin dilê zordaran, xewa wan direvînin. Hozanên wan yên şoreşger bi helbestên xwe dengê gelê xwe digilînin çar aliyên cîhanê.

Kurdistan û Emerîka Navîn, du navçeyên ji hev dûr in. Lê raman û armancên wan nêzîk, dil bi dil, mil bi mil e. Bi lier tehrî naskirina tevgera azadîxwazên cîhanê ji bo şoreşa Kurdistanê gelek pêwîst e. Sedema vê pêwîstiyê, min xwest ku ez çend nimûnan ji helbestvanên vê navçê pêşkêşî xwendevanên Nûdemê bikim, bi kurtî jiyana wan helbestvanan bînim ziman.

Roberto Sosa, di sala 1930 de li Hondurasê, li bajarê Tegucigalpayê hatiye dinê. Li Îspanya, Kuba û welatên din gelek xelat stendiye.

Roberto Obergo, di 1940'î de hatiye dinê. Di sala 1970,ê de, nêzîkî El Salvadorê, ji aliyê leşkerên Guatemalayê ve hatiye kuştin.

F. Gordillo Cervantes, di sala 1940'î de li Nikaragwayê bûye bîst salî û çûye heqîya xwe.

M. Antonio Flores, di 1937'an de li Guatemalayê hatiye dinê. Ji derveyî helbestan, ew li ser şano û filman jî xebatên bê hempa pêk aniye.

XWEYÎ YÊN BI SIR

General in distînin, dizîvirînin par ve dîkin

deng û bêdengiyê.

Hişk û tîkin

wekî bilindiyên tarî tirsan didin

û hêlînên wan

bi xwînê ji sisiyan diduyan,

bi bêdengiyê ji sisiyan yekî distînin.

Li wê derê, mûyên xwe jî naleptînin.

Bi rê ve dibin diran zêran, bi dîtînayî însan

gelek bi hesasî parêzgirên xwe seyan...

û her kes dizane ku ewanan

Ji aliyekî ve sirê xwe yên sazûmana bilind

teklîhev dîkin.

Bi rengêkî nedîtî ûrên xwe diwerimînin...

General in xwedî û hakimên

zagonan, jiyan û malan.

Eynî wext endamên bi rûmet in

li dêra katolik ya Roman

Roberto Sosa (Honduras)

ÇAVNÊRIYA WANA BIKIN

Çavnêriya wana bikin, derbaskirin rojên xwe

li ser xweliyan mezin dibin

bi bermayiya şewatên xwe.

Biçirînin cilên wan

û hilînin maskên rûyan.

Ewanan in li sûka şelankera

ku difroşin malan,

fêkiyên bi kurm yek dikurtînin.

Weke serseriyên gotinan difirînin

û bi bêbextî kêra xwe diçikînin.

Çavnêriya wan bikin.

Çavnêriya wana bin

li ser xweliya hestiyên me yên şewitî

çawa li xwarinê digerin.

Roberto Obergon (El Salvador)

TIŞTONEK

Du mirî;

yek li ber çavên her kesî,

ne di dilê te kesî de.

Yê mahî li ber çavên tu kesî,

di dilê her kesî de.

F. G. Cervantes (Nikaragua)

(Bersiva tiştonekê dîktator Somoza û qurbanê wî qehremanê gel Rigoberto Lopez Perez e).

HAVANA 59

Ji pir dengkirinê

dengê xwe wînda kir zencîran.

Berbangê zora şevan bir

dûvê xwe xiste nava laqên xwe

û reviya mirin.

Jan bi çargavî çû

şûr li ser mil de

can man.

Bê çav, bê guh

bê çerm

û bê potînên rêş.

Birçûti wînda kir

hezar şehîdên xwe.

Xwedan rez

şalên xwe,

koledar siya xwe

û xulamên xwe.

M. A. Flores (Guatemala)

MUHACIRTÎ Û REWŞA KEÇAN



Şahînê B. SOREKLÎ

Pirraniya merovan ji bo jiyanêke baştir dest ji warên xwe ber didin û diçin li warekî din bi cîh dibin. Ji bo hêviyeke wisa bi milyonan kes di sedsalên 19em û 20em de bûn muhacir û li Emerîka, Keneda, Australya û welatine din bi cîh bûn. Van muhaciran bi xewn û xeyalên mezin ketin rê. Hejmareke ji wan gihiştin armancên xwe. Ji bo hinên din jiyan li welatê nû ne weqa hêsan bû. Divabû ew bi salan li ber xwe bidin, bixebitûn û ji bo jiyanêke xweş bi şev û roj têbikoşin. Hinan ji wan divabû herweha ji gellek ne-

heqîyan tehmûl bikin.

Bicîhbûna li Emerîka, Australya, Keneda û welatine Ewropa ji bo endamên geline ne weqa dijwar bû, ji ber ku çand, tore, ol û şeweya jiyînê li warê nû ji warê wan yê kevin ne pirr cudatir bû, lê ji bo hinên din jiyîna li welatê nû hema-hema bi tevahî ji ya li warê kevin cudatir bû. Bi gotineke din, bicîhbûna li welatekî wek Dewletên Emerîka yê Yekbûyî, Keneda, yan Australya ji kesekî, em bibêjin îrlendî re, gellekî hêsanîr bû ji ya kesekî çînî, hindî, yan ereb.

Ji bo hemî muhaciran, lê bi taybetî ji bo muhacirên ji Rohilata Navîn û welatine Asya û Efrîqa proseya bicîhbûna li welatên nû ne tiştekî hêsan bû. Dema em li vir gotina diwartiyê dikin, mebest bêtir diwartiya çandî û manewî ye. Gelşa herî mezin ji bo nîfşê muhaciran yê yekem pîrsa zaroyên wan bû. Bav û dayên muhacir her di wê tîrsê de bûn, ku zaroyên wan "ji dest wan biçin." Li welatê nû wan bi can û bêhn hewl didan da zaroyên xwe li gor erf û adetên xwe xwedî bikin. Ev tîrsa han îroj jî li nik wan muhaciran heye, yê ku di çend salên borîn de li welatên roava bi cîh bûne. Bêguman muhacirên kurd jî di nav wan de ne. Beşekî mezin ji van muhaciran bi çavekî xirab li ciwanên welatên ew lê dijin dînihêrin û tîrsa wan ya mezin ew e ku zaroyên wan jî "wekî wan têbigihên." Ew bi şeweye gelemper behsa "almanan," "swêdiyan," "australîan,...", dîkin û sinçiyên ciwanên wan "xirab" bi nav dîkin. Ji haliyekî ve ew dixwazin zaroyên wan wek zaroyên welatê ew lê dimînin serkeftî bin, ji haliyê din ve, ew naxwazin zaroyên wan "wek wan" bin. Ev nefreta li dijî çand û erf û adetên

welatê mazûban di demên bêkariyê û bêtirbûna nijadperestiya li dij biyaniyan de zêde dibe. Di demên wisa de beşekî muhaciran xwe di nav “civaka xwe” de ji civaka welatê mazûban îzole dike û hindek ji wan bi şewweke radîkal didin dû olperestiyê.

Bêguman e ku pirsxa xwedîkirina zaroyan ji bo bav û dayan yeke dijwar e. Bêguman e ku, li gor dîtin û ramanên wan, wan maf heye zaroyên xwe wekî ew dixwazin xwedî bikin, lê li milê din, zaroyê muhaciran di nav du benan de dimîne. Haliyekî bîn di destên xwediyê wî/wê de ye, haliyê din di destê civaka nû de ye. Çand û daxwazên bav û daya wî/wê tiştek in. Xwendegêh, hevalên wî/wê û çanda welatê ew lê dijîn tiştekî din in. Zoro dibe xwedan du şexsiyetan. Şexsiyeta li mal û di nav yê xwe de û şexsiyeta li xwendegêhê û di nav kesên din de. Mixabin, hindek bav û day hene ku dixwazin wek bav û dayên wan ew xwedî kirine zaroyên xwe xwedî bikin. Ew hesabê wê yekê nakin ku dem, cîh û şert û mercên îroj bi tevahî cuda ne. Di rewşeke wisa de proseya pêşveçûna zaro ji “herdu dunyan” jî der e, yanê ne wek ya zaroyên welatê kevin e, ne jî wek ya zaroyên welatê nû ye.

Çawa be jî jiyana lawên muhacirên ji welatên Rohilata Navîn gellekî ji ya keçan hêsantir e. Ji bo lawan azadî bêtir e, çûn û hatina wan serbestir e û mafê wan zêdetir e. Nîfşê nû yê keçên muhaciran gellekî dikişînin, pîrraniya caran bêyî ku bikaribin gazincên xwe bi şewweke serbest diyar bikin. Bi taybetî bav û dayên rêya olperestiyêke radîkal li welatê nû dikin ber xwe, bêyî ku haya wan jê hebe,

keçên xwe dikin rewşeke dijwar. Ew wan neçar dikin ku serên xwe biniximînin û li gel xortan nedin nestûnin. Di civakên roava de ev tiştekî ji usûlê der e. Li gel hemî toleransa li holê û rêzgirtina ji olên din re jî, serînixamtin bandoreke kêmtir li şexsiyeta pîrraniya keçan dike. Helbete serînixamtin di civakên welatên musulman de tiştekî normal e, lê li bajarekî wek Stokholmê, Sydney, yan bajarekî din li cîhana roava ev yeka tiştekî ne normal e.

Di xwendegêha ez tê de mamostetiyê dikim de keçeke lubnanî hebû. Ew li Australya mezin bû bû, jîr û jêhatî bû. Hemî xwendekaran ji wê hej dikirin û hevaltiya wê meraq dikirin. Ta sinifa dehem ew her “kapîtana” sinifa xwe bû. Her kesî dizanibû ku ew ê di sinifa 11em de bibe “kapîtana” tevahiya dibistanê. Di rojêke nîvê salê de ew sernixamtî hat xwendegêhê. Tiştekî gellekî mat cîh digirt. Şexsiyeta wê di nav bîst û çar saetan de hat guhetrin. Ew destmala li ser porê wê hatî bi cîh kirin ew kir meroveke din, ne tenê di çavên wê bi xwe de, lê herweha di çavên tevahiya xwendekaran de. Tevî ku di xwendegêhê de hejmara keçên muhaciran ne bçûke jî hevalên wê roj bi roj kêmtir bûn û rojek hat ew bi tevahî îzole bû. Heta keçine musulman jî xwe ji wê bi dûr dixistin. Tevî ku pirsên wisa di rojên îroj de ji bo mamosteyekî dijwar in jî, min rojêkê jê pirsî, eger xwediyên wê ew neçar kiribin da serê xwe biniximîne. Wê got, “na, biryar ya min e.” Lê min dizanibû ev ne rastiya bi tevahî ye. Malbatên rohilata navîn di tektûkên xwe yê di derheqê zaroyan de hoste ne. Ma dayên çend keçan bi zimanekî geh tûj, geh xweş, keçên xwe neçar kirine ku ew li gel kesekî

ne bi dilê wan bizewicin! Di zimanê inglîzî de gotineke di cîh de ji bo tektûkên wisa heye: "Emotional blackmailing." Nîfşê nû ji keçên muhacirên ji welatên rohilat, herweha ji welatine başûr û rohilatê Ewropa neçar dibin gellek tiştên ne li keyfa wan ji bo xatirê, yan ji tîrsa ji, xwediyên xwe bikin. Hindek ji wan li welatê nû jî neçar dibin li gor daxwaza bavê xwe 17 salîn bizewicin, li gel kesekî ku ew nedinasin.

Di filimeke têlvîzyonêye dokumenter de (THE ARABS: ABC TV.), xwendekareke şerîetê li Urdunê dibêje, "ez li dij wê yekê me ku keç û law li gel hev kar bikin, ji ber ku dema keçek û lawek li cem hev bin, ew tenê di tiştêkî de difikirin." Ramana vê keçê ramana hejmareke mezin ji xelkê Rohilata Navîn e. Bêguman e ku rastiyek di vê gotinê de heye, lê ev rastiya xwe bi wan civatan ve eleqedar dike ku tê de keç û law ji rojên zarotiya wan de ji hevûdin tîyên veqetandin. Li welatên roava keç û law ji destpêkê de li gel hev dilîzin, dixwênin û kar dikin. Ev "kompleksa" cînsî li nik wan nûn e.

Ji bo pîrraniya endamên civakên welatên roava neteweyek li ser du milan e, milek ji peyan pêk tê û milê din ji jinan. Feylesofekî gotiye, "Pîvana pêşveçûn û paşvemayîna civakekê wekheviya di nav jin û peyayên wê de ye!" Endamên civakên Rohilata Navîn, bi taybetî olperestên radîkal, çîqa iddîa bikin ku şûna jinê li nik wan yeke taybetî ye jî, jin ji bo wan her wek jina mîrekî, daya zarokên wî û malxeya mala wî dimîne. Di navbera

jinan û peyan de dîwar her dimîne: "jin cihê, peya cihê." Li welatên roava jî muhacirine dixwazin vê yekê di derheqê keç û jinên xwe de tîxin, û dixin, pratîkê. Ev yeka jî ji bo dûredemê zirarê digihîne berjewendiya keçan û wan di civaka wan de, yanê li welatê ew tê de mezin dibin de, îzole dikin.

Li gel hemî gotinên li jor jî, di nav keçên nîfşê nû de hindek tîyên dîtûn ku di xwendin û daxwazên xwe de bi ser dikevin, ji dest wan tê der ew biryara bav û dayên xwe bidin guhertin û bi îsrar gavên ber bi pêş bavêjin. Jê bêtir, merov bixwaze, nexwaze, nîfşê yekem îxtiyar dibe û diçe, nîfşê duyem ta radeyekê di bin bandora wan de dimîne û nîfşê sêyem, yan çarem dest pê dike bibêje, "bapîrên min ji filan neteweyê bûn." Ji bo muhacirên kurd, ku îroj ne dewlet û ne îmkanên layiqî nîfşê nû li dervayê welêt bi hejmarên mezin hene, eger endamên nîfşê çarem rojekê bibêjin, "bapîrên me kurd bûn," ew jî tiştêkî baş e.

Wekî me li jor diyar kir, kesên muhacir bi armanc û hêviyên mezin berên xwe didin warên nû, lê li welatê nû serên wan li dîwaran dikevin û ew baş tê digihên ku serkeftina di jiyane de li ku be jî ne hêsan e. Gellek ji muhaciran her dibêjin, "em ji bo xatirê zaroyên xwe derketin," ew hêviyên pîr mezin ji zaroyên xwe dikin. Mixabin, diwartiya zimên, cudabûna jiyane û şert û mercên li welatê nû gellek caran li pêş pêşveçûna zaroyan dibin asteng û ew di xwendina xwe de wekî ku xwediyên wan ji wan hêvî dikin bi ser na-

kevin. Lê rewş ne ji bo hemî zaroyên muhaciran wisa ye. Di nav wan de ciwanine tê digihên ku dikarin gavên mezin ranin û dibin serbilindiya, bav, day û civakên xwe. Serpêhatiyên zaroyên muhaciran yên di jiyana xwe de li welatên wekî D.Y.E., Australya, Keneda, welatine Ewropa û cîhine din bi ser keftinê bi hezaran in. Ev serpêhatiya li pêş yek ji wan e. Ew di kovara kuwêtî, EL EREBÎ de (Hejmar 312:11/94: nivîsandina M. Nasîf) di bin sernivîsara CIRALDÎN, Serpêhatiya Lixwegerîna Jinekê de hatibû weşandin. Min jî ew ji xwendevanan re wergerandiye kurdî û navê "Serkeftina Keça Muhacirekî" lê kiriye. Serpêhatiya Ciraldîn Firaro aşkere dike ku heta li welatekî wek D.Y.E. be jî cîhan ta radeyekê hên cîhana peyan e, lê çawa be jî, li welatên roava jinan di warê wekhevîyê de gavên mezin di bîst salên borîn de ranan.

SERKEFTINA KEÇA MUHACIREKÎ

"Ew delala bav û diya xwe bû. Bavê pîr jê hej fikir, listok û diyarî jê re dikirîn. Diya wê li ser wê bi tirs bû û hewl dida wê heta ji bayê gemarîn yê ew bajarê bi xelkê û otomobîlan dagirtî jî biparêze. Dayik dîm dibû dema wê didît dergûşa wê li ser erdê dixuşêye; ew ditirsiya mîkrob û gemara erdê wê nexweş bikin.

Ev malbata biçûk yek ji hezaran bû ku ji Ewropa, di dema ku tê de cîhan di rewşa aborî ya herî xirab re derbas dibû, berên xwe dabûn cîhana nû, Emerîka. Çûna

wan di rojên tunebûnê, bêkariyê û birçîbûnê yên salên 30'yan de dest pê kir. Firaro, jina wî û herdu zaroyên biçûk, Karla û Cirard, li bajarê Nûyorkê di nav qirecira tax û kolanên wê de li cîhekî digeriyan. Keça şêrîn, delala bav û daya xwe, bokeya çîrokê, hên nehatibû cîhanê.

Li dawiyê malbat di xanîkî biçûk de li beşekî Nûyorkê bi cîh bû. Dû re Firaro li bajarokekî biçûkî li ser çemê Hedson di xew de, bajarokekî bi navê Newberg, xwarîngeheke biçûk vekir. Wî di wir de etûrên arzan û xwarina sivik difrotin. Di ew demên xirab û dijwar de xwarin ji hertiştî baştir dihat frotin. Çiqa rewşa xelkê xirab bejî, bêtî xwarin nabe. Xwarîngeha Firaroyê îtalî baş çû û bi ser ket. Jina wî biryar girt, ew ê li mal bimîne, da li zaroyên xwe binihêre û ji mêrê xwe re xwarina xweş û dewlemend amade bike, mêrê ku westa û mest li dû ku ro li ser rojeke drêj û bi kar dagirtî diçû ava digihîşt mal. Gotinê naxwaze, xwarina wê ji xwarina sivik û arzan ya ku mêrê wê difrot muşteriyên xwe der bû.

QEDERA BÊBEXT

Lê qedere zalim e. Sê sal bû bûn ku ev malbata muhacir ji Îtalya bi pê rizqê xwe ketibûn û gihîştibû ev cîhana nû dema ku bêtarek hat serê wê. Di qezake otomobîla Firaro bi xwe dajaoûtî de kurê wan yê biçûk, Cirald, mir. Dayika bi mirina kurê xwe gellekî êşiyayî rakirin nexweşxaneyekê ji bo rewşa wê ya nefsi. Ew diqûriya û digot:

“lîstokên wî ji xwe bîr mekin. Wan jî bibin li gel laşê wî yê bçûk têxin gorê.”

Li dû vegera wê ji nexweşxaneyê, wê her nepejirand ku Cîraldê biçûk çûye û nema tê. Sibe bi sebe wê kincên wî dici-vandin û li gel kincên xwûşka wî karla dişuştin. Kinc her pak bûn, kesekî ew li xwe nedikirin, lê wê wek rojên ber mirina wî ew her roj dişuştin.

Heta du salan li dû mirina Cîrald jî dayika di şînê de nedipejirand biçe kilîseyê. Wê ji mêrê xwe re digot: “Na, ez naçim nimêja li kilîseyie. Min kirina nimêjê ji xwe bîr kiriye.!” Ew jineke katolîke olperwer bû. Ta vê radeyê vê bêtarê bandor li jiyana wê kiribû. Mirina dergûşê wê brîneke kûr di dilê wê de hanîbû holê, brîna ku bi derbasbûna rojan û bîranîna kurê mirî re heku diçû di dilê wê de kûrtir dibû.

Rojekê pijîşkê malbatê di guhên Firaro de gut: “Tenê hatina zarokekî nû dikare wê ji şîna wê derxîne!” Û dayik bi du canan bû. Rojên ducaniya wê gran û hêdî derbas bûn ta ku di 26’ê tebaxa 1935’an de dergûşa nû, keçek, gihîşt. Diya wê navê Cîraldîn li wê kir, ku ji navê brayê wê “Cîrald” hatibû, kurîkê ku nav û wêneya wî her di serê wê de bûn.

KOÇKIRINA BAVÊ

Heyşt sal li ser bûyina Cîraldînê derbas bûn, nebûn, û qederê careke din bêtarek hanî serê malbatê, bavê wê mir. Zaroka biçûk li dû mirina bavê xwe bi dûjiya salekê nexweş ket. Ew li ser şelta xwe

rûdinişt û digot: “Bavê min mir,... Jiyana bêtî wî ji bo min ne çî jiyana e. Bavo ji min pirr hej dikir. Bi bûyîna min re Cîrald di çavên wî de careke din vejîya!”

Li dû mirina bavê Cîraldînê mala wan bar kir û li taxa Bronx bi cîh bû. Diya wê neçar ma biçe kar, da bikaribe herdu zaroyên xwe xwedî bike. Karê wê çêkirina çînan bû li ser kirasên jinan. Ew gellekî dixebitî da bikaribe qîza xwe Cîraldîn têxe xwendegheke Katolîkî, şûna ku tenê zaroyên dewlemendan dikaribûn lê bixwênin. Ew bi mehan di ber dukana goştîroş re derbas dibû bêtî ku goştine ji xwe û zaroyên xwe re bikire, ji bo xatirê ku bikaribe mesrefê xwendina Cîraldînê bide.

XWENDINA QANÛNÊ

Cîraldînê xwendina beşê lîseyê kuta kir. Wê dixwazt bibe rojnemevan, lê ji ber destengiyê nikaribû biçe zanîngehê. Wê dest bi mamostetiya zaroyên biçûk kir. Li dû derbaskirina çend salan di vî karî de ew jê aciz bû û biryar girt dest jê berde û biçe li zanîngehê qanûnê bixwêne.

Rojekê hevalekî wê jê re got: “Ev cîhê te di zanîngehê de ji bo xwendina qanûnê bi dest xistiye divabû yê peyakî bûya. Gelo haya te jê hebe?” Cîraldînê bersîva wî da û gotê: “Erê, haya min jê heye. Ez bextewar im bi wê yekê.”

Li dû kutakirina beşê qanûnê Cîraldîn li gel John Zakoro, muhacîrekî îtalîyî xanîfroş, zewicî. Tenê daxwazeke wê ji wî hebû, ku bila li dû zewacê her navê

malbata bavê xwe, "Firaro" hilgire.

Bi drêjiya salan wê meh bi meh tiştêk wek diyarî dida diya xwe. Hin caran wê ji dadgehê rasterast berê xwe dida mala diya xwe û pereyên ku wê li dû kutabûna proseyeke dadmendî bi dest xistibûn didan wê, da ew li gor daxwaza xwe beşekî jê bibe. Dayik ji kêfxweşiyê digiriya. Ew dara biçûk ya ku wê çandibû û di bin qanadên xwe de mezin kiribû îroj bi ber bû bû. Wê ji pereyên qîza xwe tenê çend dolar dibirin, eniya wê radimûsa û digotê: "Ji bîr rameke ku tu nuha bi mên î û tu ê bibî day. Zaroyên te ê ji min bêtir hewcedarên pereyên te bin."

ŞÛN JI BO JINAN NÎN E

Li dû serkeftina Ciraldînê di karê ebûqatiyê de bi demekê ew rastî astengine hat. Van astengan ew gotina hevalê wê yê xwendinê hanî bîra wê, ku şûna wê di beşê qanûnê yê zanîngehê de divabû ji bo xortekî bûya. Ciraldîn pê hesiya ku hewcedarê ebûqatan ji wê bi dûr diketin ji ber ku ew jin bû. Van astengan di destpêka sala 1960'î de cîh digirtin, ew hên ne bû bû day. Wê biryar girt xwe bi kenîf paş ve bikişîne û bibe malxeya malê. Li dû çend salan ew bû diya sê zaroyan, Lora, Donna û John. Wê xwe bi tevahî da ber karê xwedîkirina wan, û wêneya diya wê ya ku ji bo xwedîkirina wan weqa tê koşiya bû ji bala wê nedîçû. Wê digot, "şansê zaroyên min ji yê min çêtir e; ez zarokeke belengaz bûm, bi taybetî li dû mirina bavê min, lê ew ne hewcedarên dravan in." Wê

ev gotina xwe ji hevalên xwe re dikir, dema wê zaroyên xwe dibirin mixazeyên bedew û navdar di taxa pêncem ya bajarê Nûyorkê de, da ji wan re kincên nû bikire.

Wê perwerdekirina zaroyên xwe hildabû ser milên xwe, lê dema keça wê ya mezin xwazt fêrî avjiniyê bibe wê di tatûla havînê de hemî zaroyên taxê vexwandin fêrbûna avjiniyê û ew hemî li gel zaroyên xwe fêr kirin. Mala wê li FAIR ISLAND bû, li kêleka derya.

RÛREŞIYA JIYANÊ

Ciraldîn careke din li meydana dadmendiyê vejeriya, ya ku wê ji "peyan" re hîştibû, lê îcar ne wek piştigira hewcedarên ebûqatan. Wezîfeya wê nuha berhevkirina îspatan bû ji bo tawanbarkirina kesên mucrim. Ew di dadgeha bajarê Queens de ebûqata giştî(muddeîlam) bû.

Rojekê wê xwe di salona dadgehê de raste rast li hember yek ji mezintirîn cerîmetên merovan dît: "peyakî tadeya cinsî li zarokeke pênc salîn kiribû!" Wê ew zaroya rakir û dest bi girî kir, bêtî ku bikaribe xwe ragire. Giyanê wê di destên wê de dilerizî û çavên wê yên tiji tirs bi pirsan dagirtî bûn.

Xew wê şevê neket çavên Ciraldînê. Wê nikaribû wêneya ew keçika bizdoyîn bûyî ji hişên xwe bavêje der. Ji vir û şûn ve wê soz da xwe, ew ê wek ebûqata gelemper şerekî li dij mucriman dest pê bike, bi taybetî li dij wan kesan yên neheqiyên li zaroyan û ixtiyaran dikin. Ev curma di derheqê ev zaroya bêhêz de cîh girtî û

bûyerên bi vê nolê bûn sedema guhertina rêya wê di jiyane de; wê ramanên xweperestên li şûn hîştin û rêyeke nû da ber xwe, rêya piştgiştina pirsên karkiran û belengazan. Wê nuha digot, “dostên min ewan in, yên ku di binaniya civakê de dijîn, bi taybetî merovên çermreş yên ku weqa ji ber nerindiya nijadperestiyê dikişînin.”

Di rojên kurt yê sereketiya Kenedî de Ciralîn yek ji wan kesan bû yê ku serê meşa bi hezaran ji reşên Emerîka kişandin, da biçin li pêş Koşka Spî xemgîniya xwe diyar bikin.

ENDAMA KONGIREYÊ

Serokekî reşan di derbareyê wê de gotibû, “çiqa ew çeleng be jî, çiqa rûyê wê nêşana afretê be jî, ew bi têkoşîna xwe peya ye.” Li gel vê gotinê û tevî xebata wê ya di warê dadmendiyê de jî, Ciralînê hên dest bi karê siyasî nikaribû. Di sala 1978an de nûnerê kongireyê yê herêma QUEENS biryara derketina teqawîtê girt. Li vir wê bi xwe re got, “ez ê li hember ‘peyê’ derkevim meydanê û xwe wekî nûnera Partiya Demokrat ji bo şûneke di kongireyê de têxim listeya hilbijartinê. Wê wisa bawer dikir ku serekên vê partiyê yê herêmê ê pişt wê bigirtana. Lê ew gellekî dilsar bû dema pê hesiya ku van kesên wê pişt xwe bi wan girêdabû li dijî wê yekê ne ku jinek têkeve kongireyê. Ciralîn derket tax û kolanan û di bin germahiya royê ya bi tîn de îmzeyên piştgiriya civandin. Hinan digotin erê, hinan digotin na, lê ew ji rêya xwe eware

nebû û her berhevkirina navan domand ta ku Partiya Demokrat nûnertiya wê peji-rand. Û Ciralîn di hilbijartinan de bi ser ket û bû endama parlemana Dewletên Yekbûyî yê Emerîka bi hêviya ku li dij gellek ramanên siyasî yê kevneperest, ku li D. Y. E. hên di paratîkêde bûn, têbikoşe.

Dû re hinan xwaztî ku Ciralîn ji bo wezîfeya şûngira Serekê D.Y.E. têkeve hilbijartinê. Ew bû bû senatoreke bi nav û deng, lê li gel wê jî wê malbata xwe ji xwe dûr nehiştibû. Li gel sekeftin û pêşveçûna wê di vê civaka ku tê de hên sereketî di dest peyan de bû, wê rola xwe wek day û jin ji bîr ranedikir. Ew ji bo xatirê wezîfeya xwe di apartmaneke biçûk de li Waşington dima, da nêzîke kongireyê be û bikaribe bi karê xwe rabe û nûnertiya yê ew hilbijartinî bike, lê ta ji dest wê dihat ew her li Nûyorkê vedigeriya da li kêleka zaro û mêrê xwe be.

Gelo mêrê wê li hember serkeftin û pêşveçûna jina xwe çi digot? Ew her di pişt wê de bû, bi wê re bû, li tenîştê wê bû. Jokn Zakaro digot, “xelkê navê ‘Mister Firaro’ li min kirine, yanê paşnavê jina min didin min. Ev yeka min naxeyidîne. Ez bi vî navî serbilind im, ji ber ku ez bi jina xwe serbilind im. Ew meroveke têkoşer e. Rêya wê ji newalê dest pê kiriye, lê wê xwe gîhandiye jor. Ew jineke bi îsrar e û di têkoşîna xwe de her bi ser ketiye ”.

Jean-Paul Sartre

Jean Paul Sartre di sala 1905'an de li Parîsê, ji malbateke bûrjûvaziya mezin hatiye dinyayê. Sartreyê ku hê di salên xwe yê zaroktiyê de bal û meyla xwe berdide ser nivîsandina romanên, piştî xwendina xwe ya lîseyê, dikeve dibistana mamostetiyê ya bilind, ya ku giraniya wê li ser filosofiyê bû; *Ecole normale Supérieure*. Ew bi serfirazî dibistana xwe diqedîne û mîna mamosteyê felsefê dest bi kar dike. Paşê ew demekê diçe Almaniyayê û li Berlînê li ser filosofên mîna Heidegger, Kierkegaard, Husserl û Hegel dixebite.

Herçiqas filosofên berî Sartre jî li ser felsefeya *Existentialismê* rawestiyabin jî, diîsan ev felsefeya han bêtir bi navê Sartre belav bûye û îro bûye mîna paşnavê wî. Sartre di felsefeya xwe de azadiya mirovan pêwîstiyekê dibîne û existentialismê bi humanismê ve girê dide.

Kevnebawermendê felsefeya nihilismê, mîrê filosof û feminista navdar Simone de Beauvoir, hevalê Albert Camus yê destpêkê, xelatgirê Nobelê yê edebiyatê Jean Paul Sartre, filosofekî edebiyatvan û edebiyathez bû. Wî digel berhemên xwe yê felsefî, gelek berhemên edebî jî



nivîsandine. Hin ji berhemên wî yê sereke ev in:

Dîwar (1939), *Deriyên Girtî* (1944), *Riyên Azadiyê*, *Miriyên Bêgor* (1946), *Existentialism humanism e* (1946) *Destên Qirêj* (1948), *Girtiyên li Altona* (1960), *Gotin* (1964) û hwd.

Di berhemên Sartre yê edebî de şoperiyên felsefeya wî baş dixuyin. Di vî warî de ev çîroka wî ya bi navê "Dîwar" (*Le Mur*) ku me ji bo xwendevanên NÛDEM'ê wergerandiye kurdî, mîna keke baş e. Ev çîroka ku bi forma kesê yekemîn hatiye nivîsandin û di derheqê çend girtiyên ku li bendî gulebarandina xwe ne de ye, bê şik yek ji çîrokên Sartre ya herî navdar û herî xweş e.

DÎWAR

Jean-paul SARTRE

Wan em bi dehfan xistin hundurê odeyeke mezin û spî. Ji ber şewqa ku ji hundur li çavên me xist, çavên min kutkutîn. Paşê maseyek li ber çavên min ket. Li pişt masê çar peya hebû. Ew sivil bûn, li kaxezan dinihêrîn. Wan girtiyên din avêtibûn dawiya odê. Ji bo ku em biçûna ba wan, diviyabû em biçûna seriyê odê yê din. Min gelek ji wan nas dikirin, yên ku min nasnedikirin jî, biyanî bûn. Herdiwên ku li pêşiya min rawestiyabûn, sergirover û zerik bûn. Ew dişibiyan hevdu. Ez texmîn dikim ew fransîz bûn. Yê hûrik her pantorê xwe dikişand jor: ev e, ew ê ji ber esebîtiyê be.

Vê yeka han nêzikî sê saetan ajot. Ez şaş bûbûm û serê min vikî vala bû. Lê hundurê odê baş germ bû, ev yeka han jî ne ku li xweşa min nedichû: ev bîst û çar saetên me bûn ku em bûbûne weke bûzê. Muhafizan girtî yek bi yek dibirin pêşiya rêzemasê. Wê çaxê çar peyan, ji girtiyan nav û karên wan dipirsîn. Piraniya caran

ew zêde dîr nedichûn û mîna "Ma tu beşdarî sabotajên depoyên muhîm bû yî?", "Tu nehê mehê, sibehê zû li ku bûyî, te çi dikir?" ji vir de û wir de pirs dipirsîn. Wan li bersivan guhdarî nedikirin, ew mîna ku guhdarî dikirin jî nedixuyan. Ew demekê bêdeng diman û rasterast li pêşiya xwe dinihêrîn, paşê dest bi nivîsandinê dikirin. Wan ji Tom pirsîn, ku bê ew bi rastî di yekîtiya navneteweyî de xebitî ye an na. Ji ber kaxezên ku di bêrika Tom de hatibûn girtin, wî nikanîbû tiştek bigota. Wan tiştek ji Juan nepirsîn, piştî ku Juan navê xwe got, wan demek dirêj nivîsandin.

- Yê anarşîst birayê min Jose ye, Juan got. Hûn bi xwe baş dizanin ku ew êdî ne li vir e. Ez ne ji tu partiyê me, ez qet bi siyasê ve mijûl nebûme.

Wan bersiv nedan. Juan dîsan got:

- Min tiştek nekiriye. Ez naxwazim bi agirê hinin din bişewitim.

Lêvên wî dilerizîn. Gardiyanekî ew hiş kir û ew bir. Dor hatibû ser min:

- Navê te Pablo Ibbieta ye ?

- Erê, min got.

Mêrik li kaxezan nihêrî û ji min pirsî:

- Ramon Gris li ku ye ?

- Ez nizanîm, min bersiv da.

- Te ew ji şeşê mehê heya nehê mehê li mala xwe veşartiye.

- Na.

Wan kêlîkekê nivîsandin û gardiyanan hatin ez birim. Tom û Juan li korîdorê di navbera du gardiyanan de rawestiya bûn. Em meşîyan. Tom ji gardiyanekî pirsî:

- Wê niha çi bibe ?

- Wê çi bibe ? gardiyan jî pirsî.

- Ev lêpîrsînek bû an jî hukûm bû ?

- Ev hukûm bû, gardiyan got.

- Baş e, wê niha çi bikin ji me ?

Gardiyan bi xavî bersiv da:

- Wê hukmê we di hucreyên we de bi we bêtine zanîn.

Hucreyên ku dabûn me, bi rastî jî yek ji serdabên nexweşxanê bû. Ji ber herikîna bê hundur ecêb dicemidî. Hemû şevan em dibûn mîna bûzê û bi rojan jî jê ne çêtir bû. Min pênc roj di zîndaneke ku ji dema kevin de mabû, derbas kirin. Ji ber ku gelek girtî hebûn û cih kêm bû, hema li ku bûya ew bi cih dikirin. Ez ji ber cihê xwe ne gilîdar bûm, min ne sar bû, lê ez bi tenê bûm. Gava demeke dirêj jî wilo dom dike, mirov hêrs dibe. Li serdabê hevalên min hebûn. Juan qet nedipeyivî. Ew ditirsiya û bi qasî ku ew nikaribe tiştekî bibêje, ew xort bû. Tom peyvker bû û bi spanyolî jî pirr baş dizanibû.

Li mahzenê yanekî ji text û çar şeltên tijî ka hebûn. Gava gardiyanan em anîn û li wir berdan, em rûniştin û bê deng rawestiyân. Piştî demekê Tom:

- Karê me xerab e, got.

- Ez jî wilo texmîn dikim, min got. Lê bi min wilo tê ku ew ê tiştekî bi yê biçûk nekin.

- Ew nikarin tiştekî têxine stûyê wî, Tom got. Ew tenê birayê milîtanekî ye, ne tiştekî din.

Min li Juan nihêrî: wilo dixuya ku tiştek bihîstibû. Tom dîsan peyivî:

- Ma tu zanî bê li Saragosseyê çi kirine ? Wan peya li erdê dirêj kirine, paşê bi kamyonan di ser wan re derbas bûne. Yekî Fasî î qaçax ev ji me re got. Tê gotin ku ji bo ku ew gulleyan xerc nekin wan wilo kirine.

- Ma ew bi vî awayî jî benzînê xerc nakin, min gotê.

Ez bi Tom re hêrs bûbûm. Diviya bû wî wilo negota.

- Kardarên ku li ser rîyan digerin hene, wî got û dom kir: ew rewşê di çav re derbas dikin, destên wan di bêrîkên wan de ne û cigareyên wan jî di devê wan de... Ma tu dibê ew ê karê wan biqedîne ? Ez ê dêhn bibim. Ew guh nadin peyva wan a bi qîj û wîj. Di saetekê de çend caran ? Dibêjin ku cara pêşî yê ji Fasê nikarîbûye devê xwe bigire.

- Ez bawer nakim ew ê li vir jî wilo bikin, min got. Qet nebe ew ê bi rastî jî nexwazin zerarekê bidine cepxanê.

Ji taqa girover ya li milê çepê, ku di zikê avahiyê de ber bi esmên ve hatibû vekirin û di çar qulikên hewayê de şewq dikete hundur. Di vê qulika girover ya ku mîna kemînekê her dem girûbû de komir berra hundur didan. Tam di ser taqikê re tebeqek toz hebû. Wan ew komira han ji bo germkirina nexweşxanê anîbûn, lê bi destpêka şer re, wan nexweş ji wir dabûne derxistin û ew komir jî êdî bi kêrî tiştekî nedihat. Ji ber ku wan ji bîr kiribûn, ku ew ê taqikê bigirin, baran di taqikê re dikete hundur.

Tom lerizî:

- Xwedêyo, ez dilerizim, got. Va ye dîsan dest pê kir.

Ew rabû ser xwe û wî dest bi hereketan kir. Bi her hereketeke wî re, gomlegê wî ji ser laşê wî yê spî û bi pirç ji hev dibû. Wî xwe li ser piştê li erdê dirêj kir, çimên xwe ber bi jor ve bilind kirin û bi meqeskî hereket kir. Tom qut î qalind bû û bi bez bû jî. Ez difikirîm çawa ku wê gulle û singûyên tivingan di gilokek rûnê nîvişk de herin, ew ê wilo jî di laşê Tom yê têrgoşt re herin. Ger Tom sistopisto

bûya, ez ê wilo nefikiriyama.

Min ewqasî ne sar bû, lê mîna ku milên min û çimên min ne yên min bûn. Di nav re mîna ku tiştin min kevin bûbin, ez li dora xwe li çakêtê xwe digeriyam. Paşê ji nişka ve, dihate bîra min ku wan çakêt nedabûn min. Ev yeka han hê xerabtir bû. Wan kincên me ji bo ku bidin eskerên xwe ji me stendibûn, tenê gomleg li me hiştibûn û yek jî ev pantorên ji cawê spî, ku nexweşan di nava havînê de li xwe di-kirin. Piştî demekê Tom rabû ser xwe û bi uf û kuf hat li ba min rûnişt.

- Maşalê tu germ bûbe ?

- Ji ku ? Bêhna min çikiya.

Saet li dor heştê êvarê, komutanek û du esker ketin hundur. Di destê wî de komek kaxez hebû. Wî emir li gardiyan kir:

- Navê van hersêyan çi ne ?

- Steinbock, Ibbieta, Mirbal, gardiyan got.

Komûtan berçevka xwe da ber çavên xwe û li lîsteya di destê xwe de nihêrî:

- Steinbock... Steinbock... Ev e. Cezayê kuştinê lê hatiye birrîn, tu ê sibehê zû bê gulebaran kirin.

Dîsan nihêrî:

- Herdiwên din jî eynî ne, got.

- Çênabe, Juan got. Ne ez im.

Komûtan bi awayekî ecêbmayî li wî nihêrî:

- Navê te çi ye ?

- Juan Mirbal e, got.

- Temam, va ye navê te li vir nivîsandîye, komûtan got. Cezayê kuştinê li te hatiye birrîn.

- Mîn tiştek nekiriye ku, Juan got.

Komûtan milên xwe hejandin û dage-riya ser min û Tom.

- Ma hûn Baskî ne ?

- Na, em ne Baskî ne.

Mîna ku bêhna wî teng bûbe.

- Ji min re gotin ku sê hebên Baskî ne. Ez nikanim li dû wan bigerim û zemanê xwe winda bikim. Ji xwe hûn keşeyan naxwazin ?

Me bersiva wî neda. Komûtan peyivî:

- Ew ê niha doktorekî belçikî were. Emir li wî hatiye kirin ku ew şevê bi we re derbas bike.

Bi eskerkî silav da û derket.

- Erê, min got. Tiştê ku bû, bi Juan bû.

Min ev yeka han ji bo ez rastiye bibêjim, digot, lê min ji Juan hez nedikir. Rûyekî wî yê ziravokî hebû, lê tîrs û ezêb rûyê wî ji rûyîtu derxistibû, hemû xetên wî berbat kiribû. Ew heya sê rojan lawikekî bi ruh bû, dikarîbû bihata hez kirin. Lê ew niha dişibiya qûnekekî kal, çi biba jî, min bawer nedikir ku ew ê careke din bi ser xwe de were, ciwan bibe. Nîşandayîna merhemetek biçûk ya li hemberî wî, dê ne xerab bûya, lê merhe-metê dilê min dixeland, her ku diçû bi min re tîrs hişyar dibû.

Wî gotinek jî negot, lê rûyê wî bû mîna xweliyê. Dest û rûyê wî mîna xweliyê bûn. Ew dîsan li cihê xwe rûnişt û bi çavên xwe yên ku fireh vebûbûn li axê nihêrî. Tom pirr dîlpak bû. Wî xwest ku yê hûrik hemêz bike, lê wî rûyê xwe qermiçand û xwe bi sert bi paş ve kişand.

- Berde, min bi dengêkî nizim got. Tu dibînî wextî ew bigirî.

Tom bi dilşewatî stûyê xwe xwar kir. Ji dilê wî hatibû ku ew çûço haş bike. Dê ev yeka han ew mijûl bikira û dê xwe ji bîr bikira. Lê vê yeka han ez aciz dikirim, ez qet li mirinê nefikirî bûm, ji ber ku firsendeke wilo çênebûbû, lê niha firsend hebû û

piştî ku firsenda fikirandina wê hebû, ji bo çî mirov ê tiştin din bike.

Tom peyivî:

- Ma tu zerar gihandiyê wan ? wî ji min pirsî.

Min bersiv neda. Wî got ku wî ji serê tîxaxê û bi vir de şeş caran zerar gihandiyê wan. Wî baş behsa rewşê nedikir û min didît ku ew naxwaze behs ji bike. Min jî bi temamî nikarîbû pêk bianiya, min ji xwe dipirsî bê wê zêde êş bête kişandin an na. Ez li gulleyan difikirîm. Min xeyala germahiya wan ya di bedena xwe de çêdikir. Ev hemû li derveyî pirsê rastûn bûn, lê ez sakîn bûm. Ji bo fêhmkirina vê yekê li pêşiya me şevê hemû hebû. Tom piştî demekê peyva xwe birî û min di bin çavan re li Tom nihêrî. Min dît ku ew jî bûye mîna xweliyê û ketiyê rewşê be-lengaz. "Dest pê kir" min xwe bi xwe got. Hema hema bûbû şev. Di qulikên hewayê de û li ser koma komirê şewqeke mirî hebû û vê li bin esmên lekeyek mezin çêdikir. Min di taqîka zikê avahiyê de hewka stêrkek didît. Wê şev vekirî û sayî bûya.

Derî vebû û du gardiyan ketin hundur. Bi dû wan de jî zilamekî kej î unîformayekî beljîkî lê bû, dihat. Silav da me.

- Ez doktor im, got. Min emir girtiye ku ez di rewşên wilo bi eziyet de, li ba we bim.

Dengekî wî ê xweş û kubar hebû. Min jê re:

- Tu hatiyî li vir çî bikî ? got.

- Ez xwe dixime şûna we. Ji bo ez giraniya van çend saetên we sivik bikim, tiştên ji min bînin ez ê bikim.

- Tu çima hatiyî ba me ? Hinin din jî

hene, nexweşxane ji wan tije ye.

- Wan ez şandime vir, bi ecêbmayî got.

- Ax! Ma hûn dixwazin cigarê bikişînin ?

Wî cigarên îngilîz û puro keremî me kirin. Lê me red kir. Min li hundurê çavên wî dinihêrî û ew mîna ku aciz bû dixuya. Min jê re:

- Ji bo ku dilê te bi me dişewite û tu bi me dakevî, tu nehatiyî vir, got. Ji xwe ez te nas dikim. Roja ku wan ez girtim, min tu bi wan re li hewşa eskergehê dît.

Ez ê hê jî bipeyiviyama lê ji nişka ve tiştêkî ku ez ecêbmayî hiştim bû: Hebûna doktor a li vir, kir ku ez êdî bi xwe dane-kevim. Bi pirranî gava ez bi ser yekî de dîherim, ez wî rehet nahêlim. Dîsan jî xwesteka peyvê bi min re nema, min milên xwe hejandin û berê xwe guhert. Min piştî demekê serê xwe rakir, min dît ku ew bi awirên xwe min di çav re derbas dike. Gardiyan li ser mîndereke gîhê rûniştûbûn. Zir Pedroyê sistopisto tiliyên xwe yên nişanê li hev digerandin, yê din jî ji bo ku ew ranezên car caran serê xwe tevdilivand.

- Ma hûn ronahiyê dixwazin ? Pedro bi carekê ve ji doktor pirsî. Doktor jî bi serê xwe "erê" got. Ez difikirîm ku doktor mîna dareke berûyê bêaqil e, lê bêşik ew ne dilgemaî bû. Gava min li çavên wî yên sar û şîn nihêrîn, bi min wilo hat ku bi vî peyayî re kêmasiya hêza xeyalan heye. Pedro derket û bi lampeyek petrolê ve vegeriya. Wî lampe danî qorziya rêzê. Şewqa wê kêmbû, lê ji qet nebûnê çêtir bû. Şeva çûyî wan em di tariyê de hiştibûn. Min demekê li xelekên şewqê yên ku li zikê odê çêbûbûn, nihêrî. Ez kirî ji kêfa bifiriyama. Paşê ez bi carekê ve bi

ser xwe ve hatim, xelekên şewqê winda bûn, min xwe di binê giraniyeke mezin de hîs kir. Ev ne fikra mirinê bû, ne jî ya tirsê bû: ev tiştekî bê nav bû. Hestiyên hinarîkên min dişewitûn û serê min berbat bû.

Ez veciniqîm û min li herdu hevrêyên xwe nihêrî. Tom serê xwe di nava destên xwe de veşartibû, lê belê min paş stûyê wî yê qalind û spî didît. Juanê biçûk di rewşeke gelekî xerab de bû, devê wî vekirî bû û firmikên pozê wî dilerizîn. Doktor nêzîkî wî bû û mîna ku dixwest wî bi ruh bike destê xwe danî ser milê wî: lê awirên wî sar bûn. Paşê min dît ku destê yê beljîkî bi dizîka ji ser milê Juan daket ser zendê wî. Doktor zendê wî xiste nava sê tiliyên xwe, bi awayekî xayîz, di eynî demê de hebekî xwe da paş û ji bo ku pişt a xwe bide min wî ji xwe re cih çêkir. Ez hebekî bi paş ve çûm, min dît wî saeta Juan derxistiye û demekê zendê Juan di nava destên doktor de ma. Paşê wî destê bê hereket berda û çû xwe sparte dîwêr, mîna tiştekî pirr girîng ku divê tavilê bête not- kirin hebe, bi carekê ve ji bêrîka xwe def- terek derxist û li rûpelekî tiştin nivîsandin.

- Rezîl, min di dilê xwe de ji hêrsan got. Nebe, tu li nabza min jî nenihêrî, ez ê kulmekê li orta devê bixim.

Ew nedihate ba min, lê min hîs dikir ku ew li min dinihêre. Min serê xwe rakir û min jî li wî nihêrî. Bi dengêkî ku nedihate fêhmkirin pirsî:

- Mirov li vir dibe weke qeşayê, ne wilo ?

Xuyabû wî sar bû, rengê wî şîrikî bûbû.

- Min ne sar e, min jê re got.

Wî dev ji nihêrîna xwe berneda. Min bi derbekê re fêhm kir û min destên xwe dane ber rûyê xwe: ez di xwêdanê de mabûm. Di vê mahzenê de, di nivê zivistanê de, ku pûk û bahoz bû, min xwêdan dida. Min tiliyên xwe di nava porê xwe yê ku ji xwêdanê bi hev ve zeliqî bû ve derbas kirin. Di eynî demê de min dît ku gomlegê min jî şil bûye û bi laşê min ve zeliqî ye. Bi kêmanî ev saetek min bû ku min xwêdan dida û min tiştek hîs nedi- kir. Lê ev yeka han ji çavên berazê beljîkî nereviya bû. Wî ew dilopên ku di ser gepên min re niquitûbûn, dîtûbûn û fikirî bû: kêma zêde bi peydabûna tirseke pato- lojîk, ew xwe normal hîs dike û bi vê yeka han jî ew bi gurûr dibe, ji ber ku wî sar bû. Ji dilê min hat ku ez rabimê û wî bidim ber kulman, lê hê ez tevnê liviy- abûm, şerma min jî, hêrsa min jî nemabû, min xwe bê şerd bera ser yanê da.

Min xwest ku ez stûyê xwe bi destmala xwe pakij bikim, ji ber ku min niha hîs dikir, ku xwêdan ji serê min dinuqute û da- dikeve ser stûyê min û ev jî ne tiştekî xweş bû. Min bi carekê ve dev ji pakki- rinê berda, ji xwe ev bê fêde bû. Destmala min şil û pil bûbû û min her xwêdan dida. Goştê min yê tund jî xwêdan dida û pantorê min bi yanê ve dizeliqî.

Juanê biçûk bi carekê ve peyivî:

- Ma tu doktor î ?

- Erê, yê beljîkî got.

- Gelo mirov demeke dirêj êşê dikişîne ?

- Kengî ?... Na cano, yê beljîkî bi dengêkî ciwanmêrî got. Wê zû dawî were.

Ew di rewşeke mîna nexweşekî ku peran bide û mitala wî nemîne, de bû.

- Lê ez... Ji min re gotin ku... Bi

pirranî du caran gulebaranê dikan.

- Carna, yê beljîkî bi hejandina serê xwe re bersiv da. Belkî di gulebarandina pêşî de tiştek bi cihên girîng neyê.

- Ma wê çaxê ne divê mirov tivingan ji nû ve dagire û ji nû ve nîşan bigire ?

Ew fikirî û bi dengêkî qurmiçî bi ser ve zêde kir:

- Ev jî wext jê re divê!

Tirseke bêhawe ya êşkişandinê bi Juan re çêbûbû, ew ji wê pê ve li tiştekî din nedifikirî. Ew ciwan bû. Lê ez bi xwe li vê yekê nedifikirîm û xwêdandayina min ne ji ber tîrsa kişandinê êşê bû.

Ez rabûm ser lingan û heya bi koma tozê meşiyam. Tom ji cihê xwe pengizî û bi awirên tijî kîn li min nihêrî: ji ber çirke çirka solên min ew aciz dibû. Min ji xwe pîrsî, gelo rûyê min jî mîna yê wî zer e: Min dît ku wî jî xwêdan daye. Asman bedew bû, qet şewq nedikete vî cihê talde. Pîrr pîrr ji bo dîtina heyva mezin min dikarîbû serê xwe rakira. Lê êdî ne weke berê bû, min şeva çûyî, li cihê xwe yê berê dikarîbû zirperçeye asman bidîta û wê yekê her saeta rojê bîranîneke nû tanî bîra min. Gava sibehê zû asman vekirî û sayî bû, ez li perravên Atlantîkê fikirî bûm. Min danê nivro roj didît û min didît ku ez masiyên biçûk û zeytûnan dixwim û min manzanilla vedixwar. Li Sevilla bareke vexwarinê di hate bîra min. Ez piştî nîvroyan diketime siyê û ez li arenayên ku nivê wan ji rojê dişewitûn û nivê din jî di bin siyeke kûr de dîma, difikirîm. Bi rastî jî bi vî babetî dîtina esmên bi mirov êş dida kişandin. Lê niha heya ku min dixwast min li esmên dinihêrî. Êdî esmên tu tişt nedianî bîra min. Min ev yeka tercîh dikir. Ez çûm li ba Tom rûniştim. Di

navberê de demeke dirêj derbas bû.

Tom bi dengêkî nizim dest bi peyvê kir. Diviya bû ew her bipeyiviya, ger ne wilo bûya, wî nizanîbû ew bi fikrên xwe çî dike. Ez fikirîm ku wî tiştek ji min re got, lê wî li min nedinihêrî. Bê şik, ew di-tirsiya ku ew min wilo mîna xweliyê û di nava vê şilahiya xwêdanê de bibîne. Em li hev çûbûn û ya xerab jî, em mîna neynika hevdu bûn. Wî li beljîkiyê ku dîk rawestîya bû dinihêrî.

- Ma tu fêhm dikî ? digot. Ez bi xwe fêhm nakim.

Min jî bi dengê nizim dest bi peyvê kir. Min li yê beljîkî dinihêrî.

- Çi ye, çi bû ye ?

- Wê tiştekî ku ez fêhm nakim were serê me.

Bêhneke ecêb ji der û dora Tom dihat. Bi min wilo hat ku min ji her tim bêtir ew bêhn hîs kir. Min henekê xwe pê kir:

- Çawa be tu fêhm dikî.

- Ne belî ye, wî bi înad got. Ez dixwazim pîrr cesûr bim, lê qet nebe divê ez zanibim... Guhdarî bike, ew ê me bibîne hewşê. Wê ew werin û li hemberî me têkevin rêzê. Gelo wê çend kes bin ?

- Ez ji ku zanim. An wê pênc, an jî heşt kes bin. Ne pîrr e.

- Baş e. Wê heşt kes bin. Wê ji wan re "nîşan bigirin" bibêjin û wê berê heşt tivingan bi min ve bin. Ez difikirim ku ez ê bixwazim têkevim nava dîwêr, ez ê bi hemû hêza xwe, bi pişta xwe dîwêr dehî bidim, lê wê dîwar li ber xwe bide. Eynî mîna kabûs. Ez van hemûyan di serê xwe de çêdikim. Ax ku te bizanîba bê ez van çawan di serê xwe de çêdikim

- Baş e, baş e! min got. Ez jî xeyalên wilo çêdikim.

- Dê wê çaxê kûçikahiyekê bikin. Tu dizanî, ji bo ku rû neyêne nas kirin, ew ji çav û devê mirov nîşanê digirin, bi şeytanî bi ser ve zêde kir. - Ez ji niha ve birînan hîs dikim. Ev saeteke ku êşek di serê min û stûyê min de heye. Ne êşeke rastîn e. Ya xerab jî ew e ku, ez ê van êşan sibehê hîs bikim. Baş e, paşê ?

Min pirr vekirî fêhm dikir ku ew dixwaze çi bibêje, lê min qet nedixwest ku ez wilo bixuyim. Ger em werin ser êşê, ez jî mîna şûna kêrên biçûk van êşan di laşê xwe de hîs dikim. Ez hînî vê nedibûm, lê ez jî weke wî bûm, min guh nedidayê.

- Paşê, tu ê bi xeder bimîzî, min gotê.

Tenê ji bo wê yekê wî dest bi peyvê kir. Wî çavên xwe ji yên beljîkî venediqetan-din. Wî li yê li pêş xwe guhdarî nedikir. Min dizanîbû ku ew ji bo çi hatiye. Tiştên ku em lê difikirin ew eleqeder nedikir. Ew hatibû li laşê me binihêre, ew hatibû li laşê me yê ku bi saxî li ber xwe dide, binihêre.

- Mîna kabûsan, Tom got. Mirov dixwaze li tiştinan bifikire, dizane her wilo ye, û hûn difikirin ku wê dev ji we berde û here. Min xwe bi xwe: paşê êdî wê tiştek nebe, digot. Lê ez fêhm nakim bê ev tê çi maneyê. Hin demên ku ez heyra wir hatime, çêbûne... lê paşê, ez dîsan li êşê, li gulleyan, li teqînê difikirim. Tembîha min li te, ez maddeparêz im. Ez dêhn nabim. Lê tiştekî bêdawî heye. Ez termê xwe dibînim: ne zehmet e, lê ez bi çavên xwe, xwe dibînim. Divê ez dest bi fikirandina ku ez ê tiştekî nebînim, ez ê tiştekî nebihîzim û wê dinya ji bo yên din dom bike, bikim. Mirov ji bo ku li vê bifikire nehatine afirandin Pablo. Bawer bike. Di

şeveke ku ez bêxew mame û li bendî tiştinan mame, ez gihîştim van hemûyan. Lê ev ne eynî tişt e. Ew ê ji pişt ve êrîşî me bikin. Pablo, em ê bê hazirî bin.

- Cehd bike, min jê re got. Ger tu bixwazî em dikarin ji bo efûkirina gunehên te bang keşeyekî bikin ?

Bersiv neda. Gava wî dixwest pêxembertiyê bike û bi dengê zelal ji min re bibêje Pablo, min bala xwe dabûyê. Min ji tiştên wilo hez nedikir, lê wilo xuya bû, ku hemû îrlandî wilo bûn. Bi min wilo hatibû ku bêhna mîzê dihat. A rastî min nêzîkahiyek li hemberî Tom hîs nedikir û herçiqas em ê bi hev re biçûna mirinê jî, min nêzîkahiyek zêde hewce jî nedidît. Hin mirov hene ku danûstandina bi wan re cihê ye, wek mînak, danûstandina bi Ramon Gris re. Lê belê min xwe bi Tom û Juan re bi tenê hîs dikir. Ji xwe ev yeka han bêtir bi kêrî min dihat. Ger ez bi Ramon re li cihekî bûma, belkî ez nerm bibûma. Lê ez niha bêhawe dilhişk im û ez dixwazim wilo jî bimînim.

Tom bi celebekî xayizbûn gotinin di devê xwe de dibir û dianîn. Ji bo ku ew xwe nespêra fikrê, ew bi êminî dipeyivî. Mîna kalê ku bi nexweşiya prostatê ketibe bêhna mîzê jê dihat. Di eslê xwe de ez jî di fikra wî de bûm, hemû tiştên ku wî digot, min jî dikarîbû bigota. Mirineke bi vî awayî ne xwezayî bû. Ji çirka ku min riya mirinê girtiye û bi vir ve, tu tişt bi min xwezayî nedihat. Ne ev koma komirê, ne kursiyên bi rêz, ne devê Pedro yê genî. Bi Pedro re li fikirandina eynî tiştî li xweşa min nedichû. Min baş dizanîbû ku em ê şevêkê, qet nebe, pênc deqîqan di eynî

wextê de, li eynî tiştî bifikiriyana, me ê xwêdan bida û em ê biricifiyana. Min wilo ji kêlekê ve lê nihêrî. Ew bi min ecêb hat: wî mirina xwe di rûyê xwe de hildigirt. Gurûra min birîndar bûbû. Ez bi qasî bîst û çar saetan li ba Tom jiya bûm, min li wî guhdarî kiribû, ez bi wî re peyivîbûm, min dizanîbû ku tu tişteki me yê hevbeş tune ye. Niha jî em mîna du cêwiyan dişibin hevdu, tişteki basît e, em ê bi hev re geber bibin. Tom bêî ku li min binihêre, bi destê min girt:

- Pablo, ez ji xwe dipirsim... Ez dipirsim bê gelo rast e ku mirov ê bimire û nemîne.

Min destê xwe kişand. Paşê min jê re got:

- Li nava lingên xwe binêre, dêhno.

Li nava lingên wî hinek av hebû, ji pantorê wî dilop diniquîn.

- Ev çi ye ? wî bi tirs got.

- Te bi xwe de mîstîye, min gotê.

- Ne rast e, wî bi hêrs got. Ez namîzim.

Yê beljîkî nêzik bûbû. Bi meraqek xav jê pirsî:

- Ma tu nexweş î ?

Tom bersiv neda. Yê beljîkî bêî ku tişteki bibêje, li wê ava nava lingên wî dinihêrî.

- Ev çi ye, min fêhm nekir, Tom bi sert got. Lê ez natirsim. Ez sond dixwim ku ez natirsim.

Yê beljîkî bersiv neda. Tom rabû ser xwe û çû li quncikekê mîst. Wî bişkokên pantorê xwe girtin, bi paş ve hat li cihê xwe rûnişt û hew devê xwe vekir. Yê beljîkî not digirtin.

Ji ber ku ew geş bû, me hersiyan bi hev re li wî dinihêrîn. Tevgerên wî yên jîndar, xemên wî yên jîndar hebûn. Mirovên ku

dijîn çawa dilerizin, ew jî di vî hundurî de wilo dilerizî. Laşekî wî yê bi tolerans û xweşjiyayî hebû. Em yên din, me hîs nedikir, ku laşên me heye, an tune ye. Çi dibe bila bibe, me tu tişt hîs nedikir. Min dixwest ez li nava çîmên xwe, li pantorê xwe binihêrim, lê min cesaret nedikir. Min li yê beljîkî dinihêrî. Wî li ser çîmên xwe yên mîna kevanekê şidiyayî, li qasên xwe hukum dikir. Ew dikarîbû li sibehê jî bifikirîya. Lê em, sê hebên xwînjêkişiyayî mîna sê siyan li wir sekinî bûn. Me li wî dinihêrî û me mîna xwînmijan xwîna jîna wî dimêt.

Dawiyê ew ber bi Juanê biçûk ve meşiya. Ne ku wî ji ber evîna xwe ya kar xwest destê xwe deyne paş stûyê wî, an jî ji ber xwesteka dilovaniya wî bû ? Ger ji dilovaniyê bûya, ew di hemû şevê de carekê tenê bû. Wî ser û stûyê Juanê biçûk mist da. Juanê biçûk xwe berda, çavên xwe ji wî nediqetandin, paşê bi carekê ve destên wî hatin girtin, ecêb ecêb dinihêrî. Wî destê yê beljîkî di nava herdu destên xwe de girtibû û ew dest qet li xweşa wî nediçû. Wî, ew destên girover û sor, mîna du mengenyên di rengê xweliyê de dişidandin. Min şika ku wê tiştin bibin, dikir û diviya bû Tom jî di eynî rewşê de bûya. Lê yê beljîkî tişteki ferq nedikir, bi ciwanmêrî dibişirî. Piştî demekê Juan destê wî yê sor û biçûk bire ber devê xwe û xwest ku dev lê bike. Yê beljîkî bi zorê destê xwe xelas kir û bi şewişin çû li dîwêr sekinî. Wî bi qederê saniyekê bi tirs li me nihêrî, wî ê bi carekê ve fêhm kiribe ku em nedişibiyana wî. Ez keniyam û yek ji gardiyanan ji cihê xwe pengizî. Yê din raza bû û çavên wî yên mezin û vekirî, spî bûn.

Min xwe hem westiyayî, hem jî dilşa û bi heyecan hîs dikir. Min nedixwest ez li tiştên ku wê sibehê bi serên me de bihata, yanî li mirinê bifikriyama. Gava ez li yê din difikirîm, min devê lûleyên tivingan yên ku ber bi min ve vebûbûn, didîtin. Belkî ez zêdeyî bîst caran îdamê jiyam. Carekê, min got belkî ya ku wê bi rastî bibûya, bû. Wê çaxê jî ez deqeyekê bi xew re çûbûm. Wan ez ber bi dîwêr ve dibirim. Ji bo ku ew min efû bikin, min li ber xwe dida. Ez ji xewê pengizîm û min li yê beljîkî nihêrî. Ez ditirsiyam ku ez di xewê de qiriyabim. Lê wî simêlê xwe ba dida û haya wî ji tiştêkî tune bû. Ger min bixwesta, ez bawer im, min ê bikarîba kêlîkekê razama. Ev çil û heşt saetên min bûn ku ez ranezabûm. Êdî min debar nedikir. Lê min nedixwest, ku ez du saetan ji jiyanê winda bikim. Wan ê bihata ez di berbangê de şiyar bikirama, min ê çavlixewî bida dû wan û biçûma. Min nedixwest ku wilo bibe. Min nedixwest ku ez mîna heywanekî bimirim. Min dixwest ez fêhm bikim. A din, ez ji dîtina kêbûs jî ditirsiyam. Ez rabûm ser lingan, ez çûm vî alî û wî alî û ji bo ku ez serê xwe ji van ramanan pak bikim, ez li jiyanê xwe ya buhurî fikirîm. Komek bîranînên qurço mirço di serê min de peyda bûn. Bîranînên baş jî hebûn, yên xerab jî. An jî min berê ev wilo dinavandin. Rû û serpêhatî hebûn. Min di dema Ferîa de, li Valenseyê, rûyê zarokekî ku bi qulonçan hatibû xemilandin, dît. Ev zarok yek ji apên min bû. Ev rûyê Ramon Gris bû. Min serbûriyên xwe bibîranîn. Çawa ku ez di sala 1926'an de bê kar mabûm û ji birçîna dimirim. Ez wê şeva ku min li Granadayê li ser textekî derbas kiriye jî bi bîr ûnîm. Sê rojan pa-

riyek nan jî neketibû devê min, hal di min de nema bû, dîsan jî min nedixwest ez bimirim. Vê yeka han ez kenandim. Ez li dû dilşahiye, li dû jinan, li dû azadiyê reviyabûm, hem jî ez çawan reviyabûm. Ev hemû ji bo çi bûn ? Min xwestibû ez Spanyayê xelas bikim. Ez heyranê Piy Margall bûm. Ez bi tevgera anarşîstan ve hatibûm girêdan. Ez di civînan de peyivî bûm: Mîna ku ez bêmirin bim, min her tişt cidî digirt.

Di vê navê de, di dilê min de, mîna ku hemû jiyanê min li ber min raxistibû. Ez fikirîm: "Dêmek dilreşiyek pîroz e." Ger dê dawiya wê were, ew ne hêja ye tiştêkî. Min ji xwe pirsî, bê min çawa keçik xapandine, ez çawan bi wan re geriyame. Ger min zanîbûya ez ê bi vî awayî bimirim, min tilîkek xwe jî tevnedilivand. Jiyanê min, mîna çenteyekî devgirtî û veşirtî li ber min bû. Lê yên di hundurê çente de hê xelas nebûbûn. Min demekê xwest ez hukum bikim. Dêmek min ji xwe re jiyanek xweş xwestibû. Lê belê mirov nedigihîşt wî hukmî, lê ev tenê kirinek bû. Min dema xwe ji bo jiyanek nemir buhurandiye, min tiştêk fêhm nekirîye. Ez ji tiştêkî jî dilşikestî nedibûm. Komek tişt hebûn, ku diviyabû ez li ber biketîma, tama manzanilla û şuştina min a di delêv de. Lê mirinê hemû berbat kiribû.

Ramaneke xweş a yê beljîkî hebû, bi carekê ve:

- Dostino, got, bi şiklê ku karîna eskerî destûr bide, ez dikarim ji we çend gotinan, an jî bîranînekê bigihînim dost û hezkirên we.

Tom got:

- Yê min kesekî min tune ye.

Min qet bersiv neda. Tom hebekî sekinî, paşê li min zîvirî û bi meraq got:

- Ma tişteki ku tu ji Concha re bibêji, tune ye ?

- Na.

Min ji vê hevkarîya ku nû destpêkiribû hez nedikir. Ev çewtiya min bû. Min şeva çûyî behsa Concha kiribû, diviyabû min xwe bigirta. Ji salekê û vir de ez bi vê jinikê re bûm. Hê do bi şev, ji bo ku ez bi-karibim wê pênc deqîqan bibînim, min dikaribû milekî xwe bi bivir jê bikira û biavêta ji wê re. Ev e, ji ber vê yekê ez peyivîm, ew tişteki ji min bi hêztir bû. Lê niha ji dilê min nedihat ku ez wê bibînim, ji ber ku êdî tu gotinên ku min ji wê re bigota nemabûn. Min dixwest ez wê hemêz bikim û bişidînim jî. Ez ji bedena xwe ditirsyam, ji ber ku ew bûbû mîna xweliyê û xwêdan dida. Ez ne êmin bûm, ku ez ê ji bedena wê jî netirsiyama. Gava Concha mirina min bibihîsta, ew ê bigiriya. Wê bi mehan li min bifikiriya û wê ji dilê wê nehata ku ew piştî min bijiya. Lê yê ku bimira ez bûm. Ez li çavên wê yên şêrîn û spehî fikirîm. Gava wê li min dinihêrî, ji wê tiştin derbasî min dibûn. Ez fikirîm ku ev yeka han dawî hatiye. Ger ew niha li min binihêre, ew ê awirên wê di çavên wê de bimînin, wê negihîjin min. Ez bi tenê bûm.

Tom jî bi tenê bû, lê ne bi eynî celebî. Mîna ku ew li hespekî siwar bûbe rûniştibû û bişirînek li ser lêvên wî hebû. Ew di rewşeke şaşmayî de bû, bi wî awayî li bankan dinihêrî. Wî destê xwe dirêj kir û bi awayekî liberxweketî bi text kir. Mîna ku ew ditirsiya ku ew tişteki bişikîne, paşê bi carekê ve destê xwe kişand û lerizî. Ez ji berdêla Tom bûma,

min ê wextê xwe bi destdayina text ve derbas nekira. Ev jî qirdikiyek îrlandayî bû. Lê min hewayek ecêb di firaxan de didît. Ew zêde windabûyî bûn, ji her tim hindiktir bûn. Ji bo ku ez çûyina xwe ya mirinê hîs bikim, têr dikir û zêde bû jî, ku ez li kursiyan, li lampê û li koma tozê binihêrim. Xwezayî bû ku ez viki vekirî li mirina xwe nedifikirîm. Lê min ew li her derê didît. Tom çûbû li ser text dest mirina xwe dabû.

Ger ez bihatama efû kirin û ez ji wê rewşa ku ez tê de bûm, destên xwe li ba bikira û ez biçûma, ez ê bibûma mîna bûzê. Gava mirov xeyala nemirinê winda dike, çend saet, an jî çend sal mîna hev in. Ez bi tişteki ve nedihatim girêdan, ji aliyekî ve ez bêdeng bûm. Lê ev bêdengiyek ecêb bû. Ji ber bedena min: Bedena min, min bi çavên wê didîtin, bi guhên wê dibihîstin, lê ev êdî ne ez bûm. Ew bi tena serê xwe dilerizî, bi tena serê xwe xwêdan dida. Êdî min ew nas nedikir. Ji bo ku min bizanîba bê ew çi ye, diviyabû min dest wî bidaya, min lê binihêriya, eynî mîna ku ew laşê yekî din e, an ê min e ? Min car caran ew dibihîst. Mîna ku ez di balafireke ku xwe di ser poz re berdide xwarê de bim, tiştin ecêb di hundurê min de çêdibûn. An jî min lêdana dilê xwe hîs dikir. Lê ez bi vê nedihatim ser, ji her tiştê ku ji laşê min dihat, hewayek gemarî û reş hebû. Ew piraniya caran bêdeng dima û ji celebekî giraniyê pê ve, ji berdêla ku ew ji bo min bibe hebûnek pelos û dijrabêr, min tişteki din hîs dikir. Te digot qey ez bi kêzikeke mezin ve hatibûm girêdan. Min carekê destê xwe avêt pantorê xwe û min hîs kir ku şil bûye. Min nizanibû gelo ew ji xwêdanê, an ji mîzê şil bûye.

Lê ji bo ku ez bi tevdir bim, min çû li ser koma komirê mîst.

Yê beljîkî saeta xwe derxist û lê nihêrî.

- Saet sisê û nîv e, got.

Dêhno! Tu dibêjî qey mecbûr bû ev bigota. Tom ji cihê xwe hol bû. Me hê jî fêrq nekiribû ku dem herikî bû û çûbû. Şevê em mîna komek bê şikil û tarî hemêz kiribû. Tew nedihat bîra min ku şevê dest pê kiribû jî.

Juanê biçûk kire qîrîn. Wî destê xwe dişidand û lava dikir.

- Ez naxwazim bimirim, ez naxwazim bimirim.

Wî milên xwe bilind kirin û di hundur de bazda, paşê wî xwe avêt ser mîndereke ji pûş û kire îskîn. Tom bi çavên çilmisî li wî dinihêrî û êdî ji dilê wî nedihat ku wî haş bike. Bi rastî ev ne ji ber kişandina êşê bû. Juan ji me bêûr deng derdixist, lê haya wî hindiktir ji meselê hebû. Ew mîna nexweşekî ku bi êgir xwe li hemberî xerabiya nexweşiya xwe biparêze bû. Gava agir jî tunebe, rewş xerabtir e.

Ew digiriya. Gunehê wî bi wî dihat, min ew yeka han vekirî didît. Ew li mirinê nedifikirî. Saniyekê, tenê saniyekê min jî xwest ez ji xwe re bigirîm, gunehê xwe bi xwe bînim û bigirîm. Lê tam berevajiya wê bû. Min çavek avête Juan, gava min dît ku milên wî yên jar dihejin, min xwe li derî însanetiye dît. Ne gunehê min bi hinin din dihat, ne jî bi min. Min xwe bi xwe "Ez tenê dixwazim bimirim" got.

Tom rabûbû, ew çûbû bin wê taqîka girover û li ronahiya rojê dinihêrî. Herçî ez bûm, ez ji mirinê pê ve li tiştekî din nedifikirîm. Lê digel her tiştî, ji çirka ku doktor saet ji me re gotibû û bi vir de, min hîs dikir ku dem dişemite û dilop bi dilop

diniquete.

Gava min dengê Tom bihîst, dinya reştir bû.

- Deng tê te ?

- Erê.

Ew li kuçê dimeşyan.

- Gelo ma ew hatine ma temam bikin ?

Ew nikarin di tariyê de biteqînin ku!

Piştî kêlîkekê me tiştek nebihîst. Min ji Tom re:

- Va ye roj derket, got.

Pedro bawîşkî û rabû ser xwe û çû lampe vemirand. Ji hevalê xwe re:

- Pir sayî ye, got.

Rengê hundur bûbû rengê xweliyê. Me ji dûr ve dengên tivingan bihîst.

- Wan dest pê kirin, min ji Tom re got, ew bikin bikin, ew ê li hewşa pişt bikin.

Tom cigarek ji doktor xwest. Min nexwest, dilê min ne dibijiya cigarê, ne jî alkolê. Ji vê kêlîkê pê ve wan li ser hev sîleh berdan.

- Tu fêhm dikî ? Tom got.

Wî dixwest tiştekî bibêje, lê bêdeng dima, li derî dinihêrî. Derî vebû, çar esker û zabitek ketin hundur. Cigara Tom ji destê wî ket erdê.

- Steinbock kî ye ?

Tom bersiv neda. Pedro ew nîşan da.

- Juan Mîrbal kî ye ?

- Ev ê li ser mîndera pûş e.

- Rabin ser xwe, zabit got.

Juan tevnêliviya. Du eskeran bi çengên wî girtin û ew rakirin. Lê hema ku wan ew berdan, ew herikî erdê.

Esger dudilî bûn.

- Ev ne yê pêşî ye ku xwe xerab hîs dike, zêbit got. Hûn herdu wan bigirin û bibin, ew li wir çî dîkin bila bikin.

Li Tom zîvirî:

- Heydê, bimesîn.

Tom di nava du eskeran de derket. Herdu eskerên din li dû wan diçûn. Wan Juan di nav xwe de hilgirtibûn û ew dibirin. Ew bêhiş neketibû, çavên wî fireh vebûbûn û hêsiyên wî di ser hinarîkên wî de diherikîn. Gava min jî xwest ku ez derkevim, zabî ez dame rawestandî:

- Tu lbbieta yî ?

- Erê.

- Tu niha li vir raweste. Ew ê werin li te bigerin.

Derketin. Yê beljîkî û du gardiyan jî derketin, min xwe bi tenê hîs kir. Min nizanibû wê çi were serê min, lê ji bo ku wê tavilê dawî bihata jî ez kêfxweş bûm. Min hema hema li ser hev dengê salvoyan dibihîst, bi her dengî re ez diricifim. Min dixwest ez biqîrim û porê xwe birûçikînim. Lê min diranên xwe dişidandin û destên xwe dixistin bêrîkên xwe, ji ber ku min dixwest ez paqij bimînim.

Piştî saeteke din wan hatin ez birim odeyeke qatê yekê, ku ji bêhna cigaran û ji german mirov difetisî. Li wir du sûbayên ku ser çongên wan tije kaxez bûn û cigare dikişandin, hebûn.

- Navê te lbbieta ye ?

- Erê.

- Ramon Gris li ku ye ?

- Ez nizamim.

Yê ku îfadeya min digirt bejinkurt û dagirtû bû. Di pişt berçavka wî de çavên wî yên bi awirên xedar hebûn.

Ji min re:

- Bi vir de were, got.

Îz nêzik bûm. Ew rabû ser xwe û mîna ku ew bixwaze min têxe binê erdê, li min nihêrî û bi milên min girt. Di eynî wextê

de wî bi hemû hêza xwe milên min dişidandin. Ev ne ji bo ku ew bi min êşê bide kişandin, ev listikek bû, wî dixwest hukum li min bike. Wî her bêhna devê xwe ya genî jî bi ser min de berdida. Em demekê wilo man, vê yekê xwestekeke ken dida min. Ji bo fedîkarderxistina zilamekî rêwiyê mirinê, divabû tiştin hîn zêdetir bihata kirin. Wî nedikir. Wî bi şidet ez dehî dam û dîsan rûnişt.

- Jiyana te bi jiyana wî ye. Ger tu cihê wî ji me re bibêjî em ê te berdin.

Ev herdu mêrikên ku xweş li xwe kiribûn, xwe şidandibûn, bi qemçî û cîzme bûn, ew ê bi eynî celebî biçûna mirinê. Piştî min bi demeke kurt. Ew li perçexazên di destên xwe de li navan digeriyan. Ji bo ku ew mirovan bigirin û erza wan bişikînin, ew li dû mirovên din digeriyan. Nêrînen wan yên di derheqa pêşeroja Spanyayê de û di derheqa mijarên din de hebûn. Ew tevgerên wan ên biçûk ez hêrs dikirim, bi min ecêb dihat.

Yê kin û dagirtî her li min dinihêrî, bi qemçiyê xwe li cîzma xwe dixist. Ji bo ku ew bi hemû hereketên xwe bişibe heywanekî bi jîn û dirinde, wî bi zanebûn ew hereket dikirin.

- Erê, te fêhm kir ?

- Ez nizamim Gris li ku ye, min got. Ez bawer im ew li Madrîdê bû.

Sûbayê din destê xwe yê rengavêtî bilind kir. Ew bilindkirin jî bi hesab bû. Min hemû listikên wan ên biçûk didîtin, û hebûna mirovên ku bi vî şiklî şahiyê dikin, ez ecêbmayî dihiştim.

Hêdîka:

- Ji bo tu bifikire em panzdeh deqîqan wext didine te, got. Vî bibine cişokê, piştî panzeh deqîqên din wî binin vir. Ger

ew dîsan li ser a xwe bisekine û înkâr bike, divê ew tavilê bête gulebarankirin.

Wan dizanîbûn ku ew ê çi bikin. Min hemû şev bi libendamayinê ve derbas kiribû. Paşê, gava wan Tom û Juan dane ber gulleyan, ez saetekê di mahzenê de dame rawestandî, niha jî wan ez dibir dixistin cilşokê. Ew ji êvar de bi hazirî bûn. Wan ji hev re digotin ku ew ê sinirê min xopan bibin û texmîn dikirin ku wê wilo be.

Ew dixapiyan. Ez li cilşokê li ser kurseyekê rûniştî. Min xwe bêhal hîs dikir û ez difikirîm. Lê ne li pêşniyara wan... Min dizanîbû bê Gris li ku ye. Wî xwe li ba biraziyên xwe veşartibû, ew çar kilometre ji bajêr dûr bû. Ger ew îşkencê bi min nekin, ez cihê ku wî xwe lê veşartiye nabêjim. (Lê mîna ku ew ê îşkencê min nekin dixuyan.) Ev hemû vekirîbûn, bi rêk û pêk bûn û bi qasî misqalekî jî min eleqeder nedikir. Min tenê dixwest sedemên rîya ku wan ez girtime hîn bibim. Ji berdêla ku min Gris bida dest, mirin çêtir bû. Ji bo çi? Min êdî ji Ramon Gris hez nedikir. Dostaniya min ya bi wî re, mîna evîna min a li hemberî Concha û xwesteka min a jiyane, bi berbangê re miribû û çûbû. Bê şik min qîmet dida wî, ew peyayekî sert bû. Lê ji ber vê sedemê min nedixwest ez ji berdêla wî bimirim. Jiyana wî ji ya min ne bi qîmettir bû. Ew mirov dispêrin diwêr û paşê heta ku mirov geber dîkin li mirov direşînin. Ew ê ku tê kuştin te divê bila ez bim, Gris be, an jî yekî din be, wek hev e. Di mesela Spanyayê de min dizanîbû ku Gris ji min bikêrhatîr e, lê ez ji bo Spanya û germo-lê diçûme hengameyê. Êdî tu tişt ne girîng bû. Çi fêde ez li vir im. Ger min

Gris bida dest, min ê xwe xelas bikira, lê min ev kirina han red dikir, heta min ev mîna pêkenînekê didît. Ev berxwedanek bû. Ez difikirîm: "Divê mirov li ber xwe bide!" Dilşahiyeke ecêb ez digirtim.

Hatî li min geriyan û ez birim ba du sûbayan. Di ber lingên me re mişkek derbas bû, min xwest ez henekan bi eskeran bikim, ez li yekî li wan zîvirîm:

- Ma we mişk dît? min got.

Wî bersiv neda. Ew reşbîn bû û li ber xwe diket. Ê min jî kenê min dihat, lê min xwe digirt, ji ber ku ez ditirsyam ku ez dest pê bikim ez ê nikaribim xwe bigirim. Yê esker bi simêl bû. Min dîsan ji wî re got:

- Divê tu simêlê xwe jê bikî birako.

Li jiyane nixumandina rû a bi mûyan, bi min ecêb dihat. Wî pêhînek li min xist û min hew deng kir.

- Êê, sûbayê kinik û dagirtî ji min re got, ma tu fikirî?

Mîna ku ez li kêzikeke ku kêman caran tete dîtin binihêrim, min bi meraq li wan nihêrî.

- Ez zanim ew li ku ye, min got. Ew xwe di nava goristanê de vedişêre. An ew di kortaleke gorekê de ye, an jî li kulûbeyeke nobedarên goristanê ye.

Min xwest ez bi vê yekê listikekê binim serê wan. Min dixwest ku ew rabin ser lingan, rextên xwe girêdin û bi lez û bez emir bidin.

Ew hol bûn ser lingan.

- Heydê Moles, here ji teymen Lopez panzdeh peyan bixwaze.

Yê kinik got:

- Ger ev tiştê ku tu dibêji, rast be, tu gotina me ji te re namîne. Lê eger derew be, ew ê li ser te buha bibe mal.

Ew bi qûrn û barîn derketin û çûn. Ez bi giraniyekê li ber çavên eskeran rawestiyam. Ez car caran xwe bi xwe dikeniyam, û ew yek bi yek, gava wan bi şaşmayî deriyê gorê vedikirin, dihatin ber çavên min. Mîna ku ez ji hinin din re behs bikim, min ji xwe re behsa rewşê fikir. Vî mehkûmê ku xistiye serê xwe, ku wê bibe qehreman, ev eskerên bi simêl û bi heybet û peyayên bi unîforma ku di nava goristanê de baz didan, dihatin ber çavên min. Ev nedihate kişandin, ecêb bû.

Piştî nîvsaetê mêrikê kin û dagirtî bi tena serê xwe hat. Ez fikirîm ku ew ê emir bide, da min gulebaran bikin. Diviyabû yê din li goristanê mabin.

Sûbay li min nihêrî. Ji rewşa wî dixuya ku ew zêde ne aciz bû.

- Vî jî bi yê din re bibin hewşa mezin, got. Piştî miamela eskerî, ew ê mehkeme qedera wan kifş bike.

Min texmîn kir ku min fêhm nekir. Min ji wan pirsî:

- Yanî hûn ê... Hûn ê min gulebaran nekin ?

- Xuya ye ne niha. Paşê, jê pê ve ez nizanîm.

Qet, min qet fêhm nedikir.

- Lê çima ? min gotê.

Bêî ku ew bersiv bide wî milên xwe hejandin û eskeran ez birim. Li hewşa mezin, bi jin û zarok û kal û pîran nêzikî sed girtî hebû. Min dest pê kir ez li dor hêşnayiya di nava hewşê de zivîrîm, ez şaşmayî mabûm. Wan dahnê nîvro, li xwarinxanê zikên me têr kirin. Du-sê heban xwestin îfada min bigirin. Min dizanîbû, lê min bersiv neda. Min nizanîbû ew li ku bû jî.

Wan ber êvarî deh girtiye din ji anîn

hewşê. Min Garciayê nanpêj nas kir. Wî ji min re got:

- Ev qeder e, ez qet nedifikirîm ku ez ê te bibînim.

- Wan cezayê kuştinê dabûn min, min gotê. Lê wan paşê fikra xwe guhertin. Ez nizanim bê wan ji bo çi fikra xwe guhertine.

- Wan saet duduwan ez girtim, Garcia got.

- Çima ?

Garciya siyaset kir.

- Ez nizanim, got. Her kesên ku weke wan nafikirin, ew wan digirin.

Wî dengê xwe daxist:

- Gris jî çû.

Ez ricifîm.

- Kengî ?

- Vê sibehê. Wî kar kiriye. Ji ber ku ew bi tiştinan hesiyane, ew roja sêşemê ji cem biraziyê xwe çû ye. Ne ku kesekî ku ew veşarta tunebû, lê wî nedixwest ji kesî re bibe bar. "Min xwe li mala Ibbieta veşartibû, lê piştî ku ew hate girtin, ez ê herim xwe li goristanê veşêrim" wî gotibû.

- Li goristanê ?

- Erê. Ev e, kar e. Şansa wî ya xerab, ew vê sibehê di wir re derbas bûn û wan ew girtin. Wan ew di kulûbeyê nobedarên goristanê de girtin. Hema li wir li wî reşandin û ew kuştin.

- Li goristanê !

Serê min gēj bû û ez ketim xwarê.

Ez wilo dikeniyam ku ji çavên min hêsidirihêrîkî.

Werger: Firat CEWERÎ

EVÎN

Mayakovskî

Belkî,
rojekê belkî,
li bexçê heywanan
di ber rêzên daran re li du alîyan
ewa han jî bê-
lewra wê jî ji heywanan hez dikir-
li parkê derketibe seyranê,
wek di sûret de
di refa dolava min de,
dev li ken be.
Bê guman,
dê wê jî rakin-
gelekî spehî ye.
Sedsala we ya sihan
tiştên ku dil bêzar dikirin
wê di ber me re biqewirîne bi kerûyan .
Em ê wê demê bê hejmar şevan
ku bi stêrikan diçirisînin
têxin bedêla wan rojan
ku me têr hez nekir, em ne gihan.
Min dîsa rake
qet nebe
ji bo ku min
wek yekî helbestvan
xwe ji her babet qirêjê azad kir
û li benda te mam.
Min dîsa rake

qet nebe bi vê sedemê!
 Min dîsa rake-
 dixwazim jûyana xwe tevî bijîm!
 Ji bo ku evîn nebe listik
 ji bo zewacê,
 gepa nan,
 û şewetê.
 Ji bo ku evîn, ne bi xêr
 ji nav nivînan derkeve
 û di kânata bê dawî de
 seyranê bike.
 Ji bo ku roj
 nema derkeve
 parsa xwarinê,
 wilo ji hevdeketî li ser rêyan,
 di nav tozê de nemîne.
 Ji bo ku
 bi gazîya yekem:
 -Heval!
 dînya li xwe bîftile û bê guhertin.
 Ji bo ku em
 ji jûyaneke bi qeyd û zincîran
 dîla karên malê
 azad bibin.
 Ji bo ku
 ji aniha û pê de
 em wek xuşk û bira bin,
 ji bo ku
 qet nebe
 cîhan bibe bavê me
 û dînya jî dîya me.

Wergera ji swêdî: Süleyman DEMİR

 Beşê dawî ji helbesta "Dî derbareyî wilo" de.

ÇEND ŞÎRÊ KÎRDKÎ (ZAZAKÎ)

J. ESPAR

MÊMANEY

*Mêmaney
rojê,
di rojî
hîrê...
Aşmê, di aşmî zî
serî û çîman ser.
La ey mî?
Fek ti ra verra dê!
Ne şîma persî
û ne zî ez vaja.
Mêmaneya mi
ey şarî nêmanenal
Xwira çî mi şarî maneno ki...*

Aminan - 1992

PAROLA

*Hero Qirr,
wayîrê cildê neqşênî,
wesardê rêşênî,
zengdê zernênî.
Viye di yew nuşte
pey muranê kihoyan viraşte.
Hak çaredê yê di hema hî*

Endi delalî

`eyb nêbînî ka zên ser nî.

Hero Qirr, serbest. Bi xwi bawer. Yere ra pey kewt
teber. Geyra. Zirra. Eştî loqtîzikî ne va yew, ne di ne
hîrê. Keyf keyfê yê. Roj şî awan, bi tarî. Nefli sey
zincarî. Beşna bencirî barî. Nîno Qirrî vîrî rayirê
keyî. Şewî, şewa çerî.

Cendirme kozik di neternaye.

Teber ra ne veng yeno, ne hes.

Zerrey kozikî gillî ra ters.

Kozik `ardî.

Herri serdini,

herri hêrsbiyaya.

Kerrey abiasan,

Ge ge bereqêno gî estarî

seki ti ra vajo "ti hema nêşî"

Nika bivecaynî yew ganî

yo ka kaş biko linga tifingî.

Timo a ya ki nê cay dey rê heram bî.

Hero Qirr mevajî, vaji "Her Axa". Heta a gama ki
cendirmî veng da:

P A R O L A!

Yê goşî kerdî belî, birnay fişşî. Gulewo verên gina
tehta çarî ro. `Eynî herunda hakî ro. Qir tewtihiya.
Gonî çirri da. Çimî bî tarî. Guley dişini nêdî.

To ra aseno AZADÎ

eki to biney lez bikerdinî

ka Qirro delalî

nêbo sey seradî.

Ma pawibê to yî

de vazdi gidi!

Payiz - 1992

ŞEWÎ

Çarqirnî mi şewî
Çarqirnî şewî ekranî
Şewî hewrini, şewî merezini
Ekranî gonî û gonaşîr di mendî.

Ekranan di çêher çimî
di ey may, di ey keyna.
Çimê bêgillî û bêroşna
eki çimî bihesebî.
Ez ewniyêna may ra, ez ewniyêna keyna ra
yê kila tîfîngî dim a çimandê xwi ra.
Banê xirabey, termê lete lete bîyayey.
Yew asmêno sîya heze teney.
Gazî û hewara ki geyrena mêrdimey
fonê nê tablodê trafîkî ya.

Şima ra zewqê şarî aseno?
Lengeriyin Çanqaya di ronîştî.
Lingi eşta lingi ser, temaşe keno
demewo ki dewî veşena. deweki veşena,
zerri çizena, qesba veşena.
Ez nêzana sey Neronî şûran zî waneno?
Labelê ez zana.
hergû raya ki fekê xwi akeno
riy xwi sîya keno.
Çekan ver di destan besteno.
Çekê ki benî gonî,
gonîya ki bena estarey
polandê generalan ser o.

Ey Lengeriyîno gonîwer!
Çimanê xwi aki mi ra biewnî!

Herçi çew rayna nêdekwenô şapda to.
Bizanî! Dek û dolavî hinî pere nêkenî.
Ters ra zî çirray çîyekî hêvî mekî!
Çimkî "ters vernî mergî ro nêgêno"
To dest di çi mendo?
Kîştîş, kîştîşo rut û repal.

Hesabdê to di yew şaşey çinê ba?
Tî ehendey mêrdiman senêwa kişenî?
Nê ki ez vana, çekê to kem î
yan zî keyenî.
Ez zana ti taket - naket zî nêkenî.
Labelê dîna şadey ma ya
to verê zî vîst û heşt rayî xwî cerebna.
Çi to dest ra ame to apey nêda.
De vajî, çi vuriya?
Azadî na herri ser o rayna xelfe da
Yanî ma raya vîst û newîn di yî nika.
La hinî bes niyo?
Wa mezgdê to di biçirîngo!
Na de`wa na ray qediyêna.
Gelo ti ko se kî bê ma?
Tî raştey yê persî
hinî çîyo kî ti bikî nêmaneno
hezey Neronî xwîkîştîş ra vêşêr.

Payîz - 1993

LI SER SÊ PIRTÛKÊN İSMAİL BEŞİKÇİ

Gabar ÇIYAN

Sê pirtûkên din yê bi rêz Sosyolog Dr. İsmail Beşikçi di pey hev re berî nuha ji çapê derketin. Di vê nivîsê de bi kinahî dê qala du pirtûkên wî bê kirin. Pirtûka sêwem "*Netewa ku xwe keşfkiriye-Kurd*" jî dê babeta meyî eslî be.

"Xebat û têkoşîna emperyalîstan li ser parvekirina Kurdistanê 1915-1925,1" bi tirkî, di bin navê "Kürdistan üzerinde emperyalist bölüşüm 1915-1925,1" de, bi pêşgotîneke dûvdirêj ku ji aliyê nivîskar bi xwe hatiye nivîsîn, di Adara 1992 an de derket. Pirtûk, di nava weşanên "*Yurt Kitap-Yayın*" de derçû û ji 416 rûpelan pêk tê. Berhemek xwedî naverokek pîralî û pîrkani ye. Ji serî ve rewşa Împaratoriya Osmanî û netewên di nav de dide xuyanîkirin. Bi hişyarbûn û xwenasîna neteweyî, xebata wan netewan û Osmanîyan tîne ziman. *Beşikçi*, bi teybetî li ser welatên Balkan pir disekine û paşê jî berê xwe dide nava ereb, ermenî û kurdan. Li ser şerê di navbeyna ereb-Osmanî, ermenî û Osmanîyan de disekine. Dema Îtîhat û Terakîyan ronî dike. Salên dawî yê împaratoriyetê şirove dike û rengê *Kemal Paşa* û hevalbendên wî yê wê çaxê dide der. Her wisan têkiliyên *Kemal*, bi axayên kurdan, bi Îngilîz û welatên din re, nêzîkbûna wî li ermenî û grêkiyan ronî dike. Rewşa rewşenbîrên tirk û nêzîkbûna

wan li *Kemal* û welatên giregir pir alî analîz dike. Fen û rîpên Osmanî û paşê jî *Kemal* li hemberî kurdan xal bi xal nîşan dide. Di çarçeveyeke bi tevayî li ser konfêrans, lihevdihatin, kongre û civînên navnetewî weke Mondros, Parîs, Sêwas û hwd. diskeine. Dr. *Beşikçi* bi giştî li ser rola tîrkan ku çawa ol ji xwe re kirine navgînek xurt, tîne zimên. Di vê rêzepirtûka yekem de Dr. *Beşikçi*, xwe digihîne heya dawîya sala 1919 an û gelek aliyên girîng yê dirokî, ronî dike.

"*Bilindbûna zaniyariyê*" bi tirkî û di bin navê "*Bilincin yükselişi*", di nav weşanên Yurt Kitap-Yayın" de, bi pêşgotîna weşanxanê, di hezîrana 1993 an de derket. Di vê pirtûkê de bi tevayî, dadgehkirina pirtûkên Dr. *Beşikçi*, xweparastina Dr. *Beşikçi* û weşanxaneyê Yurt Kitap-Yayın li hemberî dadgehên Tirkiyê, di navbera salên 1991-93 an cih digre.

"*Netewa ku xwe keşfkiriye-Kurd*" bi tirkî û di bin navê "*Kendini keşfeden ulus-Kürtler*", di Gulana 1993 an de, di nav weşanên Yurt Kitap-Yayın de derçû. Berhem bi pêşgotîna Dr. *Beşikçi* dest pê dike. Ji sala 1987 an û vir ve gelek kovar û rojname bi birêz Dr. *Beşikçi* re hevpeyvîn kirine. Ev hevpeyvîn tev di vê pirtûkê de hatine berhevîkirin û bi têbîniyên kurt ve hatiye xurtîkirin. 74 hevpeyvîn û mesaj têde hene.

Mesaj ji Konferansa Parîsê (14-15 Çiriya berî 1989) û ya Stockholmê (15-17 Adar 1991), bi munasebeta endametiya şerefê ya Dr. *Beşikçi* ji navenda YRWK ê (24 Tîrmeh 1992), ji bo Festîvala navneteweyî ya Kurdistanê (9-15 Tebax 1992), hîlbijartina meclîsa netewî (16 Çileyê berî 1992), du salîya *Yeni Ülke* (21-27 Çiriya berî), bîranîna *İmam Hisêyn* ku ji teref kovara *Yeni Dönem* hatibû li darxistin re (20 Tîrmeh 1992) hatibû hinartin.

Hevpeyvîn ji bi kovar û rojnameyên ku

bi kurdî û tirkî li welêt û li derveyî welêt diweşin, bi ajans, rojname û hinek rêkxistinên navneteweyî re hatibûn kirin. Bi tevayî weke ku *Dr. Beşîkçî* bi xwe jî di pêşgotina xwe de qal dike, hevpeyvînên ku bi rojname û kovarên Tirkiyê re hatine kirin, ne hatine weşandin an jî bi kurtî weşandine. Ew jî bûye sedem ku hevpeyvîn û mesajên têde şaş bê guhestin.

Naveroka hevpeyvînan bi tevayî ji van xalan pêk tê; Dîtîna fermî ya Tirkiyê û partiyên Tirkiyê li ser kurdan, Rewşenbîrî, rewşenbîrên kurd û tirk û nêzîkbûna wan li pîrsa kurdî, li ser navgînên ragihandinê yê Tirkiyê û nêzîkbûna wan li pîrsa kurd, pîrsa sosyalîzm û çepê tirk, rola welatên sosyalîst û nêzîkbûna wan li pîrsa kurdî, munaqeseyên li ser dîrok, ziman, çand û torê kurdan û pêve girêdayî çarenivîs, li ser civata kurd û guhertinên nûjen, demokrasî û Tirkiyê, pîrsa olî û rola wê li ser tekoşînê, xwendegehên bilind û perwerdekirin...

Di pirtûkê de, pîrsên hatine kirin gelek ji wan wek hev in an ku bersivêkî dixwazin, ji ber vê yekê jî di gelek cihan de bersivên weke hev dubare bûne.

Di nava hevpeyvînan de, tiştên ku berî nuha di berhemên wî de xuyanî dikin pir in, lê *Dr. Beşîkçî* bi detalyên nuh, li ser hin pîrsan mirov bi baştirîn cure înfirme dike. Ez dixwazim çend nîqteyên berçav di vê pirtûkê de bînimê zimên:

Li ser salên 1960 û nefîkira 55 axayên kurd disekine û nîrxandinek bi tevayî di rûpela 12-14 an dike. Li ser xweparastina bi rêz *Faîk Bucak* li hemberî dadgehê Tirkiyê dike û bala mirov dîkşîne ser pîrsa kurd û demokrasîyê. Di rûpelên 203-205 an de jî li ser ajotina kurdan di navbera 1915-1925 an de disekine.

Di rûpela 39, 115-116, 132 an de berê xwe dide welatên sosyalîst yên kevn û

wan û birêvebirên Filistinîyan rexne dike. Ji ber ku di dema qetlîma Helebê de ew bêdeng mabûn û destê wan jî bibû bi xwîn. *Dr. Beşîkçî* li ser vê pîrsê berî nuha di hin berhemên xwe de sekinî bû, lê li vir li ser rola welatên sosyalîst disekine, awirên nuh dide.

Dr. Beşîkçî li ser perwerdekirina bi zimanê zikmakî disekine û di gel rexneyên ku rejima Tirkiyê dike, vê carê di rûpela 146 an de qala Çerkez û Aşûriyan (Suryanî) jî kiriye ku çima Tirkiyê bi xurtî li dij wan disekine.

Weke berî nuha, dîsa li ser jina kurd disekine û têkoşîna wê tîne ziman. Di rûpela 160 î de rengê tekoşîna rizgariya netewî bi jinan re gihaye çî mustewê, qal dike.

Ber bi dawîya pirtûkê ve *Dr. Beşîkçî* rewşenbîrên kurd rexne dike û li ser pîrsa perwerdekirinê li Tirkiyê disekine.

Di her berhem an jî hevpeyvînê *Dr. Beşîkçî* de tiştek nuh heye. Ji ber vê yekê her çi qas ev hevpeyvîn di hin deveran de derketûbin û hatûbin xwendin jî, her hevpeyvînek mîna dokumentekê ye ku pêwîste li mala her kurdekî hebe. Bi taybetî hevpeyvînên ku bi ajans an jî rojnameyên xerîp re hatiye kirin, mirov li ser hasasîyeta wan organa aqelî dîke û tiştên li nik wan bi nîrx e an ku bala wan dîkşîne, înfirme dike.

Dr. Beşîkçî ji hemû caran bêhtir vê carê wesan xuya dike ku li ser bergê hersê pirtûkan bêhtir sekiniye. Lewma yek jê kesk, yek sor û ya dawîn jî zer e.

Beşîkçî berî nuha hate girtin û gava ev nivîs dihate amadekirin, di hepsê de bû. Bi salan heps û bi milyonan pere, ceze jê re dixwazin.

Buhayê pirtûkê 70. 000 LT e û ji vê navnîşanê tê xwestin; "Yurt Kitap-Yayın, GMK Bul. Onur Işhanı K: 7 No: 176, Kızılay, Ankara-Turkey

KOVARÊN KURDÎ

Kovar û rojname ji bo pêşdexistina ziman, kultur, edebiyat û jiyana civakî ya miletekî navgînên herî berbiçav in. Ji xwe ji bo miletekî mîna kurdan bi qasî damarên xwînê û lêdana dil girîng in. Li gorî nifûsa kurdan ya pir, herçiqas kovar û rojnameyên ku îro derdikevin mîna dîlopek ji behrê bin jî, dîsan mizgîna xêrê ye. Ji ber ku heta do ev jî tunebûn. Lê belê bi hebûna van kovarên kurdî em dibînin ku roj bi roj xwendin û nivîsandina kurdî zêde dibe, nivîskar û şairên nû digihên. Ev nivîskar û şairên ku bi van kovar û rojnameyan re û bi xêra wan digihên, ew ê bibin neynika civaka me ya pêşerojê.

Lokman Polat ji bo xwendevanên Nûdemê hejmarên dawî yên van kovar û rojnameyan xwend û wan yek bi yek bi me dide naskirin.

Nûdem ji wan re temenekî dirêj hêvî dîke.

Lokman POLAT

ARMANC

Armanc rojname mehane ye. Hetanî nûha 145 hejmarên wê derketiye. Ev hejmarê ku ez ê bidim naskirin hejmara 145'an ya meha çileyê pêşîn a 1994'an e. Armanc 12 rûpel e. Di rûpela yekem de du nûçe û hevpeyvînek, wêneyê pêşmergan û yê Mesûd Barzanî heye.

Nûçeyek li ser şerê nav xwe(şerê birakûjî) ye. Wek tê zanîn li Kurdistana başûr PDK-Yekgirtin û Partiya Sosyalîst û YNK û Tevera Îslamî bi hev û du re şer kirin û bi sedan kes hatin kuştin. Di nûçê de ev tiştên rast tê diyarkirin:

«*Ku di navbera Kurdan bi xwe de yekûî tûnebe, leşkerê herî giran û çekên herî modern jî bîn û Kurdan ji Seddam biparêzin, dîsa jî ewlehî li Kurdistanê bi cih nabe.*»

Rojname *El-Hayat* bi Mesûd Barzanî re hevpeyvînek çêkiriye. Armancê ew hevpeyvîne bi Kurdî û bi kurtî di rûpela yekem de çap kiriye. Armanc, rojname mehane ye û di her hejmarê de "*Rojeva Mehê*" heye. Di vê hejmarê de sergotara rojeva mehê "*Saleke Bêsûd*" e. Li ser sala çuyî, sala 1993'an disekine. Di rûpela

duyem de nûçeyek balkêş heye; Li gor vê nûçeyê "*Tekstîla herî kevn li Kurdistanê hatiye dîtin.*"

Di rûpela sêyem de, nûçeyek li ser DEP'ê heye. Dibêje; Terora Dewletê ya ku li ser DEP'ê dom dike, dixwazin DEP'ê bigrin. Di kuncika "*Neynik*" de *Hesen Mizgîn* nivîsandiye. Sernavê nivîsa wî "*Em û Dijmin*" e. Nivîs li ser pîrrên tiştê şîrovekirin û polemîk e. Di rûpela çarem de tenê du nivîs hene. Yek jê di kuncika "*Ramanên Ramanwêran*" de *Hemû Kiliçaslan* li ser Konferansa Zimên nivîsandiye, ya din jî di kuncika "*Striyên Me*" de *Zinarê Xamo* (Ku ev kuncik her tim a wî ye) "*Te ji min re got 'tu qaz î !'*" nivîsandiye.

Di rûpela pêncan de nivîsek heye, ew jî a *Mustafa Aydogan* e, li ser "*Roja Nobel*" ê ye. *Mustafa* di nivîsa xwe de li ser xizmet û xelata *Alfred Nobel* disekine. *Mahmûd Lewendî*, li ser jiyan û xebata *Abrurrehîm Rehmî* a li ser zimanê Kurdî nivîsandiye. Di rûpela çand û wêje de *Bavê Roja* çîrokek pîrr kurt-Kurte çîrok-nivîsandiye. Navê çîrokê "*Ez berze me*". Çîrokeke din jî a *Artur Rimboud* ye. *Ehmed Huseynî* çîrok wergerandiye. *Teha Xelîl* nivîsek bi navê "*Helbestvanên ku bi şûrên textinî şer dikin.*" nivîsandiye. *Teha Xelîl*, li ser edebiyata Kurdî û çend helbestvanên Kurd yên Kurdistanê başûrê rojava disekine.

Rojnama *Armanc*, di her hejmara xwe de rûpelekî bi Dimilkî(Zazakî) diweşîne. Di rûpela Zazakî a vê hejmarê de sê helbestên bi Zazakî hene. *S. Rêving* jî di her hejmarê de "*Xaçepirs*" çêdike. Di rûpela dawî ya *Armancê* de her tim sê kuncik hene. Di kuncika "*Kultur û Polîtîka*" de,

tim *Riza Polat* dinivîsîne. Di kuncika "*Beroş*" de *Mahmûd Lewendî* û di kuncika "*Ne karê aqila ye lê rast e*" de jî *Hesen Mizgîn* dinivîsîne.

WELAT

Rojnama *Welat* li Stenbolê têt weşandin. Rojnameya hefteyî ye. Hetanî nûha 101 hejmar derketiye. Rojnama *Welat* dane mahkemê(dadgehê). Dewleta Tirk dixwaze wê bigire. Berpirsiyarê rojname *Welat Mazhar Günbat* di beyana xwe de dibêje: "*Ez ê di dadgehê de bi kurdî parastina siyasî û hukukî bikim.*" Mahkeme hêj dom dike.

Di hejmara 101'ê ya rojnama *Welat* de pîrr nivîsên cur be cur hene. Ev hejmar bi naveroka xwe dewlemend e. Di rûpela yekem de li ser Partiya Demokrasiyê (DEP) nûçe û şîroveyek heye. Sergotara nivîsê "*Zehfê hîlbijêrên DEP'ê neqeydkirî ne !*" li gor ku di vê nivîsê de tê gotin; li bajarên ku koç tîne, hejmareke mezin a hîlbijêrên bêqeyd lê çêdibe. Wek têt zanîn di hîlbijartina dawî de hîlbijêrên neqeydkirî pîrr ray bi HEP'ê dan windakirin. Ji bo ku DEP jî nekeve rewşa HEP'ê bi girîngî li ser vê meseleyê disekine.

Di rûpela duyem de du nameyên xwendevanan û nivîsara *Welat* heye. Di kuncika nivîsara *Welat* de *Mazhar Günbat*; "*Jibîrnekirina Kurdî ne bes e !*" nivîsandiye. *Mazhar* di nivîsa xwe de pîrr tiştên balkêş dibêje û li ser girîngiya abonetiyê disekine. *Mazhar* weha dibêje: "*Ji ber ku şîrketa belavkirinê êdî Welat belav nake, em nikarin bi destan Welat bighînin hemû deveran. Ji bo vê jî, xwendevanên*

me yê n ku ji deverên navendî dûr in, ya baş ew e ku bibin abone.»

Ev gotinên Mazhar ne tenê ji bo rojname Welat, ji bo hemû kovar û rojnamên Kurdî rast e û di cî de ye. Divê xwendevan bibin aboneyê kovar û rojnameyên ku xwerû bi zimanê Kurdî têne weşandinê.

Di rûpela sêyem de nûçeyên cengê(şerê gerîlla) û kuncika “Hawar” heye. Di vê kuncikê de her hefte nivîskar *Dilbixwîn* makale dinivîsîne. *Dilbixwîn*, di vê hejmarê de li ser “‘Welat’ di sed hejmar û sed hefteyîya xwe de ” nivîsandiye. *Dilbixwîn*, sed hefteyî û sed hejmara Welat li xwendevan, nivîskar û li gelê Kurd pîroz dike.

Rûpela çarem “Welat û Gerdûn” e. Li ser hev û du dîtina zîrveya *Hafîz Esed* û *Clînton* disekine. Li gor di nivîsê de têt gotin; *Hafîz Esad* ji *Clînton* pirs kiriye, gotiye «*Ma George Waşîngton terorîst bû?*»

Rûpela 5'an, hemû nûçe ne. Nûçeya balkêş; “*Dîplomasiya DEP'ê berhema xwe dide.*” ye. Di rûpela 6'an de lêpîrsînek li ser xwendin û nivîsandina Kurdî heye. Di vê rûpelê de nivîseke pîrr balkêş, baş û xweş heye. Navê sernivîsê “*Ku Rewşenbîr jî nexwînin wê kî bixwîne?*” ye. Di vê nivîsê de li cihekî weha dibêjê: «*Gelek nivîskarên bi eslê xwe Kurd-Zehfê wan jî bi Kurdî baş dizanin-xebatên xwe yê n li ser Çand û Bajarvaniya Kurdan bi zimanê Tirkî didomînin.*»

Di rûpela 9'an de “*Li Serhedê zilma Romê*” û li ser kuştina *Behcet Cantürk* “*Qatîl kî ye?*” du nûçe hene. Di vê rûpelê de kuncika bi navê “*Nêrînek*” heye. *Îbrahîm Xort*, li ser “*Şer û Zivistan*”ê nivîsandiye. Rûpela 10. hemû ji bo

bîranîna *Celadet Bedirxan* hatiye amadekirin. Di vê rûpelê de *Felat Dilgeş* “*Di salvegera sedemûn a bûyîna wî de çend gotin li ser helbestvaniya Celadet Bedirxan*” nivîsandiye. *Felat Dilgeş* dibêjê: «*Celadet Bedirxan, helbestên xwe bi pirranî bi qafîye dinivîsî û bi naverokeke netewî ev xebata xwe domand.*»

Di rûpela 11'an de nêrînek li ser hunera neteweyî heye. *Memoyê Dekşûrî* nivîsandiye. Di rûpela 12'an de *Gavan Koçer* li ser “*Ketina Kurdan a dîrokî*” seki niye. Di rûpela 13'an de helbesteke *Jan Dost* û helbesteke *Şêrko Bêkes* heye. *Şêrko Bêkes* vê helbesta xwe ji bo *Îsmail Beşîkçî* nivîsandiye. Navê helbestê bi xwe jî “*Ji bo Îsmail Beşîkçî*” ye. Di rûpela 14'an de ku navê vê rûpelê “*Serbest*”e, nivîseke polemîkê(minaqeşe) heye. Nivîskarê vê nivîsê *S. Berbang* e, li kovara çepê tîrkan ya hefteyî “*Gerçek – Rastî*” yê rexne digire. Navê nivîsê jî “*Nerastiya Kovara Rastiyê*” ye. Rûpela 15'an hemû ji bo Zarokan e. Navê vê rûpelê “*Bexçeyê Zarokan*” e. Di vê rûpelê de li ser tinazok û pêkenokên zarokan heşt(8) nimûne bi wêneyê wê ve hene.

Rojname Welat hetanî nûha her tim 16 rûpel buwe. Di rûpela 16'an ya vê hejmarê de hevpeyvînek bi *Cemşîd Heyderî* re heye.

NÛBIHAR

Nûbihar kovara mehane ye. Kovara Çandî, hunerî û edebî ye. Hetanî nûha 15 hejmarên wê derketine. *Nûbihar* kovareke bi reng e û tede gelek wêne hene. Di her hejmarê de bergên wê wêneyên bi reng in.

Nûbihar di her hejmara xwe de wek dosya li ser babetên girîng û bi giranî li ser pirs û pirsgirîkên doza Kurd disekine. *Nûbihar* bi çavekî dînî meselan dinirxîne. Kovar xetke olî û welatparêzî dimeşîne. Ew, dîtinên Îslamê bi welatperweriyê ve dihonîne. Ferqeke pirr mezin di navbera kovara *Nûbihar* û kovarên din yê Îslamî de heye.

Nûbihar, di hejmara 15'an de giranî daye ser pirsra Mekteb (Dîbistan-LP.) û medresan. Sernivîsa kovarê bi navê "*Gereke Kurd jî bi Mekteb û Medrese bin.*"

Ev daxwaza *Nûbiharê*, daxwazeke heq e û di cî de ye. Li rûyî dinyayê, di tu dewleteke Cîhanê de, xeynê Kurdî tu ziman bi qanûnan (zagonan) nehatiye qedexekirin. Dîsa, di esra bîstan de, tu milletek wek milletê Kurd bê dibistan nîne. Xeynê milletê Kurd kîjan millet bê televîzyon, bê radyo, bê rojnama rojane û bê mekteb e. Ew gelên ku li cîhanê dewletê xwe danemezrandine jî, xwedanê pirr tiştan in, heqên wan yê çandî, neteweyî û demokratîk heye. Yê Kurdan hêj tu tiştekî wan tune ye.

Nûbihar, li ser mijara : "*Rewşa Medreseyên kevin ên Kurdî çawan bû û îro Kurd jî wan Medresan çawan karin îstifade bikin*" lêpirsînek çêkiriye. Pirs ji deh (10) ronakbîran hatiye kirin. Di nav wan de Rewşenbîrên Kurd *Mehmet Uzun* (Romannivîsê hemdem), *Fîrat Cewerî* (Berpirsiyarê Nûdemê) û *Îkramedîn Oguz* (Berpirsiyarê rojnama Azadî) jî hene.

Hemû nivîsên vê hejmara kovara *Nûbiharê* balkêş in. *Sûleyman Çevik*; "*Îhmalkirina pirsra Kurdî, binketin e*" nivîsandiye. Li ser "*Ferhenga semantîka Kurdî*" berpirsiyarê kovarê *Sabah Kara*

nivîsandiye. *Mufîd Yuksel*, bi navê "*Li Kurdistanê pêvajoya guherînê*" pirtûk nivîsandiye. *Alî Karadenîz*, li ser vê pirtûkê bi *Mufîd Yuksel* re hevpeyvîn çêkiriye.

Wek hejmarên çûyî, di vê hejmarê de jî Şîrên (helbestên) *Yunus Emre* wergerandine zimanê Kurdî û weşandine. Helbesteke *Mela Mehmûdê Yusivî* jî heye, navê helbestê; "*Em Misilman in.*" *Sabah Kara* jî, weşandina nameyên xwe yê bêcewab berdewam dike.

Wek têt zanîn, beriya 1980'yî û demeke dirêj jî piştê 1980'yî kovarên Kurdan yê ku hebûn hemû jî kovarên çep bûn. Kovarên dînî û yê liberal tûnebû. Nûha hene û divê hebin jî. Hebûna kovarên Îslamî û yê liberal, pir rengî û dewlemendiya weşanên Kurdî dide nûşandanê.

REWŞEN

kovareke kurdî ya hunerî, wêjeyî û zanyarî ye. Ew ji mehê carekê mîna organa *Navenda Çanda Mezopotamyayê* li Tirkîyeyê derdikeve. Ew berê bi çapeke bedew li Ewropayê derdiket. Hem di çapên Ewropayê de, hem jî di çapên Tirkîyeyê de mîna kovareke dewlemend derdiket û derdikeve. Em ê bixwazin hejmara *Rewşenê* ya dawî (hej. 12) bi xwendevanên *Nûdemê* bidine naskirin.

Kovar bi qapaxa hundur, bi resimekî *Îsmail Beşîkçî* dest pê dike. Di binê resimê *Beşîkçî* de kurtehelbesteke *Şêrko Bêkes* ku pêşkêşî *Beşîkçî* kiriye, heye. Helbest bi kurtî wilo ye: ...*Di dawiyê de/ Kurdistanê got/Tiştê ku em niha bikarin ji bo te bikin/tenê ev e/Em dikarin te/weke gul û nan û azadî/li canê xwe hilbigirin.*

Nivîsa pêşî ya vê hejmarê bi nivîsara nivîskarê *Medya Güneşi Felat Dilgeş* dest pê dike. *Dilgeş* di vê nivîsara xwe de li ser şervanê azadiyê "*Seyid Riza*" radiweste. "*Ziwanê Kurdî Diyalakta Kurmancî de Pronom*" sernivîsa nivîsara *Lerzan Jandil* e. *Lerzan Jandil* di nivîsa xwe de li ser pronomên di zaravayê kurmancî de radiweste. Nivîseke balkêş e. *Pismam* bi "*Bo Sazekanî Mezrabotan*" tevî nivîskarên *Rewşenê* dibe. Zimanzan *Torî* bi çîrokeke xwe "*Tîrs*" rûpelên kovarê dixemilîne. Ji beşa teatr jî em vê carê pêrgî piyesa *Murat Batgî* ya bi navê "*Ta*" tînin. *Amed û Zînê* jî behsa "*Hin Nêrînên Kurdên Yezîdî*" dikin. Di beşa sosyolojî de *Şevîn Civaknas* "*Şer û Sosyolojiya Kurdistan*" kiriye mijara nivîsara xwe.

Nivîsarên din yê bîlêş yê vê hejmarê ev in: "*Mirovê ku Li Felekê Digeriya*" ya *Samed Behrengî* ku *Felat Dilgeş* wergerandiye. Di quncika "*Nîştimana xwe Binase*" de vê carê li ser Semsûrê hatiye rawestandî û *Rojê Civaknas* nivîsara *Selaheddîn Mihotulî* jî tirkî wergerandiye kurdî. *Feqî Huseyn Sagnîç* di quncika xwe ya "*Zîman û Rastnivîsînê*" de berdewam e. Ji bîlî wê ew vê carê jî li Kurdistanê behsa "*Çarşem*"ê û maneya çarşeman dike. *Seîd Verroj* bi çîrokeke Zazakî "*Şêxo Zura*" di nava refê nivîskarên *Rewşenê* de xuya dibe. Digel gelek nivîsên din yê di vê hejmarê de du nivîsên pir balkêş li ber çavan dikevin. Yek jê nivîsa *Müslüm Yücel* û *Özgün E. Bulut* "*Roman ve Zaman*", ya din jî nivîsa *Cemil Gündoğan* ya danasîna pirtûka *Mehmet Bayrak* "*Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*" ye. Wek ku ji sernavên wan jî tête fêhmîkirin ku herdu nivîs jî bi

tirkî ne. *Rewşen* hemû li ser hev 74 rûpel e.

ROJA NÛ

Roja Nû, di hêla çand, huner û edebiyatê de xizmeteke baş kiriye. Kovara *Roja Nû* di destpêka weşanê de bi du zimanan; bi Kurdî û Tirkî derdiket. 43 hejmarên wê bi vê tewirî derçû. Piştî hejmara 43'an êdî xwerû bi zimanê Kurdî hate weşandin. Hetanî nûha xwerû bi Kurdî 37 hejmarên wê derketine. Hejmara ku ez ê bidim nasîkirin hejmara 37'an e. (Bi yê berê ve hejmar 80.)

Nivîsa yekemîn a vê hejmarê—di rûpela 3. de— "*Gengeşiya li ser Alfabeja Kurdî*" ye. Ji bo nîqaşkirina Alfabeja Kurdî "*Rapora Enstîtuya Kurdî a Stenbolê*" bi pêşgotinekê ve hatiye weşandin. Piştî vê nivîsa Enstîtuyê, *Roja Nû* bi xwe dîtînen xwe li ser Alfabeja Kurdî nivîsandiye. Mînaqêşên li ser Alfabeja Kurdî, xwendevan dizanin, mesela kumikan e. Yanî ya li ser; "î" "i" û "ı" "i" ne. Herdu nivîs jî dirêj in.

Di rûpela 14 û 15'an de pênc (5) helbestên Kurdî hene. Helbestan *Ezmanê Karî* û *Enwer Omer* nivîsandine. Di rûpela 16 û 17'an de banga nivîskar *Memêd Emîn Bozarslan* jî bo ku; Bila sala 1995'an bibe sala *Ehmedê Xanî* û *Mem û Zîn* ê. Di rûpela 18 – 19 û 20'an de nama *M. Emîn Bozarslan* "*Ji Unesko ra*" nivîsandiye, di rûpela 21 – 24 de, şanoya *Mem û Zîn* ku wek Radyo—Dramatîk hatiye amadekirinê, beşa pêncan heye. Di rûpela 25'an de *Ahmed Muhamed Alî* li ser "*Strana Folklorî*" nivîsandiye. Di rûpela 27 – 30. de, ji pirtûka "*Dîroka Dinyayê—I*" beşek hatiye wergerandin.

Wergerê vê nivîsê *Y. Çakmak û A. Gernas* in. Nivîs berdewam dike. *Roja Nû* 30 rûpel e. Bergên wê bi wêne û bi reng in. Wêneya berga paşîn pira *Ebasî* li ser çemê *Xaburê* ye. Wêna berga pêşîn jî, wêna xelatên *Leca Ahmedê Xanî* ye.

GOVEND

Li gor min, kovara *Govend* di nav weşanên Kurdî de ciyêkî xwe yê taybetî heye. Ev kovar li paytextê Kurdistanê, li Amedê (Diyarbakirê) derdikeve. *Govend* kovara Çandî û hunerî ye. Hetanî nûha 9 hejmar derketiye. *Govend* 32 rûpel e. Di rûpela yekem de pêşgotin heye. Di pêşgotinê de li ser rewşa *Govendê* û li ser rewşa weşan û kovarên bi Kurdî tê seknandin. *Govend* ji bo astengiyên aborî alîkariya xwendevan û dostê xwe dixwaze.

Di rûpela 2 – 4 de *S. Korkmaz* li ser “*Têgihîştina Dîrokê û rastîşrovekirina gotinên pêşiyar*” sekiniye. Di rûpela 5’an de *Bavê Berfîn* “*Top û Demançe Mîr Mihemedê Rewandîzî*” dide danasînê. Di vê rûpelê de wêneya Demançe û Top’a *Mîr Mihemedê Rewandîzî* jî heye. Wêne û nivîs ji rojnama “*Kurdistanî Nû*” hejmar 25, roja 29-6-1992 hatiye wergirtin.

Di rûpela 6 û 7 de li ser *Qedrî Can*, ji pirtûka *Prof. Qanatê Kurdo* perçek nivîs hatiye wergirtin. Di rûpela 8’an de şûrek *Kemal Burkay* bi du zimanan, Tirkî û Kurdî heye. Navê helbestê: “*Bo ku Azadiyê wek spîndarekê biçikînin*” e. Di rûpela 9’an de, bi sernavê “*Zargotîna Me*” de “*Strana Seyîdxan*” heye. Ev stran, ji kaseta dengbêj *Ehmoyê Bêrtî*, ji aliyê *Humanê Çiyan* ve hatiye berhev kirin. Ji rûpela 12’an ta ya 15’an hevpeyvînek bi

helbestvan û hunermendê wênekêşiyê *Huseyîn Elçî* re hatiye kirin. Di rûpela 16’an de helbestek *Eskerê Boyik* heye. Navê helbestê “*Derd*” e. Di rûpela 17’an de nivîskar *Dilovan* “*Di bin siya helbestan da havînek germ!...*” nivîsandiye. *Dilovan* di dawiya nivîsa xwe de dibêjê: “*Xoftune, tirs nemaye, dil bê xem di şerê azadiyê de ye. Bi navê ax û azadiyê bang li we jî dike; “Hey lo metirsîn, hûn jî werin şer!...”*”

Di vê hejmarê de nivîseke *S. Korkmaz* ya din jî li ser “*Destana Mistê Hecî Quto*” ye. *S. Korkmaz* di destpêka nivîsa xwe de dibêjê: “*Li ba Kurdan edebiyata nivîskî pêşve neçûye. Lê ya devkî pir bi hêz û pêşketî ye.*» Di rûpela 21’ê de helbestek bi zaravayê Dimilkî (Zazakî) heye. Di rûpela jî bo zarokan de (rûpel 22 - 23) çîrokek ji bo zarokan heye. Navê çîrokê “*Bextê Însan Tune*” ye. Di rûpela 25’an de *N. Koçer* kurteçîrokek nivîsandiye, navê kurteçîrokê “*Çima Canê Min Can Nîne!*” ye. Di rûpela 27’an de tiştêkî balkêş heye. Ew jî navên Radyoyên Kurdî, pêl û cîhê weşanên wan û saetên wan hatiye nivîsandinê. Navê him Radyoyên li Kurdistanê û him jî yên li Ewropayê hatiye nivîsandin. Di rûpela Musiq’ê de strana “*Rindê*” bi notaya wê ve hatiye nivîsandin. Di rûpela pêkenî de jî “*Şerabxwar û Îmam*” heye. Di rûpela 30 û 31’ê de nameyên xwendevanan û helbestên xwendevanan weşandine. Di rûpela 32 de *Seyda Abdurrahman Uçaman* du metelokên Gundî û Tahsîldar pêşkêş kiriye. Di rûpela 33 de jî nivîskar *Şengalê Muşî* bi sernavê “*Werin Govendê*” nivîsek nivîsandiye. *Şengalê Muşî* dibêjê:

“*Werin, werin govendê
Werin govenda Kurda*”

Mustafa AYDOGAN

Pîyeseke Arthur Miller

Di 1968-an de hatiye nivîsandin. Pîyes ji du perdeyan pêk tê, lê Arthur Miller wê mîna perdeyekê ji pêşniyar dike. Di piyesê de çar karakter hene; Victor Franz, Walter Franz, Esther Franz û Gregory Salomon. Dema perde vedibe sahne tarî ye, dû re hêdî hêdî rohnê dibe; berê Victor û piştî bîstikekê jî jina wî Esther dikeve hundur. Herdu ji bo alavên ji bavê mane bifiroşin, li bende Salomonê cihû ne. Bûyer li New York`a 1968 an derbas dibe û li ser pêwendîyeke trajîk ya di navbera du birayan de -ku navê yekî Victor Franz û yê din jî Walter Franz- hatiye avakirin. Victor ji bo li bavê xwe yê kalî îflaskirî ku bûye qurbana sistemê binere, dev ji unîversîteyê berdide û bi hêviya ku piştî derbasbûna krîza aboriyê dê dîsan li unîversîteyê vegere, bûye polîs. Lê hêviyên wî pêk nayên û niha jî teqawîtbûna wî ya ji meslek nêzîk bûye. Heçî Walter Franz e ji mesûliyeta xwe reviyaye, xwendina xwe qedandiye, bûye doktor û jiyanê wî bi normên exlaq û hêjayiyên sistemê ve hatiye hûnandin. Victor feqîr maye û Walter jî baş dewlemend bûye. Mijara piyesê bi giranî şerê di navbera psîkolojî û hêjayiyên exlaqî yê herdu birayan de ye. Di nava vî şerî de dijîtiyên civata Emerîkayê û rexneyên ku bi îhtîmam li sistemê tên girtin, pir baş diyar dibin. Esther Franz, jina Victor e û ji bo ku mêrê wê normên sistemê qebûl bike û bike awayê jiyanê xwe hewil dide. Bi karakterê Gregory Salomonê cihû yê 90 salî ku alavên kevn dikire û difiroşe, xusûsiyetên mirovên cihû bi her awayî tê huzûra temaşevanan.

- a- Piştî Ketinê
- b- Lawên Min
- c- Bedêl
- d- Mirina Firoşer
- e- Bûyera Li Vişiyê

Pêşevanekî romanê

Di 1547-an de li "Alcalá de Henarese" yê hat dinyayê û di 1616-an de li Madridê di halekî pirr xerab de wefat kir. Xortaniya wî di nav feqîriyeke dijwar de derbas bû. Beriya romanên xwe helbest dinivîsandin. Di 1571-ê de beşdarî herbê bû û piştî çar salan, yanî di 1575-an de Tirkan ew êsir girt û ew birin Cezayirê. Nivîskarê me li Cezayirê pênc salan mîna êsirê Tirkan jiya. Wî çend caran hewil da ku ji hefsê bireve, lê tu carî bi ser neket. Ancax dema ku azadiya wî hat kirrîn, ji êsirtiyê rizgar bû û vegeriya Îspanyayê. Di 1585-an de romana xwe ya yekem ya ku navê wê "Galatea" bû, weşand. Demekê jî mîna mudurê Daîreya Bacê xebitî, lê ji ber sextekariya ku di karê bachevdanê de hat kirin, ket hefsê. Piştî derketina ji hefsê, di 1605-an de yanî di 58-saliya xwe de romana xwe ya ku navê wî heta dema me aniye, nivîsand. Wî di vê navberê de hinek pîyes jî nivîsandin, lê pîyesên wî zêde bal nekişandin. Li gor gelekan, wî di romana xwe de, şiyana afirandina "karakter" nîşan da û bi vî awayî bingehe romanê daniye. Karakterê ku wî di romana xwe ya nemir de afirand, di edebiyata cihanê

de yek ji wan karakterên ku herî pirr munaqeşe li ser hatiye kirin e.

a- Pedro Calderón de la Barca

b- Miguel de Cervantes Saavedra

c- Camilo José Cela

d- Federico Garcia Lorca

e- Miguel de Unamuno

Romaneke Dostoyevskî

Ev roman ji şeş beşan pêk tê û li ser dinyaya hundir ya du mirovan hatiye avakirin. Dostoyevskî di vê berhema xwe de halên ruhî yên herdu mirovan mîna psîkologekî bi hemû detayan radixe ber çavan. Keçikeye 17 salî (Nastenka) û mêrikeyê 26 salî li ser pîrekê bi xêra heûseyeke tesaduf dest bi hevalûyê dikan. Herdu jî ji bo hev mirovên guherî ne. Pêlên hezkirinê yên mêrik bilind dibin. Kêfa keçikê jî hêdî hêdî ji vî mêrikî re tê. Keçik li ba pîrika xwe ya kû ji herdu çavan kor e, dijî. Pîrika wê ji bo lêniqatebûnê kirasê keçikê bi yê xwe derzî dike. Mêrik jî yekî tiki tenê ye û di dinyaya xeyalan de dijî. Hevduîtina wan berdeham dike; hem keçik û hem jî mêrik dilê xwe, derîye dinyayê xwe jên hundur ji hevdu re vedikin. Di nava wan de pira bawerîyeke xurt tê avakirin û herdu jî ji dil dibin dostên hevdu. Lê keçik temîya dil neketinê li lêwîk dike; yanî dibêje ku; destûra dostaniyê heye lê ya evîndariyê tune. Dilê keçikê di kirêdarê wan î ku ji bo salekê çûye Moskovayê de heye. Herduwa soza zewacê dabûn hevdu, lê çend roj di ser wextê kû wan dabûn hevdu re derbas dibe jî lawîk xuya nabe. Keçik li ser şîreta dostê xwe, nameyekê jê re dişîne. Herdu diçin ser pîrê û li bende lêwîk dimînin, lê lawîk dîsan nayê. Roja din jî lawîk xuya nabe û ji ber vê yekê, دنیا li ber çavên keçikê reş dibe û keçik xwe wenda dike. Wê gavê dostê we yê 26 salî ji nişka ve derîyê dilê xwe yê evîndariyê jê re vedike, ji bo kû bawerîya wê neşikê xatir jê dixwaze û ji bo ji wir bi durketinê radişe ser pîyan, lê keçika di kirîzê de bû, di dilê xwe de pirr dixwest kû ew ev be. Nehatîna evîndarê wê pirr pê zor tê û piştî gotinên mêrik herdu biryara zewacê didin. Hîn ew di nava xebata amadekirina plana zewacê de bûn kû yekî ciwan di ber wan re derbas dibe û ji nişka ve dibêje "Nastenka". Bi gotina Nastenka re keçik ji nişka ve destê dostê xwe berdide û xwe davê himbêza evîndarê xwe, dû re li dostê xwe vedigere û wî himbêz dike. Lê Nastenka careke din ber bi evîndarê xwe ve direve, bi destê wî digire û ji ber çavan wenda dibe.

a- Şevên Spî

b- Ruhên Xerab

c- Mirovên Reben

d- Sûc û Ceza

e- Dilekî tenik

Navê helbestvanê vê helbestê

Dêrik çi xweş e, bi dar û av e
Ev av e, li erdê bû belav e,
Yek xab e, belê bihuşta me`wa
Pir mişmiş û sêv û darên Selwa

Pir gwîz û hejîr û xox û hinar
sed kanî û aş û gol û cobar.
Yek di heye, pê dibên Kulêbê
Gorî ye ji wê re Xurs û Şêbê.

a- Qedrican

b- Reşîd Kurdî

c- Osman Sebrî

d- Cegerxwîn

e- Tîrêj

Helbestvanekî Girekî

Berîya Mîladê di sedsala 7-an de jîyaye. Ji "Beotîen"ê ji gundê "Askra"yê bû. Rojekê esîlzadeyê kû navê wî Amphîdamas bû di herbê de şehîd dikeve. Li Chalkîsê di dema veşartina cenaze yê de, ji bo bîranîna wî mûsabaqeyek di navbera dengbêjan de çêdibe. Helbestvanê me di vê musabeqeyê de bi ser dikeve û bi vî awayî navê wî belav dibe, ew bi xwe ne mirowekî feqîr bû, lê alîyê feqîran digirt û li hember neheqîyê derdiket. Berhema xwe ya ku navê wê "Theogonî" -yanî Çêbûna Xwedêyan- li ser teorîya xwedêyan û mîtolojîya Grêkîyan ava dike. Li gor wî; di destpêkêde kaosa tarî û bê ser û ber li her deverê hakîm bû. Ji vê kaosê dinya ava bû; ji dinyayê Uranus(ezman) çêbû. Ji Uranus re lawîk çêbû, navê wî Kronos danîn. Kronos bavê Zeus e. Kronos demekê xeber distîne kû yek ji lawên wî dê mezin bibe, wî ji textê wî daxîne û di şûna wî keve. Ji ber vê yekê Kronos hemû lawên kû ji jina wî "Rhea"yê re çêdibe, bi derbekê daduqurtîne, lê gava Zeus çêdibe, Rhea ji dêlba wî kevîrekî dide Kronos û Kronos jî wî kevîrî daduqurtîne. Zeus mezin dibe û bavê xwe ji text dadixe. Li gor vî helbestvanî Zeusê xwedîyê edaletê yê herî bilind, hem bavê xwedêyan û hem jî yê mirovan e. Pîrsa heqî û neheqîyê pîrseke bîngêhîn ya helbestên wî bu. Helbestên wî ji bo esîlzadeyan îqazeke mezin bû; civaka Grêkîyan ya sedsala 7-an û dijîtîya di navbera esîlzadeya û gundiyan de bi awayekî balkêş tîne zimên. Li gor gelek pîrsa heqî û neheqîyê kû dûre di felsefe û drama Grêkî de granîya xwe datîne, bi wî dest pê kirîye. Navê berhema wî ya din, "Êş û Roj" e.

- a- Homeros
- b- Akropolis
- c- Hesiodos
- d- Demosthenes
- e- Sofokles

Navê nivîskarekî

Di 15-ê Cotmeha 1854-ande tê dinyayê. Ew bi xwe hein helbelstvan hem piyesnivîskar hem rexnegir û hem jî roman nivîskar bû. Wî bi Ingilîzî, Yûnanî, Latînî û Fransî dizanîbû. Di jîyanê de gelek bûyerên întresant hatin serê wî. Ji xwe jîyana wî ji her alî ve întresant bû Li gor xwe rexne li hêlên civakê jên ne li rê digirt û namaze jî orf û adetên civakê didan ber rexneyên xwe. Wî qaîdeyên exlaqê nas nadikir. Ji ber danûstendinên xwe yên homoseksûel, di 1895-an de 2 salan di hefsê de raza. Nivîskar piştî derketina ji hefsê, ji welatê xwe di xeyide û diçe Parisê. Di 30-yê Mijdara 1900-î de li Parisê wefat dike. Wî prensîpa "huner ji bo hunerê ye" tathîq dikir. Wî weha digot; "Ez carinan weha bawer dikim ku jîyana hunermendîyê xwekustîneke(intixareke) dirêj û pirr xweş e." Wî di edebîyata tîyatroyê de piyesên pirr balkêş pêşkêş kir. Zîmanekî bi nukte û rexnegir xusûsiyeteke herî balkêş ya nivîsên wî bû. Hinek ji berhemên wî ev in: Prensesa Bextîyar, Portreya Dorîan, Grey Salome, Sosyalîzm û Ruhîyeta Mîrov, Mêrekî Îdeal.

- a- Samuel Becket
- b- Oscar Wilde
- c- James Joyce
- d- Bernard Shaw
- e- Rudyard Kipling

Navê Ekolêkê

Di resim, edebiyat û film de tendensek e weha ye ku dixwaze herikandina civakî bi formeke ku bi temamî ji dervayî kontrola îrade û êqil; mîna xewn û xeyalan û ji rastiye dûr, pêşkêş bike. Hunermend û edebiyavanên ku bi prensîpên vê ekolê berhemên xwe pêşkêş dikin, pêwendiyên xwe ji rastiya heyî qut dikin û dixwazin rastiyeke li gor xwe biafirîne; rastiyeke ji adetan dûr û pijaka rastiye bi şûrê... Ew ji bo ku şexs ji otorîteya dîn, exlaq û estetikê rizgar bikin, dixwazin hemû sinorên di navbera xeyalan û rastiye de hene, bi alîkariya hunerê ji ortê rakin. Li gor gelekên, ev tendens berhema krîza sîstema kapîtalîzmê bû. Ew dijîtiyên ku sîstem didan ber xwe û dehşet, tirs û bêhêzbûna li hember van dijîtiyan, dibû sedemê ku gelek hunermend berê xwe ji jiyana rastî biguherin û bi nefreteke mezin li jiyane binihêrin. Piştî ku pêwendî bi rastiya heyî re hat qutkirin, bi rêya kabûs, halusînasyon û figurên ne normal, rastiyeke din hat afirandin û taswîrkirin. Pêşevanê vê ekolê André Breton bû. Wî psîkanalîza Freud xwendibû û bi awayekî xurt di bin tesîra Freud mabû.. Breton bi xwe doktor bû û di herba cîhanê yî duyem de li nexweşxaneyê çadîrî ya leşkerên birîndar tê de tedawî dibûn, dixebitî. Wî li nexweşxaneyê, li axavtinên birîndarên herbê guhdari dikir û li gor xwe dît ku gotin ji dervayî kontrola êqil diherikin û rîayetî qanûnên mantiqê nakin. Wî weha bawer dikir ku gava şûr kerr bibe, herikandineke gotinan ya ji bin şûrê û dervayî êqil aktîv dibe. Manifestoya wê ya yekem di 1924-an de hat nivîsandin. Di dawiya 1920-an de mîna tevgerê belav bû, lê di 1930-yî de piştî beşdariya gelek hunermendên din manifestoyeke nû hat nivîsandin. Tesîra vê ekolê heta îro jî didome, lê vê tendensê mîna tevgerê tesîra xwe ya herî mezin, di salên 1930-yî de derxistîye ortê. Di warê hunera resim de, temsîlkarê vê ekolê, Salvador Dali, Joan Miro, René Magritte û Max Ernst in; di warê helbestvanîyê de, Paul Eluard, Tristan Tzara (demekê yek ji wan pêşevanên dadaîstan bû) û Louis Aragon; di warê sinemayê de; ji Îspanyayê Luis Bunuel û ji Fransayê Jean Cocteau (bi hinek filmên xwe ji bo tesîrkirina vê ekolê bûn alîkar); di heykeltraşê de; Henry Moore û di prosayê de; Jaymes Joyce, Franz Kafka, Ezra Pound, T. S. Eliot û hwd ne.

a- Sembolîzm

b- Eksîstensiyalîzm

c- Surrealîzm

d- Ekspresyonîzm

e- Impresyonîzm

Muzîsyenêkî Klasîk

Di 16-yê Çileyê Pêşîna 1770-yî de li bajarê Bonnê hat dinyayê û di 26-ê Adara 1827-an de li Vîyanayê wefat kir. Bapîrê wî şêfê orkestrayê bû; bavê wî li Qesra Prensê Bonnê stran digot. Muzîsyenê me, dersên muzîkê cara yekem ji bavê xwe stend. Dû re bû şagirtê mamosteyê navdar Christoph Gottlob Neefe û di 13 saliya xwe de bû endamê Orkestraya Prensîyê. Di 15 saliya xwe de bû orgbende duyem yê Qesrê. Di 1787-an de bi alîkariya malbata Breuning ji bo ku li ba Mozart bixwîne, çû Vîyanayê, lê ji ber nexweşiya diya xwe mecbûr ma ku dîsan vegeriya Bonnê. Mozart yek ji wan mamosteyên ku dehaya vî mirovê mezin keşif kiribû. Berhemên wî, nemaze yên piştî 1800-î xwe ji qalîban rizgar kiribûn. Berhemên wî, pijaka hîs, fikir û hereketên nû bûn. Ev di navbera wî û girseyên ku bi agirê azadiyê ve dikeliyan de paraleltîyeke mûazam pêk tanî. Di 30 saliya wî de pêvajoya kerrbûnê dest pê dîke. Ev rewş heta 49 saliya wî weha dewam dîke û di 1819-an de ji herdu guhan bi temamî kerr dibe. Di Payîza 1826-

an de nexweş dikeve û heta wefata xwe di nava nivînan de dimîne. Di 57 saliya xwe de çavên xwe li dinyaya gewrik digre. Hinek ji berhemên wî ev in: Muzîka Xerabeyên atînayê, Fidelio, Pastorale û hwd.

- a- Johann Sebastian Bach
- b- Robert Schuman
- c- Joseph Haydn
- d- Johann Strauss
- e- Ludwig Van Beethoven

Romannivîskarekî biyanî

Di 1913-an de tê dinyayê. Diya wî bi eslê xwe ji Îspanyayê bû. Gava yeksalî bû, bavê xwe wenda dike. Diya wî li malan karê paqijiyê dike û wî pê xwedî dike. Li unîversîteyê beşa felsefeyê qedand. Ji ber nexweşiya êşa zirav, dev ji karê mamostetiyê ber da. Dû re di karê rojnamegerî û şanogeriya de xebitî. Di romanên xwe de ji aliyekî ve li ser pûçbûna pêwendiyên ku di navbera dinyayê û mirovan de hene radiweste û ji aliyê din ve jî temaya seihildanê derdixe pêş. Li gor wî; "Ger xwedê hebe, wê gavê hertişt bi wî ve girêdayî ye û li hember emrê wî tu tişt ji destên me nayê. Ger xwedê tunebe, wê gavê hertişt bi me ve girêdayî ye.....Siyaset û huner du rûyên cuda yên serhildana ku li hember bînzamiya dinyayê ne." Wî di herba cîhanê ya duyem de bi navê "Combat"ê rojnameyek diweşand. Di 1957-an de Xelata Nobel ya Edebiyatê wergirt. Piştî wergirtina xelatê, bi sê salan wefat kir. Hinek ji berhemên wî ev in: Mirovê Serî hildide, Birêvebirina Awarte, Efsaneya Siysphe û hwd.

- a- Albert Camus
- b- Claude Simon
- c- André Gide
- d- Jacques Prévert
- e- Maurice Merleau- Ponty

Temsîlkarê Muzîka Romantîk

Bavê wî muhacîrê Fransayê û diya wî jî Polonî bû. Di 01.03.1810-an de li Zelazovo-Volayê hat dinyayê û di 17-yê Cotmeha 1849-an de li Parisê wefat dike. Di temenekî pirr piçûk de, dest bi muzîkê dike. Malbata wî gava ew 9 salî bû, ji bo xwendinê wî dişînin Warşowayê. Li wir bi navê "Zarokê Harîka" hat naskirin. Di 19 saliya xwe de diçe Viyanayê û li wir gelek konserên bi serketî dide. Şiyana wî ya di warê muzîkê de pirr zû hatibû keşîfîkirin, lê îmkana wê wî ji bo pêşketîneke baştir bi sînora bûn, loma ji bo pêşketîneke xurttir koçî Parisê dike û heta roja ku nexweşiya êşa zirav li Parisê zora wî bir, xebatên xwe didomîne. Li Parisê bi nivîskara Fransî George Sand re bi qasî deh salan pêwendiyê evîndariyê didomîne, lê ev pêwendî di nêzîkî taliya emrê wî de hat qutîkirin. Vî temsîlkarê muzîka romantîk, berhemên xwe bi pîrranî ji bo piyanoyê beste kirine. Hinek ji berhemên wî ev in: Fantaziya Don Juan, Fantaziya li ser Stranên Polonyayê

- a- Claude Debussy
- b- Frederic Chopin
- c- Franz Schubert
- d- Franz Liszt
- e- Igor Stravinsky

Bersivên Hejmara 8'an

Li dor 25 bersivan ji quncika **AGORA** re hat. Bersiv ji her cih û deverên dinyayê ji me re hatin. Me di nava van 25 bersivan de qura kişand û 5 kes bûne xwediye abonetiya **NÛDEM'**ê ya salekê. Em navên bişansên vê carê li jêr dinivîsînin û wan ji dil pîroz dikin.

Herweha em didin zanîn ku vê carê jî em ê sê pirtûkên Weşanên Nûdemê; Hêz û Bedewiya Pênûsê ya *Mehmed Uzun*, Di Folklorê Kurdî De Serdestiyeke Jinan ya *Rohat* û Şevên Spî ya *Dostoyevskî* bi wergera *Firat Cewerî* bidin.

Bersivên hejmara 8'an:

- 1 - b)
- 2 - c)
- 3 - b)
- 4 - b)
- 5 - c)
- 6 - c)
- 7 - b)
- 8 - a)
- 9 - d)
- 10 - e)

Navên 5 kesên ku abonetiya **NÛDEM'**ê ya salekê qezenc kirine:

Fatma Doğan, Almanyayê.

Mustafa Çevik, Almanyayê.

Bawer Çiya, Swêd.

Emîn Kozlu, Swêd.

Azad Îbrahîm, Fransa.

MIZGÎNA ME LI WE, PIRTÛKÊN WEŞANÊN NÛDEMÊ DERKETIN!

Pênc pirtûkên ku di nava Weşanên Nûdemê de derketine ev in:

Şevên Spî

Dostoyevskî

Roman (werger: Firat Cewerî) 78 rûpel, 40 kronên swêdî.

Mîşk û Mirov

John Steinbeck

Roman (werger: Firat Cewerî) 126 rûpel, 40 sek.

Hêz û Bedweyiya Pênûsê

Mehmed Uzun

Essey, 203 rûpel, 50 sek.

Di Folklorê Kurdî de Serdestiyek Jinan

Rohat


Lêkolîn, 153 rûpel, 50 sek.

Bingehên Gramera Kurdmancî

Celadet Alî Bedir-Xan

Gramer, 91 rûpel, 40 sek.

Ji bo aboneyên Nûdemê ji sedî 20 erzantir e.



BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bikî, bibe abone!



Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê NÛDEMÊ.

Ji bo Swêd salekê 190 Skr. Welatên din 39 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana NÛDEMÊ bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ di gel karta abonetiya ji we re bişînin.



BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ

NÛDEM

No 9 1994